



Weşana
ENSTÎTUYA KURDÎ YA AMEDÊ

Kovara Dumehane
Hejmar - 25
Adar - Avrêl 2009

Xwedî û Bêpirsiyariya Nivisaran:
Semra OZBEY

Editor:
Enise ŞIRÎN - Azad ZAL

Sererastkirin:
Serwet DENÎZ - Semra OZBEY

Mizanpaj û Berg
Enstîtuya Kurdî ya Amedê

Wêneyê Berga Pêşin:
E. XEFÛR

Wêneyê Berga Paşin:
Ahmet BİLGE

Şêwirmendê Hiqûqê:
Av. Muharrem Erbey

Çapxane:
Berdan Matbaası:
Davutpaşa Cd. Güven Sanayi Sitesi
C Blok No: 239 **Topkapı/İSTANBUL**
Tlf: 0 212 613 12 11

Navnîşan:
Kalem Sk. No: 32 Huzurevleri
Kayapınar/DIYARBAKIR

Tlf:
(0412) 237 43 16

E-Mail:
kovaraw@yahoo.com
kovarawe@hotmail.com

WEB:
www.kovaraw.com

Şertên Abonetiye:
Nava Welat, salek: 25 TL
Welatên Dereke, salek: 70 EURO

Banqe & Nimroya Hesab:
Semra OZBEY
Türkiye İş Bankası 8300 Diyarbakir
YTL: 8300 195 27 89
EURO: 8300 071 16 47
USD: 8300 071 16 52

Nimroya Hesabê PTT'ê:
Semra Ozbey - 5426215

■ *Nivîsên ku ji bo weşanê
ji kovarê re tên şandin,
li xwediyên wan nayên
vegerandin.*

■ *Her nivîskar ji nivîsa
xwe berrisîyar e.*

- Ji editor / 2
- Deriyê şeşan - Şengul OGUR / 3
- Kerikfiroş - Selmet GULER / 7
- Guldesteyek - Husên HEBEŞ / 10
- Bavê min girti ye - Behlûl ZELAL / 11
- Geşt - Selahattin ÇAM / 13
- Nizanim - Yilmaz DEMÎR / 16
- Sê darik - Feratê DENGİZÎ / 17
- Sibeh - Rodî ZINAR / 19
- Ji ku dîsa hat bîra min - Bilge KARASU / 21
- Çend pîrsgirêkên dirokî yên hunera şewekarî- Fewzî BİLGE / 25
- Hêteke bayê zemên - Elixan LORAN / 30
- Lixwe(ve)gerîna sîmetrîk - Dilawer ZERAQ / 31
- An kew e an xew e - Selîm BEREKAT / 34

DOSYE:
DI WÊJEYA DEVKÎ DE RAZ Û SEMBOL / 35

- Şaristanî - Ronî WAR / 37
- Di wêjeya kurdan a devkî de raz û sembol - Mihemed RONAHÎ / 43
- Di gotinên devkî de hişmendiya gel - Dilxwaz HERDEM / 45
- Di çîrokên gelêrî de raz û nişaneyên berbiçav - Azad ZAL / 49
- Himên wêjeyê - Aydin ALOKMEN / 57
- Ji aliyê perwerdehiyê ve wêjeya devkî - Serwet DENÎZ / 61
- Min dixwest - A. Menaf OSMAN / 64
- Dilê çîrok-bêj - EdgarAllan POE / 65
- Her yek yekî derîne - Alice WALKER / 68
- Haîkû - Berken BEREH / 70
- Ferhenga çarpeyvî - Welat DILKEN / 72
- Kokteyl - Arjen ARÎ / 73
- Wê şevê... - ŞÊRKO / 74
- Mirin te dît ez kî me - Îlhamî OZER / 75
- Dengbêjek û stranek- Hilmî AKYOL / 76
- Pirtûkxaneya W- Elixan LORAN / 78
- Payebilind û giran e - Sîpan XIZAN / 80

Ji edîtor

Xwendevanên hêja û delal,

Pêşiyên me gotine an kew an jî xew. Bi kew û xewê jî nehatine ser û gotine yê têkeve govendê divê xwe bihejîne. Tê de hîç şik û guman tune ye ku bo wêjeya me geş bibe divê em jiyanê xwe ya ku jixwe li me hatiye herimandin, em çêtir û bêtir li xwe biherimîn. Tenê bi herimandineke katarsîsî ku jixwe bergîdaniya wê kew e, wêjeya me dikare bi ser xwe ve were.

Herimandina ku em qala wê dikin teht û zinar û dîwar in, divê tu carî em ji wan nerevin, dijberî wê divê em bi lêxistina seriyan van teht û zinar û dîwaran tewaf bikin. Dema serê me li cihê hişk bikevin em ê bikaribin hişê xwe bi ser hev de bicivînin û bikaribin kincê romana me ya ku bûye jînenîgarî, çîroka me ya ku bûye bîranîn û helbesta me ya ku bûye helbeşq ber bi avê de berdin û bi tekane çalakiya yek-kesane ango bi xwendinê jiyanê li xwe biherimîn.

Dema ku em telaqê etariya wêjeyî –ji ber ku etar çi bi wî re be wî difiroşe û ji vê etariya ku wêjeyê li qeyd û kelepçeyên jînenîgarî, bîranîn û eşqên ciwaniyê dixê, tu wêje ava nabe, bi ser de wêjeya heyî jî diçe ava- bidine destên xwe/wan, wê were vê wateyê ku em li xwe mikur hatine. Mukirhatina me jî rastgobûna min-nekirhatinê ye.

Di vê hejmara me ya nû de me dosyeyek li ser raz û sembolên ku di wêjeya me ya devkî de hene, amade kir. Di dosyeya me de nivîskarên dosyeyê ev raz û sembolên ku di çîrok û xerobîyan me de hene ji hev veçirandine, kategorîze kirine û di hiş û binhişê me de cihê xwe çawa girtine yek bi yek analîz kirine.

Alice Walker a Reşik di helbesteke xwe de dibêje: “Em dizanin ku çima Qesra wan a Spî spî ye.” Em jî bi T’ya pêşîn ya TRT 6’ê dizanin û bêtir fam dikin ku T li ser serê kurdan çawa dibe çakûçek. Nançandên avdonka goştê diziyê û “kurdên eşîr û êl(!)” îro ro bûne “kurtêl” û ji wan tirê ew nanên şewitî û qijotî bixwin wê pereyan li erdê bibînin! Wê li darê dinê qismetê wan zêde bibin.

Ne pêwîst e ku em qala stranên “xwe erzan firot lawo” û “Destê xo bide min / Simê engê welatî / Cengê welatî” bikin. Kîjan dest? Kîjan Ceng? Û kîjan Welat? Di nezera wê de dest bûye “serdest û desthilatdarî”, ceng bûye “Cengîzhan” û welat jî bûye “Irmağın akışına ölüyorum”

Belê xwendevanên delal,

Em dixwazin agahiyekê jî bidin we. Ji niha û şûnde wê Elîxan Loran jî wek edîtor beşdarî kar û xebatên kovara Wyê bibe.

*Di hejmara bê de wek dosye em ê **Kurdolojiyê** (xebatên ku heta niha hatine kirin, yên ku niha tên kirin û em Kurdolojiyê çawa dixwazin) nîqaş bikin.*

Em 16’ê adara 1988’an û “sêw” û “bêhna sêwan” ji bîr nakin û komkujiya Helepçeyê şermezar dikin. 8’ê adarê Roja Jinên ku stûna jiyanê ne û 21’ê Adarê Newroz li we pîroz be. Di vê hejmara xWe de, me dîtbarî û sêwirandina kovarê piçekî guherand, wekî ku hûn jî dizanin Adar e!

Heta hejmareke din bimînin di nava gul û kulîlkên biharê de...

Deriyê şeşan

Şengul OGUR

Bêhna xwe girt, ji nişka ve ber bi deriyê şaneşînê ve çû, derî vekir, gavek avêt şaneşînê, serê xwe bera kolanê da, li kaxez nihêrî û ber bi hundir ve xwe vekişand...

Dema ku deriyê şaneşînê bêyî vîna xwe vekiribû, nizanibû ku dê ev derîvekirin wî ber bi ku ve bibe. Beyî ku haya wî jê hebe, bê armanc ber bi deriyê şaneşîna ve çûbû, bi destikê derî yê bafûnê girtibû û derî vekiribû. Dema ku bi destikê derî yê ji bafûnê girtibû ricfek ketibû laşê wî, lê haya wî ji vê yekê çenebûbû.

Bi vekirina derî re çavê wî li çirûskên şewleyê ku li ser kolanê dilîstin ketibû. Kolan xîkîxalî bû, bajar di bêdengiya xewa giran de bû.

Vekirin û girtina wî ya dêrî di heman kêliyê de pêk hatibûn. Lê dîsa jî ev kêlî bes bû ku hemû cîhana wî ya hundirîn tevî hev bibe. Di wê nihêrîna li derve, ya ku bi qasî kêliyê dom kiribû de, bi heyîna gelek tiştan hisiyabû; bi heyîna şevê, bi heyîna ezmên, bi heyîna mewsîmê, bi heyîna bajêr û bi heyîna xwe jî hisiyabû. Bi van heyînan û bi heyîna xwe hisîn êşeke bê hempa pê re peyda kiribû.

Piştî qasekê, dema ku diramiya, bi heyîna tişteki din hisiyabû; bi heyîna kaxezekî, kaxezekî spî ku di navbera du kevirên parkê yê kolanê de, li ber bayekî sivik mîna alekê li ba dibû, hisiyabû.

Niha hemû bala wî ketibû ser kaxez. Êdî hemû heyîna wî di heyîna kaxez de heliyabû. Vî kaxezî celebek pîrsên bê bersiv di serê wî de diteqandin.

Ev kaxez çi kaxez e? Kê ev kaxez aniye di

navbera van her du kevirên parkê de bi cî kiriyê? Çi li ser kaxez hatiye nivîsîn? Ev kaxez nişan e? Hinekan bo min peyam şandiye?

An ev kaxez kaxezekî ji rêzê ye û bi rasthatinî, bi bayê re hatiye di navbera van her du kevirên parkê de bi cî bûye?

Dema ku ramana ihtimala ku ev kaxez ji hêla hin kesan ve di navbera van her du keviran de hatiye bicîkirin bi hêz dibû, ricfekê bi laşê wî digirt û mûyê laşê wî hemû cît dibûn. Hişê wî jî, bi giranî li ser vê ihtimalê radiwestiya û ihtimala ku bi rasthatinî ew kaxez li wir bi cî bûye, piştguh dikir.

Ev kaxez ne kaxezekî ji rêzê ye. Tiştin li vî kaxezî lê kirine. Di vî kaxezî de peyam heye!

Da ku xwe ji van pîrsên ku saw pê re çêdikirin rizgar bike, xwe li ser nivînên xwe dirêj kir û li hêfa xwe beyî ku mûyek laşê xwe jî li derve bihêle bi ser xwe de kir. Lê kir û nekir nekarî xwe ji sawa wî kaxezî rizgar bike. Pîrsên wî mîna dengê ku di geliyekî de olan bide, di hişê wî de olan didan. Êdî her tiştî heman pîrs jê dikir; hilma ku dida û distend heman pîrs jê dikir, dengê ku xwebilivandîna wî re derdiket heman pîrs jê dikir: Çi li wî kaxezî hatiye nivîsîn?

Dixwest ku dîsa here derî veke û li kaxez binêre û hewl bide da ku fêm bike, ka gelo nivîsîn li ser kaxez hene an na. Lê dê çawa ew wêrekî bi xwe re bidîta û ber bi derî ve biçûya û derî vekiribûya.

Li şûna ku ber bi deriyê şaneşînê ve here, ber bi

şibakeyê ve çû. Xwest ku perdeya xwe bi qasî serê derziyê bide alî û li derve binêre da fêhm bike ka gelo li kolanê tiştêkî ne asa heyê an na.

Dema ku ber bi şibakayê ve çûbû, ramana wî çû ser berî niha bi şêş şevan.

Berî niha bi şêş şevan dema ku xwestibû bi dizîka li derve binihêre, perde bi qasî serê derziyê dabû alî û li derve nihêribû, keçîkek ku temenê wê derdora hejdehan de, yeke xeftanê wê ji ser ta piya reş bû, piştî xwe dabû derabeyê dikana ku li hêla çepê ya li kolanê bû. Keçîkê rasterast bi baldarî li şibakeya wî dinihêrî, dema ku wî perde dabû alî da ku li derve binihêre, keçîkê dabû xwe û di enîşka dikanê re fitilîbû û xwe bera nav tariya kolanê dabû.

Lê wê şevê wî tê dernexistibû ku çavê keçîkê li şibakeya wî bû. Niha, dema ku xwest perdeyê hinekî bide alî û li derve binêre ew keçîka ku wê rojê dîtibû hat bîra wî û ji nişka ve pîrsekê xwe lê dabû der:

Ma dibe ku ew keçîka wê şevê min dîtibû ev kaxez li wir bi cî kiribe? Kî ye ev keçîk?

Dema ku li kîbûna keçîkê fikirîbû, ruhê wî hemû lerizîbû. Loma ew keçîk wekî siyekê bû, ne weke miroveke asa dixuya. Xeftanê wê reşê tarî bû, bi erdê ve dirêj dibû. Şekala di piyê wê de reş bû, lepikek di dest de reş bû, kapşona li serê wê reş bû.

Dema ku wî perde hinekî dabû alî û li derve nihêribû, keçîk zûzûka di nav tariyê de winda bûbû. Meşa wê ne wek meşa mirovan bû. Ne wekî ku bi gavên xwe ji wir dûr ketibe lê wekî ku bi erdê ve xwe bixijiqe ji wir bi dûr ketibû û xwe tevî nav tariyê kiribû. Di hemû heyîna wê keçîkê de tiştên ne reş, bi tenê çavên wê yên ku wek du fanosan diçirîsîn bû.

Destê wî yê ku diricifîn bi perdê ve zeliqîbûn, nediwêribû perdê bi qasî serê derziyê ji bide aliyekî. Loma ku bi vekirina perdê re ku dîsa wê keçîka ku wek siyekê bû bidîta dê çî bikira.

Ew niha li vê ihtimalê difikirî. Dema ku li ihtimala ku çavê yekê li ser şibakeya wî ye fikirîbû, ramana tefandina şewleya odê di hişê wî de peyda bûbû. Û da ku şewleyê bitefîne

ber bi bişkoka şewleyê ve çûbû, tilîka xwe dabû ser bişkokê. Lê şewle netefandibû. Vê carê ji tîrsa taritiyê li tîrsa wî ya heyî zêde bûbû. Lê ji hêlekê ve dixwest şewleyê bitefîne. Loma difikirî ku, ger ku yeke ku çavê wê li şibakeya wî hebe li derve, belkî bi tefandina şewleyê ji wir biçe. Ev ihtimala çûyîna yeke ku li derve ku çavê wê seraqat li şibakeya wî ye, tîrsa di dilê wî de kêmkir.

Lê ihtimaleke din ji hebû ku bi tefandina şewleyê re, ya ku li derve ye hewl bide were odeya wî.

Bi vê ramanê êdî madê wî zer dibû û hindik mabû biqîriya. Demeke dirêj li ser piyan cît sekinîbû. Piştî demekê êdî ji qewet ketibû û destê wî ji ser bişkoka şewleyê hêdî hêdî dişemîtî û çokên wî ji pê re ditewiyan. Pêlekê hema wilo piştî wî li diwêr, çavê wî li deriyê şaneşînê, li destîkê deriyê şaneşînê bû. Dixwest ku biçe derî veke bi lezekê, li kaxez binihêre û hewl bide da ku fêhm bike ka gelo li ser kaxez çî nivîsiye.

Bêhna xwe girt. Ji nişka ve ber bi deriyê şaneşînê ve çû, derî vekir, gavek avêt şaneşînê, serê xwe bera kolanê da, li kaxez nihêrî û ber bi hundir ve xwe vekişand. Derî vekirin, li kaxez nihêrîn û derî li xwe girtin ew qasî bi lez pêk hatibû ku ne pêkan bû însanek bikaribûya ew qasî bi lez tevbigeriya. Bêhn lê çikiyabû dema ku derî li dû xwe girtibû. Dengê dilê wî baş dihat bihîstin.

Beyî ku xwe bilivîne, pêlekê piştî wî li deriyê şaneşînê, rawestiya hetanî ku bêhna wî hat ber wî. Paşê çû li ser kursiyê xwe rûnişt. Li wêneyê xwe yê zaroktiyê nihêrî. Hîna şêş salî bû di vî wêneyê de. Carinan bi saetan li vî wêneyê xwe dinihêrî. Tekane wêneyê wî yê ku ji zaroktiya wî mabû ev bû. Hinekî hişê wî hat serê wî, tîrsa dilê xwe avêt. Perdeya şibakê da alî û kûr kûr li derve nihêrî.

Li kaxez fikirî, li ser wê hejmara ku li ser kaxezî dîtibû. Bi ya wî ya ku li ser kaxez hatibû lêkirin hejmarek bû; hejmar şêş bû. Lê dilê wî waswasî bû, ne emîn bû ka gelo ya li ser kaxez dîtibû şêş bû yan na. Dibe ku xelîtibe ji. Da ku vê şikê ji serê xwe bavêje biryar da ku

biçe derve li kaxez binihêre.

Bi lez berê xwe da derî, xwe bera jêr da, dema ku deriyê ku li kolanê vedibe vekir û li hêla kaxez nihêrî, dît ku kaxez naxuyê. Çavê xwe li kolanê gerand, derdora xênî seh kir lê kaxez ne li tu deran bû. Te digot qey cinan qurpandiyê ev kaxez. Niha di dilê xwe de digot baş bû ku min ji şaneşînê lê nihêrî û ew hejmara şeşê dît. Niha kaxez ne li wir bû û neçar mabû ku ya li ser kaxez wekî şeşê qebûl bike.

Niha wateya şeşê pirsîyar dikir. Dema ku li wateya şeşê difikirî, gihîşt wê bîr û baweriyê ku ev şeşa ku dîtibû hejmara kuçeyekê bû. Lewma li vî bajarî navê kuçeyan hejmar in. Di wê tariya şevê de xwe bera nav kuçeyan da û li kuçeya şeşê digeriya.

Piştî meşa derdora saetekê kuçeya şeşê dît. Lê di heman dehmê de du kuçe hebûn. Yek berjor yek jî berjêr bû. Dîsa hişê wî çû ser kaxez da ku riyekê ji xwe re bibîne û bizanibe bi kîjan aliyê de biçe. Dema ku li kaxez fikirî, bi bîra wî hat ku, ew hejmara ku li gorî wî li ser kaxez lêkirî bû, ne li nîveka kaxez, ne li hêla wî ya rastê lê li hêla çepê bû. Naxwe divê bi hêla çepê ve, xwe bera jêr bida. Kuçe dirêj û xîxîxalî bû. Şewleyeke pir lewaz bi qasî hêza xwe kuçe ronî dikir.

Piştî ku qasekê di vî kuçeyê de meşîya, ji nişka ve li pêşberî deriyekî rawestîya. Te digot qey hinekan gavên wî bi bizmaran bi erdê ve kutabûn, beyî ku bikaribe xwe bilivîne li derî nihêrî. Di biniya şewleya kuçeyê ya lawaz de, li ser derî hejmara şeşê ya ku bi boyaxeke sor hatibû lêkirin û tu nemabû jê biçe xuyanî kir. Dema ku çavê wî bi vî hejmara şeşê ya li derî ket, gihîşt wê bîr û baweriyê ku ev der, ciyê ku diviyabû biçiyê ye.

Destê xwe da derî. Dema destê wî li derî ket wek ku dengê bibihîze lê hat. Wekî dengê ku dibêje, kuçeya şeşan deriyê şeşan... Da ku xwediyê deng bibihîze li dora xwe nihêrî lê di wê kuçeya xalî û dirêj de tu kes nedixuya.

Bi destê xwe derî hinekî dehf da, bû zîqîniya derî û derî vebû.

Bergeha ku bi ber çavê wî ketibû: Li pêşberî deriyê ku li kuçeyê vedibû deriyek hebû, li hêla rast û çepê derî şibakeyên fireh ên odeyan ku hemû camên wan şikestî bûn hebûn. Perdeya şibakeya odeya milê rastê hatibû xwar û bi şibakeya ku vekirî mabû ve aliqî mabû. Li hêla rastê ya hewşê dara tuyê hebû, bi çeqlê wê ve hêlenak hebû. Li ser rîya ku mirov di ser re ber bi deriyê xênî ve diçe ferek şekala zarokan hebû. Li ser feyansên spî yên vî riyê dilopîne sor hebûn.

Ber bi deriyê xênî ve çû hêdî hêdî, xwe di ser deriyê ketî yê xênî re qevast, di hola xênî re xwe bera odeya milê çepê da.

Li vî odeyê tu tişt li ser darê lingan nemabû. Nivînên ku hiriya ji wan hatibû derxistin, qenepeyên ku rûyên wan hatibû birîn, mase û kursiyên ku bi tihêlekê bûnin, pirtûkên ku hatibûn qetandin û li odeyê hatibûn belavkirin... Diyar bû ku tofanek bi ser vî malê û xwediyê vî malê de hatibû. Ji vî odeyê rahiştibû pirtûkekê, kiribû bin çengê xwe û Ji wê odeyê derketibû û berê xwe dabû odeya paş vî odeyê.

Di odeya paş vî odê de çavê wî bi albûmekê ket. Albûm di nava toza bi salan de mabû. Albûm albûmeke bi kilît bû. Bi kêrika xwe kilîta albûmê şikand û hewl da ku li wêneyan binihêre.

Berî ku li wêneyan binihêre dîsa wek ku dengê bibihîze lê hat: Kuçeya şeşan, deriyê şeşan...

Bi vî dengî re veciniqî û li dora xwe nihêrî. Lê dîsa tu kes nîn bû.

Dîsa bala wî ket ser albûma di destê wî de. Albûm vekir û li wêneyê pêşîn nihêrî dema ku qasekê li wêneyê pêşîn nihêrî, bi carekê re bû kûrkûra giriyê wî, serê xwe dikir nava albûmê û digiriya, albûm maçî dikir û digiriya, berê xwe dida dîwarên odeyê û dîwarên odeyê yên quloqulo bûbûn maçî dikir û digiriya. Erd maçî dikir û digiriya. Xwîna hişkbûyî ya li odeyê maçî dikir digiriya û digiriya...

Di wêneyê ku lê dinihêrî de zilamek hebû, temenê wî derdora çil salî, simbêlên gurz li ser hebûn ku bi ser lêvan de dirêj bûbûn. Ji çavê

wî baweriyek û evînek xurt dirijiya, li ser lêva wî beşîşîneke wek ku tinazên xwe bi mirinê bike hebû.

Destê zilêm di stûkura jineke ku temenê wê li derdora sî û pêncan bû de bû. Serê jinikê cît bû, bêhna esaletekê ji vê cîtbûna wê difûriya. Di awirên wê de bêbiniyekê xwe dida der.

Li cem jinikê jî keçikek ku temenê wê li derdora hejdeh, bîstan de bû hebû. Çavê wê mîna stêrkên li ezmên diçirisîn. Gujmikên wê pempeyî bûn, birhê wê zirav. Di awirên wê de xewnên jiyaneke biharîn nîgarkirî bûn.

Keçikê bi destê zarokekî ku temenê wî li derdora şeş salan bû, hişk girtibû. Berê zarok ne li wênekêş bû. Wî li pêşiya xwe dinihêrî. Wek dema ku ev wêne hatiye kişandin tiştêkî bala zarok kişandibe, zarok bi awirine ku bi tirs û mitelayan binihêre li pêşiya xwe dinihêrî, li pêşeroja xwe...

Ev zarokê ku di wêneyê de dîtibû ew bi xwe bû. Ew zilam bavê wî, jinik diya wî û ew keçik xwîşka wî bû.

Dema ku xwe di vî wêneyî de dîtibû êdî ew ji vî zemanê ku niha tê de bû qut bûbû û çûbû wê şevê, şeva beriya niha bi şazdeh salan. Wê şeva dojahîn, wê şeva ku dê û bav û xwîşka wî li ber çavên wî hatibûn kuştin.

Niha ew dengê ku bi wî wilo dihat ku dibihîze nas kiribû. Ew deng dengê bavê wî bû.

Dema ku ew zarokekî şeş salî bû, bavê wî wiha jê re digot: Kurê min! Ku tu rojekê winda bibî, bibêje, mala me di kuçeya şeşan de deriyê şeşan e. Wê çaxê dê mirovin te bînin malê.

Berî ku şev biqulibe beyaniyê ji malê derket. Di destekî wî de albûma wî û di destê din de pirtûkek bi navê "Dîroka Winda" xwe bera nav tariyê da bi gavinê çiyayî...

Kerikfiroş

Selmet GULER

Ji bona hevalê min, xortê hêja û çeleng Ridwan Agirman. Ê ku mîna tîrên xeteng çavên wî nedişikestî. Ê ku perdeya şevê nekişand ber paceya xwe. Yê ku dijmîn nediwêribû wî ji pêş ve bikuje. Yê ku di bajarê kurteçîrokê de ji paş ve hat kuştin. Û xwişka wî, ya por-rojê û dilsojê, ya ku di şanzdeh saliya kuştina wî de hê jî kula wî bêhnê lê diçikîne û hêşiran li ser dêmên wê yên soragewrî digindirîne.

Ber bi paceyê ve meşîya, keviya perdeya tûl î tenik da alî, lê cama bi bixur nêrînên wê di nava xwe de fetisandin. Wekî li mirêkeke gurî binihêre lê ji şoliya wê tu tiştî ji hev dernexe, tu tiştî ji hev û din dernexistibû. Destê xwe yî rastê ber bi camê ve hilda û bi sernermikên tiliyan bixura li ser peyala paceyê malîşt. Mîna çarşeveke raxistî rûyê erdê seranser qeşa û cemed. Di nava pelgên payîza dawîn de, li ser çiqilekî dara gûzê ya di hewşê de jî du tivîlk...

Li sikaka pêşberî cama bi bixur ne çûyîn, ne hatin û ne deng... Digot belkî tax tev ke tiye xewa rojê. Lê paşê pêjna dengê kiribû. Li kolana zirav û dirêj tenê dengê... Deng, wekî hehecikeke rêwendayî dikete ber pêlên ba û xwe digihand qulêrên guhên wê.

Dengê ku digot: "Werin bacana, werin bacana, werin bacanê kewanê!" ji dûr ve digot belkî ji kûrahiya bîrên kûr tê. Lê her bi wê ve diçû dengê ku di nava gerên bayê de leylandida, nêz dibû. Piştî demekê reşê kesekî xuya bû. Di vê sibeya sir û seqem û di wê roja ba û bager û di vê dema ku ro li nivro serî hatibûn bihayê pîvazekê, reşê kesekî...

Keçikê xwe bi xwe gotibû; 'Li vê taxa ku bi rêbiwarî jî rêya kesan nakeve kolanên wê gelo ev kes li çî yî xwe digere?' Ji bona ku xwe bi xwe, xwe bi bersivîne, destê xwe avêt şêbiskên xwe, şêbiskên ku ji ber berbisk û jidano-

kên porê wê filitîbûn û mîna reşperdeyeke tenik xwe berdabûn ber çavên wê, avêtîbûn piştî guhên xwe. Û ji nû ve li kolana pêşberî paceyê nihêribû. Li ser gewriya devrûka cemedê reşê mirovekî kerikfiroş... Ser û guhên kerikfiroş di nava desmaleke kesrewanî de hişk pêçayî, ji serî heta bi lingan jî di nava kincên tarî de... Hew mûyên rûyê wî bi gewriya cemedê re dikevin aheng û reqsê. Tableyek li pêşiyê, di nivê pehniya tablê de komek bacanên kerik. Kerikên bacanan mîna Pîramîdên Mîsrê ber bi jor ve û wekî giyyê payîzxêrê kesk dixuyê. Lê lib liban jî wekî gul û gengelokên biharê yan jî mîna lêv û dêmên qîzên nûgihîştî sorpembe dixuyên. Pişt li bayê û ber li felekê... Dimeşe yan bayê felekê wî daf dide kes nizane, lê her dimeşe!

"Serê vê sibeya sar, vê sibeya ku gur bi gurîtiya xwe li der debar nake, ji bona debara kufletê xwe mirovek..." gotibû keçikê.

Paşê kerikfiroş bavê keçikê yê ku kelekela havînê ji bona debara wan diçû avdana pembû anîbû bîrê. Loma dilê wê bi kerikfiroş şewitîbû...

Ji nişka ve bayek rabû. Ger û gerînekên bayê xerbî, xuşîn û gurîneke bêhempa bi koda sirûştê xist û der û dor di nava toz û icacê de hişt. Ewrên ku hêdî hêdî li ser serê bajêr dihatin hev jî wekî konekî koçerî hin bi hin singên xwe yên şilokî kutane erdê û kolanên bajêr

tarî kirin. Piştî bi kêliyê li çeperê aso, bû xumexum û gumeguma taviyên payîzî. Berî ku dengê taviyan bi dawî bibe şewqa birûskê, ya ku rengê wê dişibiya hîveroniya hîva çar-dehşevî li ser rûçikên qemeriya ewran xêz çêkir. Di heman demê de jî, wekî bisteke ji agir çikên birûskê xwe berda mita çeperê aso, çiyayên bilind, mita serbiberf... Gava birûsk kete erdê wekî hemû paceyên bajêr zimînî bi peyala paceya keçikê ya darîn jî ket. Dema ji nişka ve zimînî bi paceya keçikê ket, keçik veciniqî û bêtî wê gewdê wê xwe bi hêla hindirû ve dabî. Tivîlkên ku li ser çiqilekî dara gûzê veniştibûn jî di nava pelgên dara gûzê yên derengmayî re dan ling û periyân. Cotê tivîlkan pêşî sing û sing ber bi bayê ve çûn, lê paşê wekî masiyên ku xwe ber bi herka avê ve berdîn xwe dan ber nermahiya pêlên bê. Lê belê mîna ava çem û kaniyên ku li qurmê çinar û li qûntarên zinarên li keviyan difetilin li bajêr fetilîn û heta ku ji ber çavan winda bûn çûn.

Pelên dara gûzê bi ba û bablîsokên ku deng bi koda sirûştê dixistin ketibûn cengê. Lê nabe, demsal pêşve çûn, gerdûn guherîn û nûjenî divê. Lewra, dîsa bû xurexur û guregura taviyan. Çirûsk dîsa rijîyan erdê û cur bi cur li ser ewran dîsa roniya hîveronî wênayê xwe xêz kir. Xurexur û gumegumên taviyan yên ku hêdî hêdî ber bi asîman ve hildikişîyan hê ji guhên keçikê derneketibûn, baraneke ku libên wê ji xarên kevirxarî mezintir bûn mişênî bi der û dora wê xist. Pelên ku li ber sir û seqemê rû-rengên xwe ji rengzerê şewqtava payîzî wergirtibûn bi xweşî û nermahiyeke lihevhatî weşandin erdê.

Demsal, demsala weşanê, weşana pel û tîkçûna berên giya, dar û dardarokên salê û razana xwezayê bû. Lewra, her pelekî ku ji dara gûzê dibû û bi libên baranê re diweşîya erdê, dîmeneke tîkçûyî ji bîra dilê wê derdixist pêşberî çavên wê. Ji bilî xweşî û kêf û

şahiyan, mîna kesên sere, bîra dilê wê ji kul û kederên dinê dagirtî bû. Loma hê di bihara temenê xwe de, bi bûyerên xwezaya payîzî xemgîn û jar dibû. Lê, ji hêlekê ve jî kêfxweşî yeke veşartî ku wê jî nizanibû bê ji ku ve tê bi rengbûyerên payîzî re xwe berdida sepeta singê wê. Loma ji bona wê payîz, mîna çiyayekî du demsal ku li hêlekê berf û seqem, li hêla din jî hêşinahî û kulîlkên reng bi reng bû.

Berî ku keçik ji paceyê vekişe û li ber sobeya ku dayîka wê serê sibê dadabû rûnê, bi dengê nizm û aram;

"Gelo

dîsa mala kê

xera kirin?" gotibû.

Keçika ku pêşîrên wê

wekî du domelanên erd-

hildayî singê kirasê wê yê

sor î tenik hildabû, li xwe fi-

tilî û dîsa li kolanê nihêrî.

Lê belê êdî reşê kerikfiroş

nedixuya. Dengê wî yê

ku digot "werin bacana,

werin bacana!" jî êdî

li kolanê olan

nedida

"Pelweşan, çendî mîna mirinê tîkçûyîn be jî ji bona çerx û ger û fetla gerdûnê pêwîstiya jiyanê ya herî girîng e" gotibû û bi ponijîn dom kiribû.

"Tîkçûna xwezayî mirov pir naêşîne" Hê xebera wê di devê vê de bû, ji sikaka pêşber, sikaka ku ji bilî dengê kerikfiroş tu dengê din jê nedihat, teqteqek hat guhên wê. Teqteqa dengê jî nêz, wekî par van çaxan dîsa rimekê ew ji ciyê wê hildabû. Û pêre pêre wekî bibêje, "Dayê dîsa çi bû?" li dayîka xwe, kevaniya ku li

naverasta malê, di menzela duqatî de ji kufletê malê re taştê amade dikir zivirî û yekawir lê nihêribû. Bi teqteqa çekan re dayîkê jî guh ber bi paceyê ve pêl kir û wekî ew jî bibêje "çi bû keça min?" yekawir li nava çavên wê nihêrtibû. Her duyan jî wekî fam kirin bê çi bû bi hev re neaxivîbûn û tu pirs ji hev û din nekiribûn. Lê, dîsa jî, lêvên dayîkê yên ku bi xembariyeke giran ji hev çûbûn;

"Gelo dîsa mala kê xera kirin?" gotibû. Keçika ku pêşîrên wê wekî du domelanên erdhildayî singê kirasê wê yê sor î tenik hildabû, li xwe fitilî û dîsa li kolanê nihêrî. Lê belê êdî reşê kerikfiroş nedixuya. Dengê wî yê ku digot "werin bacana, werin bacana!" jî êdî li kolanê olan nedida. Keçikê bi lez destê xwe avête destikê paceyê û bi liv-lepteke pir lez-

gîn gewdê xwe yê zirav û ew çend jî taze ra-serî kolanê dirêjî derve kir û li hêla reşê kerik-firoşê ku li pişt dîwarê hewşa wan dirêj bûbû nihêrî. Dema çavên wê bi sorahiya xwînê, ya ku tevî barana payîzî diherikî erdê ket, bav û birayekî wê yên ku par van çaxan ew jî di baraneke payîzî de, hatibûn kuştin anî bîra wê. Keçika ku laşê wê mîna biharê hêj nû dikemilî û dixemilî wek pîtokeke li ber firînê zendên xwe vekirin û li vî alî û wî aliyê kolanê kir qîrîn. Lê ji bilî mişêna baranê ne his, ne deng, ne gazî û ne hawar û ne qîrîn û ne jî dengê giriyekî... Hawara wê bê bersiv mabû. Keçik ji hawara bê bersiv, tirsîyabû.

Eger keçik ne ji wî bajarî bûya wê gotibûya belkî bajar xirabajarekî kevnare ye.

Di bihara umrê wê de bûyerên ku hatibûn serê wê ew hayî gelek tiştan kiribû.

Keçikê;

“Mîna her car dîsa dîlana romê tirsî mirinê li dar e, loma wekî giyandarên kovî yên ku dikevin xewa zivistanê, di kunên tarî de kesên bajêr ketine govenda seknê” gotibû. Û weke teyreke nikultûj bi qîrîn û şeqîn û bi awayekî serhildêrî dom kiribû.

“Nabe, nabe tarî nabe, tarî sekna gorê ye, sekin nabe” Lê dengê wê her bêbersiv mabû. Wekî yeke têt here, çepilên wê ber bi tayê bejna wê ve dirêj dibûn. Hêdî hêdî serê wê jî berjêrî her du xarokên pêşîrên wê xûz dibû.

Lê belê hîn ji paceyê venekişiyabû û wekî kesên bajêr pace li ber xwe negirtibû û per-

deya mîna tariya şevê reş, nekişandibû ber ro-niya rojê. Ji çiyayên pêşber, asoyên ku bihar û payîzan şewqa birûskan ji wan xalî nedibû, dengê celebek çekên mişext, ên ku deng bi çiya û newalan dixistin û giyandar ji xewa hezar salî şiyar dikirin, serê wê ber bi bilindahiya çiyayan ve rakiribû.

Dem a serê wê ber bi bilindahiya çiyayan rabûbû, sê dilopên xwînê, sê dilopên ku hîn ji kes nizane ne ji tirsî ne jî ji kêfa, ji kêrahiya bedenê, hêlîna jiyane herikîbûn nava her du ranên wê. Û gava laşê wê pêjna jiyana wê ya nû kiribû, mîna dardarokên biharê ji nû ve ava giyanê wê tevgeriyabû û pijkojên hêviyên ganê wê pişkivîbûn.

Berî ku mîna teyrekê baskên xwe veke û ber bi çiyayên berz, pozên bilind, birûskên zîvîn ên ku çiraya hêviyên wê vexistibûn û jiyana wê ya nû pê dabûn nasîn hilfire û here, li dayîka xwe, ya ku taştê amade kiribû zivirî. Û hûr û kûr li nava her du çavên wê nihêrî! Çiqas wê kêliyê xwestibû dayîka xwe himêz bikê û evîna dildarê jiyana xwe yê nû jê re şîrove bike û paşê jê re bibêjê;

“Bi xatirê te dayê”

Lê êdî ya bi lêz bû. Çimkî roja li ber ava ya ku wê rojekê karibûya tariya bajarê(n) wê ronî bike, ber bi ava bû û pir bi bez bû.

Nisêbîn 2008

Xeyidandin

Guldesteyek

Husên HEBEŞ

Gava tu bi rê ketî
Gurzek kulîlk
Çilmisî

Gava tu bi dûr ketî
Gulistanek
Vemirî

Gava tu venegeriyayî
Erd û ezman ji hevdu
Xeyidîn

Rojbûna te

Li
Rojbûna te
Ez ê gurzek gulên êşê
Diyariyî te bikim
Ta ku tu bizanibî
Birîn, birîn e
Û ez ji bo evîna te
Her tim birîndar im

Diyarî

Her şev
Wî di tenahiya xwe de
Li ser piştê malê
Stêrk
Yeko
Yeko
Ji ezmên jêdikirin
Û gerdeniyek ji ronahiyê jê çêdikir
Bi sibehê re
Diyariyî te dikir

Tu û Çem

Gava tu seyrana xwe
Di ber çem re dikî
Av zelaltir dibe
û bi evînî diherike

Gava tu avê jê vedixwî
Dilê çem sivik dibe
Û ber bi evîndaran ve diçe

Gava tu tê de
Melevaniyê dikî
Ji şahiyên rêça xwe
Şaş dike
Û xwe di dilê te
Wer dike

Bizanibe ez mirim

Eger rojekê tu hatî û te ez nedîtîm
Bizanibe ku ez li wir im

Eger tu hatî wir jî û dîsa te ez nedîtîm
Bizanibe ku ez li cihekê dûrtir im

Eger tu hatî wî cihê dûrtir jî
Û dîsa te ez nedîtîm
Xemgîn nebe
Kulîlkeke sor di dilê axê de biçîne
Û bizanibe ku ez mirim

Cara yekem e, ez bi tena serê xwe tîm
hevîdîna bavê xwe. Geh bi diya xwe re diha-

Bavê min girtî ye

Behlûl ZELAL

Ji pênc saliya min ve tê bîra min, em tîna û diçin, serê çend salan, mala bavê min diguherînin, min gelek bajar nas kirin, bajarên piçûk, yê mezin, min yekem car behr jî dît

tim, geh bi bapîr û dapîra xwe re. Carina jî apê min ez dianîm hevdiîna bavê min. Lê apê min jî çû. Ji roja ku çûye, leşker ji mala me kêr nebûn. Tîna pîrsa wî dikin. Dema ez piçûk bûm, ji min dipîrsîn. Digotin, ma apê te tê malê? Bi şev kî tê mala we? Bersiva min her tim, na bû. Diya min, kalê min her gav şîret li min dikirin. Leşker çî ji te bipîrsin, bêje na. Wisa ku navê min, navê bavê min bi lêv dikirin jî, min digot na. Li ser vê yekê, hemû bi hev re dikenîyan, peyre ez jî bi wan re dikenîyam.

Ji pênc saliya min ve tê bîra min, em tîna û diçin. Serê çend salan, mala bavê min diguherînin. Min gelek bajar nas kirin. Bajarên piçûk, yê mezin. Min yekem car behr jî dît, di çûn û hatina cem bavê min de. Çûna bajarên dûr, ji bo me pir zehmet bû. Rêwîtiya bi otobozê, şev û rojekê dom dikir. Rê nediqediya. Lingên me diqerimîn. Serê me gêj dibû. Carinan em li malên xizmên xwe yê li wan bajarên dûr diman. Min hez ji bajarên dûr nedikir, serê sê heyvan carekê me dikaribû biçin cem bavê min.

Berî çend rojan ez ketim hejdehsaliya xwe.

Bapîrê min got, “Êdî tu bûyî zilam.” Dapîra min jî got, “Erê lawo, tu li ser destên diya xwe bûyî, tu pêçeka pênc mehî bûyî, dema bavê te hat girtin.” Her yekî, komê zarokên hevalên bavê min çêbûbûn. Hinan ji wan zarokên xwe jî zewicandibûn. Wisa digot, di her cara ku berê axavtinê ber bi bavê

min de diçû.

Goreyên rîsîn, bastêq, benî û mewjên salê di tûrikê min de, tirimbêla me diherike, di nav newal û mesîlan de, nola lehiya avê ya bêserî. Dawiya payîzê ye, zivistan li devê derî ye. Gundîyan çiloyê cêziyan nixûmandine, bajarîyan êzingên xwe hûr kirine, zarok diçin dibistanê, çûkên koçber li ser riya koçê ya dûr û dirêj, biaram in. Bavê min girtî ye.

Apê min jî çû.

Pêşiyê min nizanibû. Dema digotin çû, kêfa min dihat. Ên ku ji malê diçûn, di vegerê de, çîkolate, pêlîstok û cil dianîn ji min re. Min jî pir dixwest ku her roj biçin û vegerin. Lê apê min tenê çûbû. Bavê min jî girtî ye. Ê ez bûme zilam. Zilamê malê, êdî ez im. Her kes wisa dibêje.

Hezkiriyên hevalên min hene. Tirimbêlên bavên wan. Êdî ez bûm zilam. Mêrê malê. Bêbav, bêap, bêheval....

Tirimbêl di nav gund û bajaran de radiweste, hin peya dibin, hin siwar dibin. Tûrikên wan li piştê, zarok diçin dibistanan. Bapîrê min, kurê cîranê me jî anîbû bi me re, roja ku min dest bi dibistanê kiribû. Yek bi yek, gotinên mamosteyî ji bapîrê min re wergerandibû, kurê cîranê me. Tirsiyabûm nola ku ji cinêkî bitirsim. Rûyê mamoste dikenîya lê zimanê wî ez ditirsandim. Her peyva ku ji devê mamosteyî derdiket, nola ku şiveke hinarê ya ter, li piştê min bikeve. Diya

her kesî/ê dihat dibistanê, min şerm dikir her cara ku mamoste digot, kanî diya te? Û wisa ji bêbersiv dimam.

Cotkar, karker, karmend, xerat, dikandar bûn, bavên hevalên min. "Bavê min girtî ye." min digot her cara ku min qet nedixwest ji min bipirsin. Bersiva, pirsê li pey vê ku tavilê digotin "çima?" tu carî min bi lêv nedikir. Hemû çav dibûne hevalê çavên mamosteyî, weke tîrekê li nav her du çavên min diketin... Bêdengiya min dibû bersiv ji pirsê wan re.

"Dilê diya xwe mehêlê, bi ya kalê xwe bike û heta tu karî, bixwîne." Dibêje bavê min. Bêdeng im li hemberî bavê xwe. Ew dibêje, ez guhdarî dikim. Ew dipirse, ez bersivê didim. Carina, bersiva pirsê xwe ji ew dide. Nikarim bêjim; "Ma kî dikare dilê diya min xweş ke êdî? Piştî salên miştî keser. Ma cihekî neşikestî maye di dilê wê de?" Dixwazim bipirsim, ma te bi ya kalê min dikir? Ku tu ji min re dibêjî." Lê devê min girtî ye, nikarim jê re bibêjim, bêrawestan diaxive. Ew dibêje, ez guhdarî dikim. Bicoş e, rûyê wî tim dikene. Bihêvî ye, ji her tiştî. Li dara gûzê dipirse, kevokên li ser bîn, mêmên di hewşê de, yek bi yek di bîra wî de ne.

"Ku hindik ma ez ê bêm girtîgeha bajarê me, hingê bi hêsanî hûn dikarin bîn hevdtin."

inê." dibêje. Lê ez dizanim, ji salên çûyî behtir in salên mayî. Li çavên wî dinêrim, nola du stêrkên şeva meha gelawêjê, diçirsin.

"Ku ez derketim, belkî apê te jî bê malê. Belkî hemû heval vegerin gund û bajaran. Em ê govendê girêdin hingê." Bavê min dibêje, ez guhdarî dikim. Dengê girtî û xizmên wan dikeve nav hev. Deng bilind derdikevin, hêvî mezin dibin. Di pey bêdengiyeke ku min jê nedipa de, gotina xwe ya dawîn dubare dike, "Em ê govendê girêdin hingê....!" bi vê gotinê re rewşeke ku min qet bavê xwe tê de nedîtibû, derket holê. Du hêstir, ji çavên ku a niha ji stêrkên havînê yên meha gelawêjê behtir diçirsin, bi ser hinarikên biken ve hatin xwarê.

Bêyî ku yek ji me biaxive, em li rûyê hev, li nîvê bîbikên çavên hev dinihêrin. Çavên tije hêvî, diçirsin û min bi rê dikan. Saet, roj, heyv diherikin di nav salê de.

Bavê min girtî ye.

Û salên mayî ji yên çûyî behtir in.

Reşemî 2009-Amed

Berhem bi şev ketibû ços û peroşeke bêserûber. Heta sibehê deh caran, ji xew şiyar

Geşt

Selahattîn ÇAM

Bi qajewaja wan re; aşvan û ên ku genim anîbûn aşê, yê ku dehl
û medreb av didan, ên ku hatîbûn masîyan hasilî çiqas mirov di
Zixurê Embarê de hebûn tev li ser golê gihîştin hev

bû. Li benda berbangê bû. Dixwest, şev bi dawî bibe û sibe bê. Lewra dê sibehê biçûna seyranê.

Duh mamoste gotibû; em ê sibehê herin seyranê. Diya wî Askê, hêk kelandin, nan li sêlê xist, nok qelandin, hinar û biyok hazir kir. Ji bo geştê çî ji destê wê hatîbû kiribû. Hinarên vî gundî bi nav û deng bûn. Mala Askê çu dem bê hinar nedima. Askê hinarên sala berê digihand ên sala bê. Hinarên şîrîn, ên tîrş û yê meyxos û biyok di tûrê Berhem de hatîbûn bicihkirin.

Xwişka Berhem, Berfê hêj nediçû dibistanê. Wê jî dixwest bi kekê xwe re, here geşt û seyranê. Lê dê û bavê wê dil nedikirin. Digotin: "Tu hîn biçûk î; tu yê bikevî çem; dê ava çem te dabelihîne." Askê di ber da, neda ew jî ya xwe nema, giriya û digot ez ê herim. Askê û bavê wê destûr dan ku ew jî bi kekê xwe re here. Berfê bi coş, diya xwe hembêz kir û têr maçî kir. Ê bi dengê bilind qîriya: "Bijî dayîka delal! Bijî daka xweşik!"

Duh êvarî, dema ku ders bi dawî bûbû; mamoste gotibû: Sibê bi derketina rojê re, bila her kes, li Binê Qiyamê amade be. Her çend mamoste gotibû bi derketina rojê re; zarok giş di berbanga sibê de şiyar bûbûn û bêsebir li benda rojê bûn. Berhem û Berfîn bi dengê dîkan re, şiyar bûbûn û bi lezgîni haziriya xwe dikirin. Askê jî şîr dabû ser argûnê. Berfînê

bang li diya xwe kir:

- Dayika delal! Zû ke were. Kirasê min li min ke.

Askê şîr li ser ar hişt û hat. Hê kiras lê nekiribû, Askê bi dengê fişefîşa êr veciniqî. Kela şîr çû û şîr bi agir de çû. Askê bi dengê bilind gote wan:

- Serê we bixwe bi geşt û seyrana we de! Ji rûyê we de şîr bi êr de çû. Îcar em man bê şîr jî.

Hê nû rojê tîrêjen xwe bi ser deştê de berdabû. Zeriya tîrêjen rojê tevlî rengê kulîlkên bihara rengîn bûbû û xweza xemilandibû. Zarok yeko yeko, du du û sisê sisê ji malan derketin. Ê berê xwe dan rasta binê Qiyamê. Berhem ketibû bin çenteyê xwarinê û bi destê Berfînê girtibû, bi lez û bez ket nava koma zarokan. Zarok hatin jimartin. Heftê û yek xwendekar û çar jî zarokên wek Berfînê, yê ku hêj nediçûn dibistanê. Di pey yoxlamayê re, zarokan berê xwe dan çem. Wisan bi rêkûpêk dimeşîyan; dişibiyan kurmoriyên ku havinê zad dikişandin hêlîna xwe.

Zarok dema ku di ber Bostanê Biçûk re derbas bûn; bîna gulên rastîn kişandin pozên xwe û berdan hinava xwe. Werg bêhneke xweş ji nav bexçe difûriya ku mirov pê sermest dibû. Bi dûzen û bi pergâl, di nav

kulîlkên nêrgiz, sosin, endok û beybûnan re bi kêf û şahî dimeşîyan. Xwendekar him dimeşîyan û him jî guhdariya stranên Berhem û Şevhîvê dikirin.

Şevhîv mîna Meyremxanê û Berhem jî mîna Hesenê Cîzrawî distriyan û avêtin ber hev. Dengên wan bi ser Komel û Tehta Mertal ve belav dibûn. Şevhîv:

*Lo berde berde. Berdeeee! lawo destê min berdeee!
Lo berde berdee! Berde berdee ! Berho destê min berdee!*

*Havîn e, kul û derd e. Berde kuro destê min berdee!
Berho! Destê min berdee! Derdê min giran e!*

Berhem:

Lê berde berdee! Keçê destê min berdeeee!

Lê berde berdee! Şevhîv destê min berdeeee!

Havîn e! Kul û derd e!

Şevhîv destê min berdee! Agirê eşqê ez sotim.

Lê berde berdee! Şevê destê min berdee!

Bi stran û şahî gihîştin Rasta Komelê. Çavîyên avê, ji bin erdê avêtibûn der. Ava paqij nola camê bû. Zarokan ên ku ava paqij û sar vedixwarin, ên ku serûçavên xwe dişûştin; welhasil her kes bi awayekî bi avê re mijûl dibû. Di nav vê hengameyê de zanayê gund, Xalê Bedran di ber wan re derket. Xalê Bedran:

- Zarokên delal û zana! Hûn nefala hanê dibînin?

Zarokan bi yek dengêkî:

- Belê em dibînin.

Zana:

- Ji we kî dikare, nefala çarpel peyda bike?

Bi vê pîrsa Xalê Bedran re zarok giş li Rasta Komelê belav bûn. Mîna kuliyên sala xelayê li ser genim danîbûn; li nefala çarpel geriyan. Lê çiqaş nefel hebû tev sê pel bû. Zarok qet rastî nefala çarpel nehatin. Di destê Berhem de nefal û bi lez xwe gihand Xalê Bedran. Bi coş û peroş:

- Min dît! Min dît! Min nefala çarpel dît. Destê xwe ber bi Zana ve kir û nefal dayê. Zana li nefelê kûr kûr nihêrî û got:

- Na na! Na kurê min na! Ev ne çarpel e.

Pelek çiriyaye. Bûye du bir.

Xwendevanan êdî dev ji nefala çarpel berdan û ber bi çem ve meşîyan. Wexta ku gihîştin Çirikê, mamoste got: "Li ezmanan binêrin!" Bi vî dengî re, zarokan tevan li asîman mêze kir.

Li hewa di bin ewr de refê qulingan dît. Quling carnan wek tîpa "v" yê û carnan jî wek tîpa "s" yê rêz dibûn û ber bi zozanan ve diçûn. Mamoste agahî da xwendekaran: Ev teyr, balindeyên koçber in.

Dema ku zivistan û sar û seqem tê berê xwe didin beriyê cihê germ. Berî ku germ dest pê bike jî diçin zozanên hênîk. Teyrên koçber ên ku li derdora me tîna nasîn quling, legleg û hecîreşk in. Xwendekarekî nehs û jîr:

- Mamoste, çima em jî wek van teyran nikarin li hewa bigerin? Mamoste:

- Ew balinde ne. Ew bi per û bask in. Bi baskên xwe karin bifirin û li hewa bigerin. Ê me jî piyên me hene. Em jî li ser lingên xwe digerin. Heyber cur bi cur in. Hinek li hewa digerin; hinek li daristanan; hinek di avê de digerin û dijîn. Zarokê nehs û jîr:

- Mamosteyê min xweziya perên me jî hebûna. Em jî wek van qulingan li ezmanan bigeriyana û ji jor de seyra çiya, gund û çeman bikira.

Zarok bi kêf û şahîyeke bêhempa gihîştin keviya çem. Berfa ku li çiya heliyabû ava çem boş kiribû. Av pir zêde bûbû. Avê kef dida û bi coş diherikî. Xumexuma çem wek dengê dengbêjê gund, bi zarokan xweş dihat. Xwendekar li ser çem sekinîn û li kefa ku wek berfa Çiyayê Agiriyê spî û paqij bû temaşe kirin. Av ji jor de sernîşîv dibû, helqe çêdikir û diherikî. Çendekî wisa bi dilxweşî û aramî seyr û temaşa avê kirin. Dûre ji avê têr bûn û têgihîştin ku bîrsî bûne. Hatîn li binê dara çînarê bi cî bûn. Hinek bêhna xwe vedan. Dûre, tûr û kîsên xwe vekirin. Xwarinên ku anîbûn li ber hev rêz kirin. Xwarinên ku li gund hebûn giş li vir jî hebûn. Ên ku qelî anîbûn, ên ku mirîşkên sorkirî anîbûn, ên ku hêkên kelandî anîbûn, ên ku rûnê nivîşk û to anîbûn, ên ku kakilên gûz û behîvan anîbûn,

ên ku, hinar û biyok anîbûn, ên ku tuyên hişk, bastêq û kesme anîbûn; hasilî kê çi anîbû hemû tevî hev kirin. Mamoste û şagirt rûniştin û bi hev re xwarin û fêkî xwarin.

Berî ku ji ser xwarinê rabin, ji xwendekarên pola pêncan Baran dest bi çiroka Mamê Etwan kir: "Mamê Etwan di demeke pir zû de li vî zixurî şivan bûye. Zivistan, havîn sal dozdeh meh li vir, tevî pezê xwe jiyaye. Bi roj pezê xwe çêrandiye û bi şev jî di van şkeftan de bi war bûye. Şeveke zivistanê ya pir xedar, li aliyekî berf û pûk, li aliyê din jî ba û bahoz. Serma û xenîq bûye. Wisa tofan û qîyamet bûye ku gur nikaribûye ji kuna xwe derkeve.

Mamê Etwan pez di şkeftê de bi cih dike; êr dadide û xwe germ dike. Li hêlekê xwe germ dike, li hêlekê jî berûyan dike agir. Bi xwarina berûyan re mijûl dibe. Hew dibîne ku ajalekî gir û bi heybet di derî re dikeve hundir. Tê li rex wî ew jî xwe germ dike. Gava nîvê şevê derbas dibe; ew ajalê bi xof bizot radigire û ber bi Mamê Etwan ve dibe. "Etwo buvvv! Etwo buvvvvv! Etwo buvvvv!" Sêbare dike. Mamê Etwan bizot digire û dibêje" buv û xweş buvvv!" û agir berdide pirça wê.

Ew heywanê gir û bi heybet dike humîn û gumîn û serbijêr dibe. Tevî laşê xwe yê bi êr xwe digihîne vê golê û xwe diavêje avê. "

Piştî xwarin û bîxwedanê zarokan ji mamoste xwestin ku bikevin golê. Dixwestin di nava avê de avjeniyê bikin û di avê de bilîzin. Mamoste ewil dil nekir. Got: "Hûn ê di golê de bixeniqin. Ez destûrê nadim. "Lê zarokan pir lava û tika kirin. Ê gotin: "Mamosteyê me yê hêja, em hemû, bi melevaniyê zanin. Lewra havînan em sê mehan li vir in û her navên rojan di vê golê de ajneberiyê dikin. Bihêle em xwe bavêjin avê û

bi dilê xwe avjeniyê bikin. "Li dû van galegalan, mamoste destûr da.

Zarok di golê de wek beqan, bi lez û bez diçûn jora golê û vedigeriyan jêr. Pêşbaziya avjeniyê dikirin û hevdu noqî avê dikirin. Xwendekar gişt şad û bextwar bûn. Tev noqî aşneber û lîstika nav avê bûbûn. Ji golê dengê şahiya wan bi ser Zixur ve bilind dibû.

Berfîn jî li xafa çem kekê xwe dişopand. Xwest ku ew jî wek wan di nav avê de bilîze. Jor de li wan mêze kir û bi dengê xwe yê zirav qîriya:

- Kekê ez jî tîm! Ez tîm nik te, ez jî ajneberiyê zanim. Got û mîna tîra ku ji kevanê derkeve bi lez û bez hat ser golê. Berhem ber bi berfînê beziya:

- Na xwengê na! Tu neyê. Gol kûr e. Tu na, wa ye ez tîm. Lê Berfînê guh neda kekê xwe û ket golê. Di nav avê de winda dibû û cardin bi ser avê diket. Di avê de cûm dibû û porê wê yê reş li ser avê belav dibû. Zarok şaş û metal bûbûn. Nizanibûn çi bikin, bi ku de herin. Hema bi carekê bû qîjewêja wan.

Qarîn û qîjîna zarokan zixur bi ser xwe ve dianî. Bi qajewaja wan re; aşvan û ên ku genim anîbûn aşê, yên ku dehl û medreb av didan, ên ku hatibûn masiyan hasilî çiqas mirov di Zixurê Embarê de hebûn tev li ser golê gihîştin hev. Hinar xwe serserkî davêtin binê golê; hinar cilê xwe ji xwe dikirin; hinar di nav avê de dikir çelpeçelp; di nav girîn û nalîna zarokan de li Berfînê digeriyan.....

2 Cotmeh 2008 / Mêsîn

Nizanim

Yilmaz DEMÎR

Xofek dikeve dilê şevê
Diricifin stêrkên asîman
Xewnek di bin çavan de
Winda ye...

Bajarek dişewite
Ji hesreta evîndaran
Xiyanet dorpêç dike kuçê
Şop dimeşîne çirayên şevê
Teqînekê dibîhîsim...
Kî birîndar e
Kî mirî
Nizanim...

Keko rûyê xwe dabû cama otobozê li çiyayên Dêrsimê dinihêrî. Rêzeçiyayan hêbet dida,

Sê darik

Feratê DENGIZÎ

Ji serma ricifî, şevê nîve xwe bihartibû, wisa dixuya, mortariyê bêhna wî fireh kir, bêhnek dûvdirêj kişand têra hebûnê, tiştên ku li kaxeza paketa 'Bafra'yê nivîsîbûn da aliyekî ku bê dîtin, sê darikên niftikê pêxist

xweşiya darên berû û bêhna kizwanan mirov ji ser xwe ve dibir. Û dengê ava Mûnzûrê, pêlên bi kef î spî, mîna xweşherikîna jiyanê. Xweşkêşa zinaran û rengîna kulîlkan buhişt didehfand bi wir de. Sêwirandina berziya Tûjik Baba û Duzgun Baba avaza Kalê Zardeşt bû ku pesnê bilindahiyê dida. Xweşlihevhatina darên berû û sira bayê ku pelên wan dileqand, guliyên wan dihejand, avhênikiya dilên evîndaran bû, tew rehberdana nav teht û latan, girêdana jiyanê ya kurdê bêsiûd bû. Mij û morana demsalê xemgîniya emrê dawîn û xatirxwestina bêdil a ji yarê... Dilo êtîmo...

Bi şingîniya deriyekî hesinî yê nêzik li xwe hay bû.

Berê xwe da destava teng a bi çaviyê re. Bi awiran pîva, bilindayî. Erê, mirov tê hildihat. Qirawata rengîn vekir, rast û dirêj kir û vegeriya ser dika xwe.

Piştî ku Kemal xwe dabû ser Doktor û gotibû, "Doktor çi bifikire rast difikire, çi dibêje rast dibêje. Em bi ya wî bikin" ew bi tenê mabû. Aciz bûbû. Dereng diman.

Darizandina Koma Sêweregê hê dûr bû. Îşev Newroz e û Newroz bê çalakî, bê agir nabe Newroz! Rewşa girtigehê ji aşkere ye, bêlîvî, bêçalakî mirin e, bêserdarî xetere ye, bêdengî xetere ye, pêşengiyê nêzik, çirûskek divêt. Divê av tev biherikin çalekê; çala dîrokê, bîra kurdan, bîra mirovahiyê.

Bêyî xwe ket nav ramanên kûr.

"Ev çima wiha ye, em têra xwe bedêlê didin lê tarî didome. Xwîna ku herîkiye û hê diherike jî deryayan dadigire, ilim rêyek heye" û bêyî ku li dora xwe binihêre zoq li dîwêr nihêrî. Kawayê Hesinkar sêwirî di qilêriya dîwêr de, şewq da, her der rohnî bû, ew matmayî kir.

Di ramanan de berê xwe da binê bîrê. Xwe li binê bîrê dakir.

Gelo çima êlekê Kawa bi sê rengan xemilandibûn û kiribûn al, çima kesk û sor û zer...

Zardeştîyan jî sê reng derxistibûn pêş, spî dabûn ser zeriye...

Îsa jî digot; Bav, Kur û Rih-ul Qudis...

Wek ku kevir hêdî hêdî li cîyê xwe rûdiniştin. Kevir li cih rûniştin.

Sê peyvên pîroz; Azadî, Aştî, Demokrasi...

Herê Azadî bêyî Aştî û Demokrasiyê pêk nayê, bêyî wan nabe û li ser lêlatê, li ser bingeh û xebata berxwedanê. **Berxwedan Jiyan e!**

Ma di zanyariya hendeseyê de jî ne wisa ye; lêlat (düzlem) encex bi sê nixteyan diyar dibe. Lêlat encex dikare li ser sê nixteyan rûnê û aşkere bibe. Bi sê nixteyan hebûn bi cih dibe.

Zardeştê Kal digot: Sê hîmên qenc hene; **raman, peyv, kar**. Qenc bifikire, xelata ramana

qenc stêrk e; Qenc bibêje, xelata peyva qenc heyv e; Qenc bike, qenc pêk bîne, qenc kar bike ku ev herî birûmet e û xelata vê jî roj e. Xelata wan jî xweş e; stêrk, heyv û roj... Kar bi qîmet e û xelata kar jî mezin e, Roj...

Em vir de werin.

Sê telaq. Qewlê Nebî sê caran e...

Sê rûbarên pîroz; Tîjle, Ferat û Ava Zê...

Sê çiyayên pîroz; Cûdî, Ararat û Gebarê...

Teqereqa avbarana ku li paceya dûr û bilind dixist ew hebekî hişyar kir. Deng ji çaviya kêlekê bi nizmî dihat;

"Keko..! Keko..!"

Deng nebîr xwe. Di ramanên xwe de di avjeniyê de bû.

Gotheyî digot; "Hîn zêdetir rohnayî..."

Çima agir, rohnayî û tav... Çima Roj..?

Divê tarî rohnî bibe. Agir gunehan, qirêjan paqij dike, dike ariya pak î pîroz.

Erê îro Newroz e û li navenda dil, li navenda dilan wê azadî bibiriqe.

Êdî hebekî rihet bû, ji ber ku ramana wî zelal hişê wî rohnî bû.

Qêrînekê ku tariya şevê diqelaşt, şîqandina bazekî guh kerr kirin lê derdor kerr bû.

Dîsa li rêya Dêrsimê bû, rojeke biharê ya xweş. Tavê ruh dida hebûnê. Herê, hebûn li ser sêgoşeyî rûdinişt, sêhra sisêyan heye. Tava

sibehê lûtkeya çiyayan dibiriqand, ew miz didan; Mûnzûr, Tûjik û Duzgun... Aşiq, mehşûq û birdozî; domdariya jiyanê. Bengî, Dilketî û Evîn; tovhebûna jiyanê. Pêlên Ava Mûnzûrê distira, kilama Cembeliyê Mîrê Hekariyan digobilî di mejiyê wî de, werê spî, werê zelal, biriqaandî, xweşherikbar mîna kilorên marê pîroz û bi xweşawaz.

Ji serma ricifî, şevê nîve xwe bihartibû, wisa dixuya, mortariyê bêhnna wî fireh kir, bêhnek dûvdirêj kişand têra hebûnê... Tiştên ku li kaxeza paketa 'Bafra'yê nivîsibûn da aliyekî ku bê dîtin, sê darikên niftikê pêxist, danî ser derabeyên mazgala pêşiya çaviyê û berê xwe da cihê destavê yê teng. Qirawata rengîn kir girêtoka sêdarê û xist stûyê xwe û avêt boriya jor a di ser eynê re û gewdeyê xwe berjêr berda.

Êdî azad bû.

Çirûskên sê darikên niftikê, çirûskên sê darikên kifrîtê bûn alaz, paceyên zindanê alastin û di lûtkeya çiyayan de bû agirê Kawayê Hesinkar; çiya, şar, war û wargeh tev bi agir biriqîn, rohnîyê gerdûn alast û ev agirê azadiyê hê jî gur dibe û ji zarokan re, ji pêşerojê re, ji hebûnê re efsaneya Kawayê Hemdemî, efsaneya azadiyê vedibêje...

14 Tîrmeh 2008 / Amed

Sibeh hêviyeke nû ye. Sibeh rûyê tarî ronî dike. Bi sibehê re ronî belav dibe, di nava

Sibeh

Rodî ZINAR

Sibeh êdî dema hevdana debrê ye, sibeh êdî dema dîtina fêkiyên westiyayî ye, sibeh êdî dema temamkirina xewn û xeyalên nîvco ye, sibeh êdî devliken e, mîna roja ku dertê

gelan de bêyî navber.

Lê vê rojê sibehê bi kerb dest pê kir. Tevî giregira firok û balafiran, hesin dibariya ji esmanan. Çi xewn û xeyalên min hebûn dûr ketin û navber kete nava min û wan. Gelo careke dinê ez ê dayika xwe bibînim? Gelo ez ê careke din bikaribim ji hezkiriya xwe re nameyekê binivîsim? Dawiyê ew ê bi çi awayî be nayê texmînkirin.

Xwe ji jor ve berdida û dihat xwarê. Berî bigihîje erdê diteqiya û belav dibû li erdê. Mîna zinarê ku ji germa bisincire bisincire û biteqe; li derdorê çi hebin, te dibê dar, zevî yan kes çi hebin birîndar dibûn û derb dixwarin. Îro ji dêvla teqîna zinaran, hesin tîn xwarê û berî bigihîjin erdê diteqin. Teqîna zinar zirarê dide jiyanê lê ne weke ya hesin e. Hesin ji jor de berî bigihîje erdê diteqe û jiyanê tevahî birîndar dike. Cihê ku lê hesin diteqin tiştekî sax nahêlin. Ji ber ku êrîşên bi vî awayî dijar in û tu sinc û exlaq nas nakin, biçûk û mezinan didin ber xwe...

Komarên hemdem di nava xwe de peyman çêkirine ku bikaranîna mîsketê qedexe ye. Bikaranîna mîsketê wekî erîş li ser xwe dihesibînin. Lê carina durûtî dikeve dewreyê û bêdengî yan temaşevanî dikeve rêza yekem. Ev bêexlaqiya sosret bêhtir balê dikişîne.

Hesinek teqiya... Yekî dinê, yekî dinê ji teqiya...

Cihê min binê zinar e û ez di ewlehiyê de me. Lê ew dara ku her gav min li bin wê hilma xwe vedida çi bû? Lê gelo hêstira ku ez pê hatibûm heta vê derê bi ku de çû? Gelo ew kaniya ku av jê diza çi pê hat û bi çend cihan derb xwarin? Kîroşka ku ev deh roj in hevaltiya min kiriye di vê deqeyê de berê xwe daye derve û çûye derve. Aqûbeta wê çi bû gelo?

Kîjan çiya û daristanên welatê min bê derb in? Xemgîniya dilê min in! Ez dizanim ew bi tevahî birîndar in...

Lê bi rastî û hêviya min î li pêdarê roj ronî ye û hêviya min didome.

Li benda bersiva pirsên xwe me û naxwazim bimirim, heta ku dilê xwe dixime cih. Dema ku dilê min ket cih, êdî bila biherike çemê hestiyariyê yê nava dilê min ku min pê nikaribû bila biherike... Berê min dide ku bila qe bidê; ez ê rêhevalên pêlên vî çemî bim. Ew ê dewlemendiya jiyanê li dar bikeve û ya rêhevaliyê...

Seyrangeh têra gera me nake, teng dimîne cihan, ez ê heskirina xwe bi ser de bişînim; bila cihan rengîntir bibe.

Sibeh êdî dema hevdana debrê ye,

Sibeh êdî dema dîtina fêkiyên westiyayî ye.

Sibeh êdî dema temamkirina xewn û xeyalên nîvco ye.

Sibeh êdî devliken e, mîna roja ku dertê.

Heskiriya min, dildara min, di kêleka derî de serê xwe rê min daye. Baqek genimê sorgul aniye û ew ê bike firîk û em ê bi hev re bixwin. Pirtûkeke wêjeyê, tevî aktorên wê aniye û li hundir belav kiriye; şanoyeke dewlemend li dar dixê. Tê de evîna min, tê de xwesteka min heye. Zîndewar bûye û dileyîze.

Êdî min rûyê te dît, min tehma te seh kir, ez te bernadim. Ez hatim girêdan bi heft werîsan, heta mirinê bi te re me...

Bila ji xwe bitirse komara ku di kêrahîyê de; di şereşa tarî de qirêjiyê dijî. Êdî dawîya

gund û daristanên şewitî tîn, koçberiya bi darê zorê qediya û ew ê bibe efsane.

Heta vê demê min xêr nedît, lê ji aniha û pê ve nikarim ragirim çewisandina berê.

Çavsooriya te li ba min hêjahiya xwe wenda kir.

Em ê bi destê hevdu bigirin û ji vî serê dinyayê bimeşin heta wî serê dinyayê... Bi kêfxweşî û devlikenî... Ji ber ku hêviya min bi sibehê re ye û sibeh bi xwe re roniyê tîne û êdî dev ji tariyê berdaye...

rojekê gotibû ewk, tê bîra min, gotibû jin, na na, gotibû hûn jin, îcar dilê min mabû, ez jê

Ji ku dîsa hat bîra min

Bilge KARASU

qehirîbûm gotibû neqehire, xuya ye dîsa tu dixwazî bi ser min hîlbî, lê hiş be, hiş be carekê guhdarî ke, gotibû ez ji vê diredir û pelpela te aciz bûm, ez wê gavê çima hiş bûm min çima bêdengî pejirand nizamim, gava got hûn jin divê ez bêdeng nemama, lê min hişsivikî kir, wek di hemû emrê xwe de min kirî, ew çend ne hişsivik bûma, ne min bavê wî dikir, rehma Xwedê lê be, cihê rebeno cinet be, ha yek ew bû hezkiriyekî min, wê tifaqa bêoxir ew ji min stend, ez ne hişsivik bûma ne min Reşîd dikir ne jî, ewk, heke ew li holê nebûna min Reşîd nedikir, kî dizane ez ê çiqas baş bibûma, na belkî hê xerabtir bibûma, ha di rûyê wî de, ji ber ku min jê hez dikir, wek delodînan, berî çêbibe bi gelekî di zikê min de pehîn davêtin hingî min meyla xwe dayê, ez ji bo nefsa wî, wî yê borekfiroş bikim bi ser de ew were dengê xwe li min bike, bibêje hiş be, bixwaze hiş bike, digel ku zanim ji min hez dike, ne guncav e ji min hez neke, digel ku zanim ne guncav e ji min hez neke, digel ku zane ji min bêhtir tu jin heta tu mêr jê hez nakin hezkirina wan têr nake, dîsa jî dilê min dihişt, dengê xwe li min dikir, bi ser min hildibû, wê rojê çawa min ji ba xwe neqewirand, çawa min xwe neavêt behrê, hûn jin, hûn jin dibêje ji min re wek ku ez jî ji wan jinên din im, bila bibêje hûn jin gava ji yekî hez bikin kêmaniyên wî bibin perde bikevin ber çavê we jî hûn nabînin, bila bibêje hûn ê xwe nedîtî bikin nabêjim hûn naxwazin bibînin nabêjim hûn nikarin bibînin dibêjim, bila bibêje hûn nikarin bibînin ji ber ku hûn kor in, qaşo ez kêmaniyên wî nabînim, ma min kêmaniyên wî nedîtî qey, ez ji qehra difetisîm min tiştê nedigot, roj li min dibû jehr şev dibû roj, gotin ji min çenedibûn dîsa min dengê xwe nedikir, ma min kêmaniyên wî nedidîtî, helbet min xwe li nedîtî datanî, wî ev zanibû, paşê bila rabe bibêje nabêjim hûn xwe nedîtî dikin

nabînin, bila bibêje heke ew çavê ku wan bibînin li ser we hebûna jinîtiya we nedibû jinîti, bila ji diya xwe ya ew di zikê xwe de gerandî ji bo nefsa wî her êş kişandî re jin bibêje, helbet ez jin im ez jin im lê li ber çavên wî divê ez ne jin bûma, jixwe ji wextê wî di zikê min de aj da û vir ve ma jinîtiya min ma ku, bila bibêje hûn nabînin ji ber ku hûn kor in, erê, rojên berê, hemû çûn, çû ji min dûr ket dûrîti ket navbeyna me ket navbeyna bedena me, odeya me, xwarina me, tîna me, digel ku ji xeynî min tu kesî wî ji xeynî wî tu kesî min nîn bû, digel ku em li heman malê radibûn û rûdiniştin an jî wer dixuyan, ji min dûr ket paşê rojekê hat ba min siûda me em anîn cem hev, wek meseleya keştiya ku diyar e wê noqav bibe mişk jî jê direvin her kesî ew berdaye Xwedê zane, tikîtenê maye ez hatime bîra wî dîsa, belkî ket dilê wî ku wê nexweş keve, delalîkê min li min vegeriya, ji dil ez heta niha li vê nefikirîbûm, ji min we ye çawa li min vegeriya çawa çav li min ket nexweş ket, ji min we ye ji ber ku bêgav bû li min vegeriya loma xwe ranegirt, ji min we ye di ber de neçû xwar, qet û qet nehate hişê min, min bibexşîne Xwedayê min min bibexşîne ez ketim ber gunehê lawê xwe, belkî ez şaş im lê na na wele bêguman bêguman ji ber ku dizanibû wê nexweş bikeve hîs dikir wê nexweş keve li min vegeriya, min jî xwest têbigihîje ku dilê min maye, sûc ê min e guneh ê min e, min bibexşîne Xwedayê min, min tu ji bîr kirî jinîtiya min li min dest da, çavê min kor bûbûn min nedidîtî tiştên diviya min bidîta min dikaribû bidîta, heqê wî hebû belkî jî, heqê wî hebû belê,

min bibexşîne Xwedayê min, dîsa jî ji bîra min naçe çawa li min vegeriya venegeriya nexweş ket ji bîra min naçe, nexweşî dibêjim demên xwe bi xwe dipeyivim jî, ji bilî nexweşiyê naxwazim tiştêkî din di hişê xwe re derbas jî

bikim, heke na ya nexweşiyê nexweşî bû lê, hişê kurê min tevlîhev bû, dîn bû, nedixwest derkeve der digot wê min bikujin ma deng hengame nayê we li derve şer e Xweda dinyayê ceza dike ji cezakinê re şeytan berda ser rûyê erdê, mêr tev wê bimirin ez naxwazim bimirim, tenê jinên ducanî wê bifilitin ew ê zarokan ênin hemû ne jinên qenc in ew hemû ne jinên qenc in lê zarokên wan divê qenc bin ew zarok wê zora şeytên bibin wê rêya diçe ba Xwedê bibînin wê bibin kesên li gor dilê Xwedê jin ê nemirin, Xwedê hê di guhê min de gumeguma gotinên wî ye, wek ku vêga di ber guhê min de dubare dike, peyre peyre dengê çekan hew wek berê hat, rihet bû hedînî, sawa wî nemabû, digot Xwedê êdî ji xeynî zarokan kesek nikare te bibîne ji xeynî zarokên ku bi çepeliya dinyayê nelewitîn kesek nikare bigihîje te, wan çaxan li hundir digeriya êdî, me ranedizand, lê gava biyaniyek dihat malê, çawa dengê dêrî bihata tavilê direviya odeya xwe derî li pişt xwe mifte dikir, rûdinişt, di wan kêlikan de tirsekê xwe berdida ser dilê min min li dêrî bixista çawa be jî min dizanî bersivê nade îca hêrs bibe bi ser de tişteki ji xwe bike min di qulika dêrî re lê dimêzand, li quncikekê odeyê quncifandî rûdinişt, li erdê rûdinişt, min hêviyên xwe ji rihetbûna wî, min li min negire Xwedê, min ji te jî hêviyên xwe birîbûn, min bibexşîne, bibexşîne,

paşê got berçavk jê nehat xwar, li ku berçavkek bidîta êrîş dikir, çavên sax berçavkan navên digot, axir rojekê li berçavka xwe pirsî, min got kurê min te şikand, lê nehat bîrê, got ku min çawa şikand dako, min wê kêlikê fêmkir ku rihet bûye, min ji te re şikir kir Xwedayê min; te dîsa bi destê min girt anîm ser derba xwe, min ji te re şikir kir Xwedayê min, min bibexşîne min bibexşîne,

gava min dît hew çavreşiyê davêje min ji kêfan min hew zanî çî bikim, tu nabêji ez kor bûme, bi rastî ez kor bûme min nedîtiye ku çavreşiyê naavêje min, nexweşî wê bihata wî nexweşî wê bihata, loma wer tevdigeriya, çawa li min vegeriya bi min re pevçû dîsa, digote dako dîsa jî pevçûn derdixist, nexweş ket paşê, rabû ser xwe, belê paşê dîsa ji min

veqetiya, pênc sikak ketin navbeyna me vê carê pênc sikak sih û neh dergeh, seriyan li min dixe ez jî lê dixim lê naxwaze vegerê malê, kêlikê tê malê jixwe nêzikî li deriyê odeya xwe jî nake, dînîtiya wî wek ku di wê odeyê de wî dipê, ji odeyê ditirse ji deriyê wê jî lê belê aniha çawa be baştir e, dikeve odeya xwe dinivîsîne dixwîne dixebite jî, her meh tê dibêje ha ji te re dako perê te, tişteke pere ji min re datîne, ez dilşad im dilşad im ji vê rewşa wî, pereyan datîne pir rûnanê dipirse ka ez ê kengî biçim dîtina wî, jê re dibêjim ken tê ser rûyê wî difetile diçe, gava li ser hev seriyan lê dixim ditirsim aciz bikim lê belê dîsa jî carekê dereng bimînim li min digere, Xwedê çî dibe dîsa vegere mala xwe, min ê odeyeke din bidayê xanî yê min e çawa be dewlet serê Reşîd, debara me li ser vî xaniyê ye, rehma Xwedê lê be ez di qenciya Reşîd de mam ez gunehê wî ji xwe re dibim bi rastî lê hemû êşa jiyana xwe jî ji wî dizanim, axir vêga ne dora Reşîd e,

bes aniha naxwaze bê cem min, lê ez çaverê me, li hêviyê me, wê rojekê bê, wê ji hemû tiştan aciz bibe wê bêhteng bibe wê bê, bêhteng lê êdî wê nexweş nekeve, wê Xwedayê min wî bide xatirê min, wê di nav bêhtengiyê de be lê hemêza min vekirî ye, ez çawa çaverê me dizane dizane dizane,

ji ku dîsa hat bîra min ew roj, ji bîra min naçe dîsa jî gotinên wî yên wê rojê, hat bîra min aniha bê em li ser çî pevçûbûn, li ser hevalekî wî, ew hevalê xwe yî ku ne bi seriyek pîvaz e di ser min re girt hingî, aniha jî belkî wîlo dike lê êdî nayê ji min re behsa hevalê xwe nake, ji wî we ye ez hew çavnebariya wan dikim loma, kirinên xwe êdî nayê yeko yeko li serê min naxe, heyamekê dihat wîlo dikir lê, êdî ji wî kirî min dev ji çavnebariyê berdaye, lê belê hê jî ez ez ez naxwazim bêhnekê wî bi kesekî re parve bikim, ji dostên wî heval hogirên wî heçî ku hezkirina min parve bike dihesidim, lê min kengî li balê çavnebariya xwe diyar kiriye ku, min çî gotibe ji bo qenciya wî gotiye, çawa dilê min ê ragirta bi dan û stendina wî dostaniya wî ya bi kesên bê ser û ber re, min ji tevan encex yek dido ecibandin, ma jixwe tevan ew tenê nehiştin, dema nexweş ket yekî

tenê hat lê pirsî qey, jixwe tu caran wan jê hez nekir, wî jî wan hez kir agir ket dilê wî xew neket çavê wî çî jî destê wî hat kir seba wan şeva wî roja wî herimî ji bo nefsa wan, besî wî bû hebûna wan kêlîka li ba wî bûna, ji kesî dawa hezkirinê nekir, ma ji vê jî ne haydar bûm qey, lê vê gavê tiştekî nabêje êdî, dibêje hizûr carcaran dibêje hizûr dibişire, carekê têbigihîştta ku jê hez nakin jî,

tu çavnebariyê dikî digot hingî, tu çavnebariyê dikî şerm e ji te re, belê min çavnebariya xwe ji xwe bi xwe re jî eşkere nedikir, çawa zimanê wî geriyabû wisa gotibû, hûn jin, kêmaniya me ev bûye, erê em naxwazin kêmaniyên hezkiriyên me hebin, kêmaniyên wan hebin em xwe li nedîtî datînin, lê nexêr em kor in em nikarin bibînin, na bi serê te na min gotibû wê rojê, min gotibû çavê jinekê ji çavê deh mêran çêtir dibîne rastiyê, bawer nekiribû, neketibû serê wî, li min guhdarî nedikir hingî, de heyra qey kengî xwest li min guhdarî bike, tim û dayîm ew dipeyvî, min dema dikir ku tiştekî bêjim tavilê dixwest hiş bibim, ez jî li gotinê nediheyîrîm, dema min digot ez a rast didim ber te loma tu hêrs dibî dixwazî min hiş bikî hê bêhtir diqehirî difûrî, çî dihat ser zimanê wî digot roja me her duyan jî dibû jehr û ziqûm ji rûyê wî de, heke na min kengî ya şaş da ber wî ku, min kengî tiştekî ne li rê da ber, lê xweş xuya ye nedixwest rastî jê re bê gotin, tim û dayîm ji min hat xwestin ku derewan bikim, bi maweyê emrê min bi maweyê emrê min,

pêşî me bi bavê wî re jiyanê derewîn borand, çiqas min hewl da ku ew tîkelî vê jiyanê derewîn nebe nebihîze, bi ya min bûya min nedihişt bi kesekî re rabe û rûnê, lê bavê wî, rebeno ji dil bavîtî jê re kir, çiqas jê hez dikir, Muşvîk jî Muşvîk jî pakopîso rûmeta wî digirt lê carek bi tenê jî ji bo xweşkirina dilê wî be jî jê re nekenî xwe neavêt hambêza wî negot yabo, wekî ku dizanibû lê îmkana wê nîn bû wê jî ku zanibûya, paşê dema nexweş ket tiştine wer gotin hey gotin lê min guh nedayê, him jixwe ew gotinên kêlîka din gotin nehatibûn bîra min, min jî ji bîr kir nexwe, nikaribû bizaniya lê kurikekî dilwaswasî bû,

bavê wî bavê wî mêrekî pir cihê bû ji min pir hez dikir, Reşîd jî wî jî carekê ji min re negot tu şaş dibêjî, Reşîd dizanibû jî dêla şaşitiyên min bêdengiyê hîlbijêre, gava min tişteke digot dizanibû ku rast e digot tu ya rast çêtir dizanî, Muşvîk, kurê min, tu carî nexwest tişteke weha ji min re bibêje, ji wî bipirsîn wê bibêje her gotina wê xelet her gotina wê şaş e, axir belê, wê rojê Xwedayê min xwest min biceribîne qey, gotinek weha bi kurê min da gotin,

qey ez jî çima vî qasî li vê asê mam, pa ez çî zanim vêga hat bîra min, hûn jin kor in gava hûn ji zilamekî hez bikin kêmaniyê wî ya piçûçik jî hûn nabînin dibêje, na negotibû kêmaniyê piçûçik, gotibû ewk, hûn kêmaniyê bi tenê nabînin lê bila carekê bixelite li hember we sîcekî piçûçik bike, erê wiha gotibû, li hember we gotibû hingî perdeyeke din tê ser çavê we, êdî şûr bi diranê xwe bi sarî bicû jî li darê dinyayê di çavê we de ew bû kesê herî xerab, ne derew e jî ha, mirovek baş be baş xerab e xerab e, ma xêr jî zilamê ku dilan bişikêne tê, wî dilê min gelek caran şikand, lê çî bikim kurê min e, çî bike ez lê nagirim ez ê wî bibexşînim, ez ê dîsa layî berê jê hez bikim, qet neke neşikêne çêtir e helbet, lê kîjan kur dilê diya xwe naşikêne nexasim ku dayikek wek min miriya kurê xwe be, lê ma wisa hêsa dayikeke ku wek min ji kurê xwe hez dike peyde dibe, kîjan dayikê bi qasî min xwe feda kir, kîjan dayikê wekî min di oxira kurê xwe de ciwantiya xwe bi avê de berda, ax jî ku hatin bîra min ev, xewa min herimî, jî ku hatin bîra min vê nîvê şevê, pêxeber e ku hê jî di nîvê şevan de bi taswas xewa min diherime, pêxeber jî be wê tê bigihîje nexwe, belkî hêrs jî bibe lê na hêrs nabe êdî hêrs nabe, belkî jî hînî hezkirinê bû, Xwedê zane hînî hizûra hezkirinê bû, hê wê roja hanê em her du ji bîr ve çûbûn, em çûbûn hey çûbûn, ji nişka ve hilçenî, got dayê tekane rêya diçe ba Xwedê di evînê re derbas dibe bi maweyê emrê xwe em her du li vê geriyan te nedît belê min dît, got ku evîna mirovekî xwarin, vexwarin, lixwekirin, raketin wek minêkariya binbariya li hember Xwedê te xwest pêşan bike tu li vê geriayî lê min dît,

heçî hînî hezkirinê nebe vê wiha dibêje qey,
 lê hînî hezkirinê bûbe jî dîsa naxwaze xewa
 min ji bo wî herimî be dîsa ténagihîje, dayika
 min cihê wê cinet be, çima hate xewna min,
 ma dîsa wê tiştek bê serê me, ez
 radiwestiyam, şibakeyên mala me yên li
 hemberî behrê pir bûn belê min ji yekê pir hez
 dikir, min ji Hîsarê heta bi Arnavutkoyê hemû
 der didîtin gava li ser sedrê rûdiniştim,
 Muşvîk bi ber singa min ve bû, min şîr dida,
 gava şîrê min dimêt wek her carê bi kêf dikir
 himûgim, digel ku tîrsa wê bixenîqe bi min re
 çêdibû jî min pêsîra xwe ji devê wî nedikêşa,
 çavên wî dişeqitîn, kûr dibûn, bel dibûn, miç
 dibûn di her daqultandina wî de, ez ji
 lênihêrtinê tîr nedibûm, ez li bavê kurik ê ku
 ew nedîtibû difikirîm digiriyam, Reşîd hê li
 holê nîn e hê bi wî re nezewicîme, li odeyê bi
 tena serê xwe bûm, li pêşberî min vapûr
 dibihurîn, di pêşberî koşka me re kêr caran
 vapûr dibihurîn, ji nişka ve vapûrekê xuya kir
 li ber rihtimê, li pîpîkê xist, mirin bû ev vapûr,
 hatibû lawê min ji min bistîne, Muşvîk hê
 pêsîra min bernedabû, hişk pê girtibû, vapûrê
 careke dî li pîpîkê xist, dengê vapûrê tûj î
 dişwar bû, kesek li malê nîn bû ez tenê bûm,
 vapûrê piştî ku careke din li pîpîkê xist ji nişka
 ve ket rêya xwe û çû, gava min di şibakeyeke
 din re mêzand min nedît, diya min hat odeyê,
 ez bizdiyam, min Muşvîk bi ser singa xwe ve
 didewisand, dayê dayika min bi wî rûyê xwe
 yî spî spî porê xwe yî berfî yî zirav çirûskî bi
 kirasê xwe yî reş î qîrî dayika min hat ba min,
 got netirse keça min kesek nikare lawê te ji te
 bistîne, heta îro kîjan dayikê zaroka xwe bi
 dest xelkê ve berdaye, min tiştekî wiha
 nedîtiye nebînaye, dayik dimire zaroka xwe
 bernade, paşê li rûyê wî nihêrî, got ev kurik
 tîr bûye, ma tu nabînî, çima tu hê jî şîr didî,
 xewa wî tîr êdî wê di xew ve biçe, ka wî bide
 min, min li rûyê diya xwe nihêrî ne dayika
 min a rûşîrîn bû ya li pêş min, yeke biyanî
 rûxerab bû dixwest sebiyê min ji min bistîne
 bi fênan, çavê Muşvîk girtî bûn, lê ji kêfan re
 girtibûn, tîr nexwaribû hê, dimêt, min hîs
 dikir ku şîr ji hestiyên min dinizile diherike
 pêsîra min, çawa min ê bidayê, min got ne te
 digot dayikek zaroka xwe nade kesekî bi dev

kesekî ve bernade bimire jî zaroka xwe
 dihebîne disitirîne, wê gavê jinik kenîya, ji
 nişka ve min xwe li çolekê dît, jinikê bi ken
 dida dû min ez direviyam, Muşvîk di ber
 singa min de hê jî şîrê xwe dimêt, şîr nedihat
 êdî, kurê min dest bi girî kir, ez direviyam wê
 jinikê dida dû min, giriyê kurê min û kenê
 jinikê li hev hebilîn, hingî li dûr min diya xwe
 dît, çengê xwe kiribûn bask ji min re digot
 bibeze were ew westiya bêhna wê çikiya êdî
 nikare bigihîje te, bi bêhnefişkê min dida
 hevrêz, jinik pir li jêr mabû, çi nemabû xwe
 bavêjim hemêza diya xwe, Muşvîk seraqet
 digiriyam, min got dayê şîrê min ziwa bû, diya
 min serê xwe hejand, tam ez ê bigihîştamê, ji
 ber çavan wenda bû çû bû sir, Muşvîk hedinî,
 çîçika min gez kir, berê xwe fitiland paşê,
 hişyar bûm, di xwêdanê de mabûm, xew li
 min herimî, gava Muşvîk berê xwe fetiland
 wek bi çavê xwe ji min re bibêje tu dayikeke
 biqisûr î şîrê te ziwa bû, ma şîrê dayikekê ji
 tîrsa ziwa dibe, min kengî qisûrek kir, min
 kengî yeka wî kir dudu, gava min digot bi
 wan mirovan re nede û nestîne min qisûr
 dikir, Muşvîk gava ew dianîn malê min carekê
 jî devê xwe vedikir tiştek digot qey, lê zarokên
 neqenc bêfedî bûn, wî ji wan hez dikir her tim
 min qisûrê wan didîtin, ma loma jin biqisûr
 dibin, ma ji bo ku rastiyê dibêjin, ax ez piçekî
 raketima, divê ez sibê herim wî bibînim, divê
 pê şa bibim destê xwe ser serê wî re bibim
 divê maç bikim divê qisûrê wî nedim rûyê wî
 divê wî bibexşînim, Xwedê min bibexşîne, ez
 jin im ma ne dayik im?

min ji wî re, ji bo xatirê wî ji hevalên wî re
 çîrok digotin berê, rojekê dilê min jê mabû çar
 salî bû min dikir wî li mal bihêlim derkevim li
 pey min bi melûlî dimêzand min di bin çavan
 de didît wek ku wê bigirî rûyê xwe tîr kir,
 paşê hêvîsariyeke xedar hat ser rûyê wî got
 heke tu min bihêlî biçî ez ê ji ba kim ereb bila
 were min bixwe, çi dibe çi dibe ku aniha jî
 heman tiştî bibêje, ma wê çi bibe ku aniha jî
 bibêje dako ka çîrokekê ji min re bibêje?

(Werger: Brahîm Ronîzer)

a) Dewlemendên neteweyî û hunerên

Çend pîrsgirêkên dîrokî yê hunera şêwekarî

Fewzî BÎLGE

Gava mirov bi tevayî li dîroka hunera dinyayê dinihêre; dibîne ku kîjan netewe be bila be, hunerên şêwekarî bi xêra dewlemendên wan ên neteweyî bi pêş ketine....

şêwekarî

Di civaka me de sedema ku hunerên şêwekarî (wêne, peyker, avahîsazî) bi pêş neketine û nakevin jiyana civakê, sedemên wê yê pîr girîng hene. Yek ji wan sedeman a herî girîng jî tunebûna dewlemendên neteweyî ye.

Weke her neteweyê, neteweya kurd jî ji bo xwedî li dewlemendiyên xwe derbikeve tevgeriyaye. Di sazûmana feodalî de xwe daye hevdu û di berbanga kapîtalîzmê de li hember serdestan serî rakirîye. Ji bo sînorê neteweya xwe deyne û li dewlemendiyên di nava wî sînorî de xwedî derkeve. Lê her carê heta serhildana 1925'an jî serdestan bi giştî bi rêgezên hovane ev şikandine. Ev şikandin ew ji ber hev de xistine, tu carî nebûne hêzeke xurt. Di nava pêvajoyê de li hember wan êrîşan dewlemendên wan karakterê xwe yê neteweyî wenda kirine. Bi hejarbûna feodalîzmê û gêşbûna kapîtalîzmê re dewlemendên bazirgan derketine. Lê ji ber mîrateyeke wan î xurt ku ew ê ji dewlemendên neteweyî ji wan re bimaya, nemaye. Ji ber wê jî dewlemendên bazirgan bê karakter, tirsonek, bêreng û bê deng bûne.

Sirûştî ye ku dewlemendên her neteweyê bi her awayî dibin xwedî dewlemendiyên neteweyên xwe giştî. Kurdan, ango dewlemendên wan ê ku gelek caran xwestine bibin xwediyê dewlemendiyên neteweya xwe lê ji ber gelek sedemên ku tên zanîn bi ser neketine. Serdestan her dem bi awayekî hovane ew tune kirine û diyalektîka wan şikandîye. Ji ber

wê şikandinê psîkolojî û sosyolojîya wan xera bûye, ew bê deng mane û rêgezên têkçûyinê, -xwe red kirinê- bi kar anîne. Ji ber wan rêgezên wan ên têkçûyî tirs li wan peyda bûye û ev yek ji wan re bûye tiştê ku herî zêde jê tirsîyane. Û ew tirsê di kurahiya rihê wan de bi cih bûye. Ji ber wê jî kêma kes ne tê de ev dewlemend li himber netewe-ya xwe -gel, çand û hunera xwe- bi qasî serdestên xwe zirar dane neteweya xwe. Ji van kêma kesên weke malbata Bedirxaniyan li hember serdestan bi her hêlî têkoşiyane û tu carî jî ji ber serdestan danexwarine û bi berdêlên gelek giran be jî tu carî hêla xwe ya welatparêzî ji dest bernedane. Malbatên weke Bedirxaniyan hebûna û diyalektîka wan nehatibûya şikêndandin teqez wê weke gelek tiştî wê hunerên şêwekarî jî ne di vê rewşa ku îro tê de ye bûya.

Di pêşneketina hunerên şêwekarî de sedemên weke ol (misilmantî) bindestî nedewletbûn û hwd. jî girîng in lê weke ku min li jor jî diyar kiribû ya herî kujer tunekirina dewlemendên me yê neteweyî ye.

Gava mirov bi tevayî li dîroka hunera dinyayê dinihêre; dibîne ku kîjan netewe be bila be, hunerên şêwekarî bi xêra dewlemendên wan ên neteweyî bi pêş ketine. Ji ber ku di taybetiya karakterê dewlemendên neteweyî de li giştî dewlemendiya xwe xwedî derketin parastin, standin, xwe pê qurekirin, xwe pê mezinkirin heye. Ev taybetmendiya feodalan in, lê kengî kapîtalîzm weke sazû-



man rûdinê wê demê dewlemendên bazirgan dewsa wan digirin û bi formên nûjentir vê mîrateya ku ji wan stendine didomînin.

Dewlemend ji ber hêlên xwe yên gewî, gewîtiyan dikan, dikarin bikin. Kesekî di berê de ne dewlemend be û dûre bi awayekî dewlemend bûbe bela ku tirs an jî psîkolojiya feqîrtiyê, bi tirs wendakirina pereyên xwe, nikare gewîtiya, bongîtiyan, quretiyan bike. Wêne û peyker kirîn karê mirovên tîr, qurê û gewiyan e.

Şertên civakî, hunerî, zanyarî li aliyekî yên hiştine ku Îtalya di hêla hunerên şewekarî de bi pêş bikeve, yên hiştine ku li Fransa, li Almanya, li Holandayê hunerên şewekarî bi pêş bikeve dewlemendên wan ên neteweyî ne. A niha dereng be jî li Tirkiyeyê jî ev mesele tê zanîn û dewlemendên wan dereng mabin jî bi lez û bez dixwazin hunermendên wan weke navên xurt derkevin û bikaribin qayîşê bi wênesaz, avahîsaz û peykersazên welatên pêşketî re bikişînin. Dixwazin tabloyên wêne-

sazên wan bi milyon dolaran bîn firotin ku kompleksên xwe yên neteweyî tîr bikin. Bi awayekî çêkirî be jî, di dilê xwe de pîr nehez- imandibin jî zorê didin xwe ku bi pereyên pîr tabloyên wênesazên xwe bistînin. Bi fen û fûtan be jî ji dewlemendên dinyayê re bêjin wa ye wêne û peykerên hunermendên me jî pere dikan, girîng in û hêja ne ku hûn jî bistînin, di koleksiyon û muzeyên xwe de bi cih bikin.

Em dizanin ku kedkar, ew luksa wan tune ye ne wêneyan bikin, ne peykerên xwe bidin çêkirin, ne avahiyên bedew bidin çêkirin û ji ber rastiya jiyana wan ne jî dikarin bifikirin. Lê dewlemendên me yên îro xwedî milyon dolaran in jî nikarin bikin. Ji ber ku ew bi tirs in û wek dewlemendên neteweyî an dewlemendekî bazirgan ê dinyayê biçin wêneyekî an peykerekî bistînin. Tirs, xof û psîkolojiya wan ku ji wan re bûye karakter nahêle bikevin nava livekê. Ev helwesta wan ku li ser kir- yarên wan bandor kiriye, psîkolojiya bindes-

tiya wan e ku di pêvajoyeke dirêj de ew bi her awayî xetimandine û ew ji çand û hunera xwe dûr xistine. Heta zimanê xwe jî hema hema êdî ji bîr kirine an jî xwestine ku ji bîr bikin. Xwe ji tirs ku pereyên xwe wenda bikin, bi destê xwe an jî bi yên serdestên xwe xwe asîmîle kirine, dikin û ji vê tirs wan î li ser karakterê wan mayînde bûye kirasên serdestên xwe li xwe dikin ku bişibin wan. Li gor baweriya wan ku ew çiqasî bişibin serdestên xwe, wê ew qasî ewle bijîn, sermiyanê wan wê ew qas ewle be. Ji ber wê tirs xwe jî tu carî li hember dewlemendiyên xwe yên çand û hunerî ew bong, gewî û qure nebûne. Xwe bi dewlemendiya xwe ya neteweyî, xwe bi axa xwe, xwe bi çand û hunera xwe qure nekirine. Bêtir bi çand-ziman- û hunera serdestên xwe xwestine xwe qure bikin, xwe bi wan şêrînokî kirine. Her dem di nava wê tirs ku rojekê serdestên wan bi wan bihesin -deşîfre bibin- bê qarekter bê çand, bê huner û bê zimanê xwe jiyane.

Ronesans her çiqas weke liveka çandî zan-yarî û entelektuelî xuya bibe jî, di bingeha wê de rola aborî, aboriya dewlemendan girîng e. Keşfên ji rojhilat tiransî rojava bûne jî dîsa heman tişt in. Welatekî bindest, welatekî ku dewlemendên wê yên neteweyî tune bin, yên bazirgan bi tirs, bi xof û bê karakter bin gelo çiqasî dikarin ji entelektuelên xwe, ji keşf û pêşketinan di jiyana xwe de bo dewlementir bibin bi cih bikin?

Ronesans bi xêra dewlemendan pêk hatiye. Gelo dewlemend neketibûna pêşbaziya hewserên ji hevdu bedewtir çêbikin, bi peykeran û wêneyan bixemilînin, wê hunermendan bi tena serê xwe çî bikira, çawa bijiyana, berhemên baştir, bedewtir wê çawa biafirandina û gelo ew ê bûbûya sedem ku huner rasterast bikeve nava jiyana wan a giştî?

Wek encam mirov dikare bêje di berbanga kapîtalîzmê de dema dewlemendên neteweyî di nava pêvajoya dîrokê de neteweyên xwe çêkirine, yên me her çiqasî hejar bin jî xwestine neteweya xwe ava bikin lê bi ser neketine. Ji ber wê rastiya me ya dîrokî jî îro weke her tiştî çareserkirin ji bilî xebat û lebatên huner-

mendan li ser pişt sazî, navend û rêxistinên me yên netewî maye. Pirsgrîkên sedsalan ku her yek divê di nava pêvajoya diyalektîka xwe de çareser bibûya, nebûye û giş civiyane ser hev, bûye barekî pir giran û ketiye stûyê wan. Ji bilî hunermendan sazî, navend û rêxistinên me ger çand, huner û li tevahiya dewlemendiyên xwe xwedî dernekevin ew ê pirsgrîkê dîsa taloq bibin û zirarên mezintir bidin tevahiya neteweyê ku netewe bi ber tunebûnê ve biçe.

b) Şah, şêx muşayîq û hunerên şewekarî

Li welatê me yek ji sedemên girîn ên pêşneketin û şûndehiştina hunerên şewekarî jî ol e. Ola îslamê di destpêkê de li himber hûnerên şewekarî tund tevgeriyaye û li gor wê demê -bela ku mirovan peyker û wêneyan bi destê xwe saz kirine û ji xwe re kirine perestgeh- û ola îslamê li himber piryezdantiyê rawestiyaye -yekyezdantî parastine- helwesta wan li gor baweriya wan mirov dikare normal jî bibîne.

Têgiha qedexê, qedexekirinê di literatura wan de guneh e. Guneh rasterast beramberî qedexeyê ye.

Guneh hesibandina wêne û peykeran -ku piştî demeke pir kin êdî hema hema li rojhilata navîn li tu heremê wateyeka wan î werê nemabe, weke pirsgrîkê ji holê rabûbe- ne bi xezeba berê be jî, di nava gel de ew pirsgrîka hîn didome. Çend mînakên ne girîng hatibin jiyîn ne tê de, tu şah, şêx an muşayîqî helwesteke tund bi qasî li hember wêne û peykerên xelkê rê dabîn, li himber wêne û peykerên xwe rê nedane.

Ya balkêş serkanan wêne û peykerên xwe, yên malbata xwe, birc, herêm, hemam, hewserên xwe bi wênesazan dane çêkirin. Weke mînak; padîşahên osmaniyan giş misilman bûn û hema hema wêneyên gişan hebûn, hene. Hinekên ji wan, wênesaz û peykersaz ji welatên ewropa an jî ji welatên din ên rojava dawetî welatê xwe kirine, beramberî zêr û pereyên pir, beramberî hewserên giranbûha û bi qedirdayineke pir mezin wênesazên wek Zanaro û hîn gelekên din wêne û peykerên

xwe, yên jin û qîzên xwe bi wan dane çêkirin. Do jî îro jî li tevahiya herêma Rojhilata Navîn, îstisna ne tê de wêneyên giştî şah, şêx û muşayîqan hebûn, hene. Fotoyên wan, posterên wan di mitîng, meş û civakan de tîn pêşandan û daleqandin.

Em Şêx Seîd, Humeynî, Qanûnî, Riza Pehlewî, Sedam Huseyn ji wêne, peyker, foto û posterên wan dinasin. Wekî din me belkî ew di xewnên xwe de jî nedîtîbin, nedidîtî.

Hîn jî di nava gelan de li himber hunerên şêwekarî reaksiyon, qedexa û guneh hesibandin, ne bi ecêba berê be jî heye. Pir hindik be jî êdî ev tîrs dişikê û wê bişikê. Qedexekirina wêne û peykeran li du xwe tahrîbatên mezin hiştîbin jî, şikestinên hov pêk anîbin jî ev şikestin hêdî hêdî dicebirin. Ev şikestin her ku bicebirin wê di van welatên ku ola îslamê diparêzin de jî hunerên şêwekarî bi pêş bikevin û bêhtir bikevin nava jiyanê gelan.

Li welatekî wek Îranê, li Iraqê, li Tirkîyayê, li Kurdistanê û gelek welatên Ereban ên wek Misrê jî tê de hema hema li her kolanê, li her avahiyên wan ên fermî sazî û dergehên wan mirov li wêne û peykeran rast tê û bêhtir jî ev ên serkanan in, ango yên şah, şêx an jî muşayîqan in.

Welatê osmaniyan hîn di demên xwe yên ku çap, çapa pirtûkan -ji sedema ku rûnê wehşan di çapxaneyan de tê bikaranîn- qedexa bû de jî padişahên wan wêneyên xwe bi taybetî jî portreyên xwe dane çêkirin. Ango ji wan û yên wek wan (şah, şêx û ji muşayîqan) re xêr ji xelkê re nexêr -guneh- bûye.

Wek encam pêşketin û rastiyan jiyanê, li zagonên nivîskî û yên nenivîskî jî guhdarî nakin. Pêşketin û rastiyan jiyanê berê zagonên nenivîskî, dûre jî yên nivîskî ji nû ve didin

nivîsandin û li hêviya guhertinên nû dimînin ku dîsa ji nû ve bînin nivîsandin.

Heta 15, 20 sal berê jî li malên me bi dîwarên odeyekê ve kê dikaribû wêneyekî daliqîne, an dikaribû peykerekî deyne qorzikekê. Bi helwestên tundrewa ev wêne dihatin çirandin, heger peyker bûya dihat şikandin -lê li van malan giştan jî

**Pêşketin
û rastiyan jiyanê,
li zagonên nivîskî û
yên nenivîskî jî guhdarî
nakin. Pêşketin û rastiyan
jiyanê berê zagonên
nivîskî, dûre jî yên nivîskî ji
nû ve didin nivîsandin û li
hêviya guhertinên nû
dimînin ku dîsa ji nû ve
bînin nivîsandin**

teqez fotoyekî mezinê malê hebû-heger qedexa li ser sûreta be tew ew foto carna di ber qewlikê Quranê de diçikandin.

Wek reaksiyon di odeyan an di cihên ku wêneyek lê hebûya limêj nedikirin. Naserifandina jî wêne berepaşkî dizivirandin, ger peyker bûya pelpotek diavêtin ser ku xuya nebe.

Çend kesên wek şaredarê Enqerê -M. Gokçek- ne tê de -ku bi wan ne xweş tê û wek aciz dibin rê bidin jî, jî pêşketin, jî rastiya jiyan û civaka xwe deng nakin, nikarin deng bikin. Belkî jî di nava xwe de yên herî pir dixwazin wêne an peykerên xwe bidin çêkirin jî ew an jî yên wek wan in. Mixabin ew û yên wek wan ne ji eşqa hunerê, hîn bêhtir ji eşqa xwe yî li hember xwe dixwazin wêne û peykerên wan li her derê hebin.

Divê bê zanîn ku bê çawa mirovek bê deng û liv nabe, ger bibe jî teqez kut, kop an lal e, ango netemam e, divê zanibin ku neteweyek, civakek jî bê deng (muzîk) bê reng (wêne) bê liv (tevger) nabe. Ger bibe jî teqez kut, kop, bêxwîn an jî lal e, ango ne temam e.

c) Bêdewletbûn û hunerên şêwekarî

Dewletbûn sazûmaneke hêzê ye. Hêzeke ku di çerçoveya -sînore- axekê de xwedî her tiştê wê bûn e. Xwediyê dewlemendiyên wê axê, xwediyê çand û hunerê giştî ye. Ji bo bikaribin wan di destê xwe de bihêlin xwe bi rêxistinî kirine. Di nava van sazî û tevgerên bingeîn û sergehîn de xwe bi rê ve birine. Sembolên xwe yên neteweyî tiştên weke al,

sirûd çêkirine ku bikaribin gel –gelên di nav wan sînoran de dijin- li ser hev bigirin, bi hevdu ve bikelişînin.

Yên di sînorê welatekî de mane di nava pêvajoya dîrokê de di hêla ehlaqî, psîkolojîk û fîzîkî jî şibiyane hevdu. Nirxên wan, ecibandin û estetîka wan bi kurtasî tiştên hez dikin û nakin şibiyane hevdu. Ango di nava vê pêvajoyê de çand û hûnereke wan derbibire afirandin e. Û ji bo biparêzin bi pêş bixin dewleta ku çêkirine xistine dewrê.

Yên di çarçoveyekê (sînorekê) de nemane, an hêzînan nehiştine bimînin gelek ji wan di nava pêvajoyê de wenda bûne. An tiştin ji xwe re kirine nirx û di nava wan nirxan de li hevdu civiyane. Wan nirxan kiriye ku weke wan gelên din wenda nebin, nemirin. Û dem bê ji bo wan nirxan li ser nigan bihêlin têkoşiyane, mirine, kuştine.

Berî sazûmana kapîtalîzmê serdestiya xwe îlan bike, anga di dem û sazûmanên feodalî de ax ne tapo û tescîl kirî ne. Kî xwedî hêz be –ji çî nijadê dibe be bila bibe- bi darê zorê, bi şûr û mertalan bi dest dixist û heta hinekên ji wan bi hêztir bihatina û bi hêzeke mezintir ew axa wan ji wan bistendina, vê carê ew ax dibû ya wan, kê ew ax stendibûya, navê wan digirt.

Di berbanga kapîtalîzmê de – bi giranî- her kesê/a xwedî hêz –yeknîjad an pîrnîjad- sînorê axekê li gor hêza xwe teng-fireh yên bi dest xistine li ser xwe tapo û tescîl kirine. Dewlemendiyên wê axê, neteweyê xwarine, kompleksên xwe yên neteweyî tîr kirine. Piştî kompleksên xwe yên neteweyî tîr an dewlemendiyên sînorên wan, ew tîr nekirine, sînor jî ji holê rakirine. Êdî yên ku tîrsa wan ji wan, ji neteweya wan, ji hejariyên wan tune bin sînorên neteweyên xwe radikîn, radikîn ku bibin xwedî dewlemendiyên dinyayê giştî.

Di dîrokê de weke her hêzê, kurdan jî xwestiyê bibin xwedî hêz, çarçoveya sînorên xwe deynin, li ser axa xwe bajarên xwe ava bikin û jiyanê serdest bijîn, axa ku li ser dijin li ser xwe tapo û tescîl bikin. Çend caran kirine jî, lê tu carî dirêj nedomiyaye. –ji ber dewlemendiyên vê axê- her dem hêzên ji wan

xurtir hatine û axa wan ji wan stendine û nehiştine sînorên xwe weke neteweyên din li ser xwe tapo û tescîl bikin.

Ji ber wê jî Kurdistan her dem bûye qada şer û ev şera bi formên nû bin jî hîn didomin. Ji ber vê rastiya jî hunerên şewekarî derbên giran xwarine. Êrîş, şer, talan, karesatan yekser nehiştine ku hunermendên wan hunerên xwe biafirînin. Avahiyên xwe ava bikin, bajarên xwe bi wêne û peykeran bixemilînin û hunerên şewekarî bikevin jiyana wan, bibe perçeyekî jiyana wan. Welatekî ku her dem weke qada şer be, nikare weke neteweyên din sazî û dezgehên (akademîdîbistan) xwe damezirîne û di çarçoveya plan û programên xwe de hunerê têxe nava jiyana gelê xwe. Ne tenê huner, raman, wêje, zan-yarî, felsefe û hwd jî.

Li Kurdistanê hîn jî ew talan berdewam e. Ya tirajîk jî dewlemendiyên wê ji bo tunekirina wê, ji bo tunekirina çand û hunera wê tî serfêkirin.

Di vê pêvajoya ku êdî sînorên neteweyan radibin de, dewleteke klasîk ji kurdan re çiqasî pêdivî ye yan ne pêdivî ye nîzanim, lê hêz, hêzeke ku bikaribe ku ji bo kurd kompleksên xwe yên neteweyî –pir dereng mabin jî- bijîn, tîr bibin. Xwe, çand û hunera xwe bikaribin pêş de bixin, bikişînin rêjeya neteweyên pêşdeketî û lazim e nemir bikin.

Divê hêzek hebe, hêzeke ku bikaribe bo çand û huner bi pêş bikeve akademî, zanko, muze, dibistan û gelek sazî û dezgehên ku vê çand û hunerê bi pêş bixin, biparêzin bi rê ve bibin hebe. Qet tune be çand û hunera xwe li ser xwe tapo û tescîl bikin.

Weke ku em di dîrokê de jiyane, avahiyên me yên ku avahîsazan damezirandine hilneweşînin, wêneyên ku hatine wêrandin, pirtûkxaneyên ku hatine damezirandin neyên şewitandin, peykerên ku hatine çêkirin neyên şikandin. Wek her dewlemendiyên me neyên dizîn, talan û wêrankirin. Di qadên navneteweyî de çand û hunera me bibe dengê me, rengê me, nasnameya me, ji ber van sedeman jî divê hêzek hebe.

Hêteke bayê zemên

Elîxan LORAN

Ji tevn û tora kîjan pelê ezmanê zenûn hatibû dariştin,
Ava heşaş ji kîjan kaviî re hatibû hiştin,
Te dilniwaziya mifteya kîjan çiyayî ligel çîpên wê bi bîr dianîn?
Ji kîjan kevîr û tehtê nimêjê re da girî,
Sal û selewatên kîjan tobekirinê bengîbûna ahd û wehdan e?

Rîwayet e, hêtûna hedêd diafiroşîya neonên *folk-rockê* dinivîne.

Keleşê girikên sîngê û lêvên ku dîkên hinaran e
Qayîş bi çendîn boçik-kêşên hêt û dîwarên koça dawîn re nekişand.
Çendîn teze bû, çendîn şerpeze. Keleş...

Teht; şûnwarê qîzê di gorê de ditehinîne, dişêlîne.

Avrêl - 2008

Lixwe(ve)gerîna sîmetrîk

Dilawer ZERAQ

Her wiha, bi vê romanê em careke dî jî hay jê dibin û fam dikin ku hevoka (an jî hevokên) ewil û destpêkî ya romanekê (an jî vegotîneke çîrokî) diyarker in di awa û şêweya xwendina wê de.

"Ez bi tikîtenê bûm."

Bi vê gotinê dest pê dike vegotina romana Neynika Dilî ya Omer Dilsoz.*

Destpêkeke bi vî rengî hemû tikûtenêtiyan ku di romanê de ketine nava hev û di nava hev de hewiyane, di xweseriya xwe de tikûtenê dihêle û nahêle ku mirov têkeve nav wê tenêtiyê (her çiqas tikûtenêti ne ew tişt û kirû ye ku bi temamî tê parvekirin jî). Ji ber vê eger û sedemê jî mirov bi hevoka pêşîn bêgav dimîne ku li derveyî romanê bimîne û xwendîneke dereke bike. Helbet ev yek ne tişteki neyînî û negatîf e.

Ji ber ku gava em pir zêde xwe di romanekê de bibînin, xuset û taybetî, çistî û tevli-vîn, aktîvî û pasîfî, başî û xerabiya lehengê/î bişîbînin xwe (an jî ew bişibe me), dê xwendîna me ne xwendîneke objektîf be; em çî jî bikin, em ê nikaribin bi çavekî zelal û objektîf parçe û beş û hest û tevgerên lehengan ên negatîf (an jî zêde pozîtîf û hatî îdealîzekirin) bibînin. Û vegotina wê romanê çî qas serketî be jî, dê ji karakteran bêpar û mehrûm bimîne û bes wê bibe vegotîneke ku ji gelek rûpelan pêk hatiye.

Her wiha, bi vê romanê em careke dî jî hay jê dibin û fam dikin ku hevoka (an jî hevokên) ewil û destpêkî ya romanekê (an jî vegotîneke çîrokî) diyarker in di awa û şêweya xwendina wê de.

Di romana Neynika Dilî de, vebêjer û le-

hengê sereke Mustefa, tim li ber neynikê ye (neynik carinan dibe awêne; lê belê, lênêrîn û têtîliya bi neynik û awêneyê re naguhere) û pê re diaxive.

Û leheng di romanê de bi van gotinan dest bi axaftina xwe ya bi neynika xwe re dike: *"Awêneya min a spehîtirîn; çima min wisa xuya dikir, te digot qey ji bîwareke dî ya gerdûnê hatiye? Çima rûyê min wisa xuya dikir, te digot qey di bin barekî giran de felişiyaye? Ez li ber kîjan teql û verêjên jiyanê ketibûm; min xwe ji te dipirsî: Neynika min ez kî bûm? "*

Mustefa bi axaftina bi neynika xwe re, dikeve nav lêgerîna 'kîbûna xwe' û pirs û awir-sên lêgerînî ji xwe û ji neynikê dike. Helbet ev rê û rêbaz û hewldan jê re dibe riya parçeki-rina wêneyê tikûtenêtiyê ku mirov pê ji qad û biwara 'nekesbûnê' derbasî qad û biwara 'kesbûnê' dibe.

Û bi hevoka, *"Li ber xwedîkê gava ku min li xwe dînihêrî, ez pê dihesiyam ku dest û lingên min dilerizin. Ez gelekî bi kelecana bûm û ji welatekî dûr hatibûm. Ji bo dîtina Bîşenga hewşa dilê xwe..."* berê xwe dide Bîşenga delala xwe û diçe dîtina wê. Ji ber ku dê pêvajoya 'kesbûnê' bi dîtina û hestpêkirina Bîşengê dest pê bike; yanê bi evînê; yanê bi navê xwe yî dî; 'neynika dilî'. Bi hevgihana wan dê evîn watedartir û bera-yîntir bibe û 'kesbûn' bibe pêvajoyeke domdar. Û nivîskar vê pêvajoyê wekî 'hewşa dil' bi nav dike ku hewş di jiyana me kurdan de cî û qada bêhnvekirinê ye.

Her wiha, honaka vegotin û çîrokiya romanê li ser mal û malbata lehengî, li ser malbata Mustefa ava bûye. Leheng tim ji bajarekî dûr tê; carinan ji bo dîtina û hevgihana evîna xwe ya Bîşeng, carinan ji bo dîtina malbata xwe; dê û bav û xwişk û bira û xal û ap û pismamên xwe...

Ji bo pevgerîdana vê yekê jî; vebêjer her cara ku xwestiye ji jêrhonakekê derbasî jêrhonaka dîtir bibe, 'neynika dilî' û axaftina xwe ya pê re, ji xwe re kiriye pêlik û derbasî qada vegotî-neke dîtir bûye.

Helbet dubarekirina hin peyv û hevok, şayes û beşên dem û demsalan (ên wekî; erê neynika min, berf dibariya, payîz bû, roj li nîvro bû...) ku di van derbasbûnan de derdikevin pêş me, her çi qas ji bo vegotinê wekî kêmasî xuya bikin jî, ji bo ku xwîner xwe di nav 'demên winda' de hîs neke û belasebeb nekeve dû wan deman û ji xwendinê sar nebe, ji aliyê nivîskêr ve bi hayjêbûnî hatiye bicîkirin (ji ber ku ew dem, demên lehengî yên windabûyî ne ku lê digere, da ku 'kesbûnê' bi dest bixe).

Her wiha, tevî ku nivîskarê romanê hewlê dide ku vegotîneke 'bajarî' ava bike û zimanê kurdî bike şînasê hin qad û biwar û dîsîplînan jî, hem di hin taswîr û şayesan de ev yek pêk nayê û hem jî ji ber ku honak û bûyer û çîroka esasî û bingeîn a romanê li ser jiyan û têkiliyên gund(iyane) ye, du awa û şeweyên vegotinê li hev kumişîne û vegotinê hin tişt ji zelaliya xwe winda kirine û fetisandî maye.

Min divê ez vê jî bêjim ku; wekî diyarkirin û bijartina cîûwar û mekanan û binavkirina kes û leheng û endamên romanê yên wekî gundê Xan, Ehmed û Tajdîn, bibîrxistin û

xweşpesniyek pêk hatiye ku piştî xwe dispêre Xaniyê Nemir û şahesera wî ya Mem û Zîn. Em bi binavkirina birayê leheng a wekî Ehmedê ji gundê Xanê û ajandaya gewr (Mem û Zîn) ku piştî çûna Ehmed a çiya wekî emanet jê maye, bi vê yekê dihisin. Her wiha, ev bibîrxistin di nav çîrokiya honakê de bi awayekî dî jî derdikeve pêş me; Ehmed û Tajdîn ew leheng in ku tu dibêji qey ji Mem û Zîn' a Xanî derketine, bêtî ku tiştek ji taybetiyên xwe yên dildarî û bengîtiyê bixwin, wekî (dij)lehengek hatine ketine nav romanê û bûne birayê lehengê ku li ber 'neynika dilî' li 'kesbûna xwe' digere. Û leheng jî Mem bi xwe ye ku 'kesbûna' wî ancax dikare bi ketina nav evîne (yanê neynika dilî) pêk were. Ma ne Xanî jî lehengê Xanî, Mem jî, ji bo ku îxanetê li 'kesbûna' xwe neke û xwe winda û tune neke, riyeke dîtir hîlbijart, xwe di 'behra evîne' de 'bê-evîn hişt' û bû lehengekî nemir.

Di çîrokiya romanê de; êş û zehmetî û qehr û ezab û pevçûn û jihevçûn û şer û (ne)aşî û xinizî û si-xûrî û evînî û dilreşî û bextreşî û

bêbextî û zikreşî û perwerî û dilqewînî û tirs û sawa ji serdestiya hundirîn û ya dereke, kêfşikîn, xwisî di qirik de mayîn, sêwî û belengaz mayîn, şîn û behî danîn û dîlan û dawet gerandin ku di jiyana kurdan de ketine nav hev wekî rewş û kawdanên asayî û normal derkevin pêş me; ji ber ku rewşeke ji van rewşan hema ji nişkê ve jî pêk were jî em pê naheyirin.

Hêmaneke girîng a honak û vegotina romanê heye; -her çi qas yek ji endameke bivênevê ya tevahiya nîrx û hêjahiyên mirovane ye jî-, ji ber ku gava pêk tê dibe sedem ku jiyan û dinya tim biheje, em bi temamî nikarin wê qebûl bikin; ew hêman, kirûya 'xerabî' ye. Belê xerabî, xerabiya beloq ku her wekî Geor-



ges Batallie jî dibêje, “Xerabî jê re sinc û exlaqekî bilind divê”. **

Xerabî di romanê de di kesayetiya Saloyê Keşkanî û bi vê çirokiyê derdikeve pêş me: Saloyê Keşkanî cerdevan e; ew pêşiyê bavê Mustefê dide kuştin, dûre şopa Ehmedê birayê wî digêrîne û Ehmed ji bo ku bi destê wî neyê kuştin tevî ku bi zewac û xweyî zarok e jî, berê xwe dide çiyê û car dî wekî şervan li dora gundê xwe bi riya cerdevanan tê kuştin, dûre Mustefa dev ji lêgerîna ‘kesbûna’ xwe berdide û îcar ji bo ku wînda bibe berê xwe dide bajarê mezin, dûre bi carekê re vedigere û dibe mêvanê gazînekirî yê dîlana xwişka xwe û bi sergêjiyekê fam dike ku ew dane Saloyê Keşkanî, dûre ew û xalê wî Ferzende biryarê didin ku Saloyê Keşkanî zavayê xwe bikujin (ji bo tolhildanê, ji bo ku neyê famkirin ku wan li şûna serîrakinê serşorî qebûl kiriye, ji bo heqnemîniyê, ji bo hêskirina dîl), dûre bi kemîndanînê di tariya şevê de Saloyê Keşkanî bi dest dixin, dûre bi lêdanê canê wî dikutin û eyarê wî nerm dikin û pê re jî çî gotinên li ser pênasikirina xerabiya wî kirî bi gotinên wekî, “Kuro tûlê ji tûlikan veketî, Saloyê xayîn, tu van çiyayan dibînî; eve hemû warê min in. Eve axa min û bavê min e. Eve welatê min e. Ji bilî kuştina min çu kes nikare min ji vî welatî derxe! Tu dibihîzî, kurê dêhlê, bîjiyê bînteraşan, seyê fêşika seyî, te hay ji min e; çu hêz nikare min ji vî welatî derxe!” heye jê re dibêjin û piştî ku Saloyê Keşkanî sedem û bingeha xerabiya wî kirî bêrarûtî, bi gewrîrastî û aşkera ji wan re dibêje, “Gundê we avîn û xweş bû, zîlamên we mêrçak û baş bûn, jinên we wekî xatûnan bûn; qesrên we hebûn, lê em veder bûn, çu tiştê me nebû, çavên me her tim li ber destên we bûn; heke hewe kûteke ji ber we mayî bidaya me bo me wisa bû, heçko dinya bûbûya ya me. We keçên me yên herî spehî û delal ji jinên xwe re bo serhewî dibirin û wekî qerwaş û xidam didane şolê. Erê xalê Feqî, ez bêbextiyan nakim, wekî dîtir ji bo nav alemê we em diparastin, ji ber we me jî di nav xelkî de rû û rûmet didît. Lê bawer bike, di dilê her keşkaniyekî de serjêstendina xaniyekî hebû. Bawer bike Mustefa, heke tu ji keşkaniyekî re bêjî kerem ke tu dixwazî bibî qeymeqamê

dewletê, an jî bibî çawişekî li ser serê xaniyekî; yê Keşkanî bêtexsîr dê çawişî qebûl bikira.”, û efûkirinê ji wan dixwaze, îcar xerabiya hatî kirin ji ‘xerabiya bi sinc û exlaq’ dûr dikeve û dibe wekî sûcekî ku dikare têkeve ber efûyê. Her wiha rehma mirovane û dilşewatiya ji ber lêzimiye dikeve dilê Mustefa û xwarziyê wî yê ku dê çend roj şûnde ji diya xwe re çêbibe tê bîrê, bi gotinên, “Here! Nanekî bixwe, yekê bi xêra mindalê xwe yê ku hûn çavê ne, bide. Malneket, bila Xwedê ji te bistîne!”, Saloyê Keşkanî efû û azad dike.

Û bi efûkirina Saloyê Keşkanî nivîskar tercîha xwe ji aliyê başî û qencyê ve dike, her wekî Georges Batallie jî gotiye, “Xerabî ancax bi geşiya şewqa başiyê dikare were famkirin”, bala me dibe ser hêz û hêzdariya ku li ser navê ‘başî û qencyê’ tevdiagerin û xerabiyê fit dikin.

Digel vê yekê jî ez dişem bibêjim ku vê efûkirinê nehiştiye ku Saloyê Keşkanî bibe karakterekî xurt ê romanê; belê nivîskêr tenê peywira ‘kesê xerab’ lê bar kiriye û ew kiriye yek ji kevîrê îsilê yê romanê.

Min divê ez vê bibêjim ku Omer Dilsoz yek ji wan nivîskaran e ku bi roman û nivîs û berhemen xwe ve, gelek peyv û gotin û qalib û biwêjen kurdî yên xweser û orjînal dixwe nav wêje û nivîsbariya kurdî û reng û dirûvekî dîtir dide vê qad û biwarê.

Romana ‘Neynika Dilî’, hewla ‘kesbûn’ ê ye û ji bo ‘xwebûniyê’ lêgerînek e. Di vê hewl û lêgerînê de, em jî car caran bi leheng Mustefa re di ‘neynika dilî’ de rûbarê hev dibin û mesafe û dûrahiya di navbera xwe û xwe’ ya ku di neynikê de bi awayekî sîmetrîk li me vedigere de diçin û tên.

* Neynika Dilî, Omer Dilsoz, Roman, Weşanên Aram, 2009, Diyarbekir.

** Wêje û Xerabî, Georges Batallie, Vekolîn, Weşanên Ayrıntı, 1997, Stenbol

“An kew e an xew e”*

Selîm BEREKAT

Kew e,
Zemîn diçe
Kewek di asoyê de dimîne.
Kew e
Aso diçe
Kewek di sirûdê de dimîne;
Kew e;
Asoya me Kew e
Sîbera me Kew e
Destpêka peyvê Kew e
Peyva me kew e

* *Gotina pêşiyên*

Dosye:
Amadekar: *Serwet DENÎZ*

Dosye:

Di wêjeya devkî de raz û sembol



Şaristanî
Ronî WAR

Di wêje ya kurdan a devkî de raz û sembol
Mihemed RONAÎ

Di gotinên devkî de hişmendiya gel
Dilxwaz Herdem

Di çîrokên gelêrî de raz û nîşaneyên berbiçav
Azad ZAL

Hîmên wêjeyê
Feratê DENGIZÎ

Ji aliyê perwerdehiyê ve wêjeya devkî
Serwet DENÎZ

Destpêk

Xwendevanên hêja di vê hejmarê de me xwest ku em li ser raz û sembolên wêjeya me ya devkî bisekinin. Bi vê armancê me ji çend hêlan ve mijar girt dest û bi qasî cih û dema xwe me vekola. Lê li gor berfirehiya mijarê dosyeya me pir teng e. Ne pêkan e ku mirov tevahiya vê mijarê di çarçoveya dosyeyeke kovarê de binirxîne. Wek ku me di dosyayên xwe yên berê de jî diyar kiribû tiştê ku em dikin destpêka mijarê an jî balkişandinek e. Ya na bi tevahî û ji her hêlê ve nirxandin nîn e.

Çima me ev mijar hilbijart? Bi baweriya me wêjeya me ya devkî paşxaneya hişmendiya gelê kurd e. Bi qasî ku êş û kul û derdên xwe bi vê rêyê vegotine an jî bûyerên ku qewimîne ragihandine ji vê zêdetir awayê nêzikbûna bûyeran, nêrîna li jiyan û cîhanê, têkiliyên bi hilberînê re, têkiliyên bi der û dorê re -çi aborî çi jî wekî din, têkiliyên bi gelên cîran re, nêzikahî û ramanên der barê wan de, şopên têkiliyên di navbera wan de jî vedibêjin. Bermahiyên bîr û baweriyên kevnare ji bo me radigihîne. Der barê pêkhatin û veguherîna avaniya derûniya civaka me de agahiyan dide. Bi kinasî der barê çi tiştên têkil-darî jiyana civakî bin de me agahdar dike. Her beşeke zanistên civakî dikare ji bo xwe ji berhemên wêjeya devkî hin alav û amûran bi dest bixe. Û ji bo fêmkirina ji civakê bi kar bîne.

Rast e ev ji bo her civakê wiha ye lê ji bo kurdan girîngtir e. Çima? Berhemên me yên nivîskî kêman in. Yên ku hebûne jî bi piranî hatine talankirin şewitandin. Ji wan pir hindik gihîştine îro. Yên ku mane îro jî ne di destê me de ne bûne xemla muzexaneyên xelkê. Çavkaniyên ku em serî lê didin bi piranî ji aliyê biyaniyan ve hatine nivîsandin. Me bi xwe dîroka xwe nenivîsandîye. Ev yek ji bo avabûn an jî avakirina hişmendiya netewî xetereya herî mezin e. Berhemên nivîskî yên heyî jî yên serdema piştî îslamê ne. Beriya îslamê çi hebû çi tune bû em zêde nizanin. Ev rewş girîngiya wêjeya devkî zêdetir dike.

Raz û sembolên wêjeya me ya devkî ji bo paşxaneya hişmendiya civaka me dikarin ji me re bibin alîkar. Em dikarin bi alîkariya wan hinek tiştan fêm bikin. Lê em nikarin wek dermanê her derdî lê binihêrin. Bi nêzikahiyeke wisa em ê bi ser nekevin ji ber vê yekê bi qasî giraniya wê divê em cî bidinê û bi qasî kêrhatina wê ji xwe re bikin bingeş. Ev yek ji bo wêjeya nûjen jî derbasdar e û ji bo lêkolîn û xebatên wekî din jî derbasdar e.

Me ev dosye bi van bîr û baweriyên amade kir û em pêşkêşî we dikin. Em hêvîdar in ku hûn ê pê kêfxweş bibin û wê bi kêrî we bê.

Folklor; avzêmka şaristaniyê, bendera çand û ziman e. Ziman, çand û şaristanî him ruh him jî rûyê mirov in. Hundir û derveyê xwediyê xwe rê didin. Ziman, wêje, çand, pêsketinên zanistî û derketina disîplinên ku hene tevde ji afirîneriya însên zane. Ev jî ji ber hewcedariyên mirov

Şaristanî

RonîWAR

Wexta ku mirov bixwaze wêjeya devkî fêm bike û binhişê civakê bikole û xwe bera bîra civakê bide, mirov ê bibîne ku şaristanî dikêlime, zimanekî şaristaniyê heye ku xwe bi destê her kesî/ê ve bernade

derketine. Mirov tim li tiştê baş û xweş geriyaye. Tim li tişteki nûh û çêtir geriyaye. Loma mirov dikare bibêje hêlek însên jî di heyvanê lêgerînê de hatiye dakirin û heyata xwe bi vî hawayî didomîne. Bi saya vê lêgerînê bi demê re çav-vekirî û zane bûye, bi vî hawayî jî asasê şaristaniyê avêtiye.

Di vê pêvajoya şaristaniyê de ziman û wêje ciyekî girîng digire.

Wexta ku mirov bixwaze wêjeya devkî fêm bike û binhişê civakê bikole û xwe bera bîra civakê bide, mirov ê bibîne ku şaristanî dikêlime. Zimanekî şaristaniyê heye ku xwe bi destê her kesî/ê ve bernade. Heger ku we jî zimanê hevdu fêm kir, şaristanî dest pê dike serpêhatiya xwe jî te re dilorîne, mîna bayê xerbî ku di êvareke havînê de mirov jî tîn û germa havînê diparêze te radipêçe. Erê, gava ku mirov dixwaze bendera folklorê li ba bike û jê mahsûlên xwe hilîne zimanê şaristaniyê digere û jî te re qala xwe dike. Tu nema dixwazî xwe tevbidî û tu guhê xwe didiyê. Tu xweş fêm dikî ku ew çîroka balkêş û hêja ya ku tu lê digeriyayî xwe bi ruhê te ve berdide.

Tiştên ku tu dibînî yek jê jî ev e; Ji roja ewil de însên xwestiye fêm bike û xwe bide fêmkirin. Ji bo vêya jî ziman xebitandine. Xwe avêtine bextê peyv û gotinê. Bi saya peyv û gotinê derbûne; hêvî û xemên xwe, xewn û xeyalên xwe, tirs û daxwazên xwe anîne ziman. Hest, xeyal û ramanên xwe gotine û

yên kesên din jî guhdar kirine. Carinan li cot, li palehiyê, şixrê û gêrê, betilandin û aciziya laş û ruhê xwe li peyvê bar kirine û bêhna wan hatiye ber wan û hêza wan ya xebatê zêdetir bûye. Dil girtine. Xwestine dilê xwe jî dildarên xwe re vekin û carinan jî dildaran avêtine ber hev gilî û gazine xwe, hêvî û xemên xwe, hezkirin û astengiyên li ber xwe jî hev re gotine. Li ser meytê fêrisekî li xwe xistine û qala wî kirine; Mêraniya wî, bermiradiya wî û hêviya însên a ku bi wî ve girêdayî ye anîne ziman. Xwestine qala lehengê şer û cengên giran bikin, pesnê wan bidin, bi vî hawayî xwestine navên wan lehangên li dinyayê belav bikin da ku neyên jibîrkirin. Carinan xwestine zilma axayan, neheqiya mîr, derewên melê, bêbextiya nas û hevalan, xerabiya maliyan bi saya lehangên bide rûyê wan û pê der bûne. Carinan jî ji bo ku wextê bibihurînê jî hevdu tişt pirsîne, qerf û henek bi hev kirine.

Vana tevde bûne bendera ziman, wêje û çandê. Dûre bûne destan, çîrok, meselok, ef-sane, heyranok, kilam, pêkenok... Tu dibînî ku tevde jî kaniya heyatê zane. Ji kaniya heyatê û rastiya civakê herikîne. Jêderka wan, bûyerên qewimî, serpêhatî û tecrûbe ne. Ew di xewn û xeyalan de dakirine, di hest, mêjî û ruh de meyandine, di ziman de hûnandine û derxistine ortê. Nav li ser e, bi devkî hatine gotin. Di civakê de mêranî, şer, lihevhatin, cihê dê û bav, ê mezinan, cihê jinê û yê mêr,

dilketin, xwestina jinê, zewac, cihêbûn, hevdu berdan, mirin, şuştin, veşartin, şûn û tiştên ji bo yên mirî tîn kirin. Şertên hevaltiyê, yên mervantiyê, yên şîrîkantiyê, yên cîrantiyê, yên ewladiyê û jin û mêrtiyê... Adetên civakê û pîvanên wê tevde di wêjeya devkî de bi awayekî tîn gotin. Kesên ku lê guhdar dikin, jê digirin û di heyata xwe de tînin cih.

Dûre kesên ku ev hûnandine, li hev anîne û bi huner û hêza peyvê barê gotinê hilgirtine ser milên xwe derketine ortê. Van hosteyên gotinê pir caran heyirîne peyvê çawa bigerînin û bigihînin kesên hemberî xwe ku lê guhdar dike. Li gorî asta guhdarên xwe, kesayeta wan û zanîna wan tevgeriyane. Tiştên ku nikarin rasterast û serbest bînin ziman, bi rêya şîfre, sembol û motîfan gotine. Wek xeyalek be, wek li dereke din qewimî be û wek derewek be hatiye gotin. Bi vî awayî neyîniyên ku hene anîne ziman. Gotine, "Dîwaro min ji te re got bûkê tu fêm bike!" Wexta ku hostayên gotinê ev zimanê veşartî xebitandine bi qasî ku tirsîyane zimanê wan bibe emelê serê wan û zirar bigihîje wan ew qasî jî ketine xema ku zanîna zêde li hin kesên qels bar bikin. Wekî din jî tirsîyane ku kesên ne erbab bibin xwediyê xwe û hin zanînan ku divê nekeve destên wan loma jî li sînorên gotina nepen xistine û dane nav erda dinyayeke din.

Em îcar werin ser vegotinên bi raz, sembol û motîf ên di wêjeya devkî de. Bi qasî ku tê bîra min hin jê ev in: Agir, roj, ronî, çira, bîr, hût, ziha, pîrebok, beranê reş û yê spî, heft tebeqe bin erdê, legleg, pepûk, çêlek, gur, rêvî, hîrc, kund, xezal, hinar, kanî û av, hespê ba û baranê, kevok, kewa gozel, teyrê baz, tîremarê di şerbik de, hehecik, ferê destêr, bazirganî, çil siwar û çil keleş, heft bira, morîka xewê...

Motîf, raz û sembolên her çandê dirûvê dinyaya xwediyê xwe rê mirov didin. Wexta ku mirov lê dinêre tavilê ev xwe dide dest; sembol û razên ku hene tevde ji xwezaya welatê xwe û baweriyên ku li ser erda wî/ê demekê bandor kirine afirîne. Mirov dikare bibêje bandora cîran û kesên ku hatine çendakî bûne xwediyê wê axê jî bi awayekî şopa

xwe hiştine.

1-Xezal: Bedewbûn û narîniyê tîne bîra mirov. Delalîbûnê rê dide. Ji mirov direve. Kesê/a ku bi dû xwe dixê perîşan dike. Li derên xalî dijîn. Eşq û yar e. Carinan bi derbekê re derdikeve ortê û rê şanî mirovan dide. Bi derbekê re wenda dibe. Leheng çav lê dikeve, dide pey wê û dibe xwediyê xwe û serpêhatîyeke balkêş. Ji binê postê wê keç derdikeve. Loma seydvana şopa wê digerîne û li dû wê dihere. Ji bo qismetê mirov jî Xezalê rê didin û dibêjin, "ji xezalê bezatir tune ye lê ji xeynî qismetê xwe tiştêkî din naxwe."

2-Porkur: Cezayê qebahetê ye, nîşana belayê ye ku bi ser de hatiye. Çimkî kesên ku belayên giran bi serê wan û malbata wan de hatibin porê xwe kur kirine. Jin porê xwe kur dikin. Peyva porkurê bêçaretîyê, belayeke giran, qewimîneke xerab, xem û reşgirêdanê tîne bîra mirov. Ji namûsê tê. Derketina porkuriyê jî adet û baweriyên ku gava di zewacê de keç 'ne qîz be' porê wê tê kurkirin û bi ser mala bavê wê de tê şandin, derketiye. Mala bavê wê jî xweliyê li serê wê dikin, erdê dikolin û wê diricimînin. Xwelîser jî di heman wateyê de tê xebitandin. Lê dûre xwelîser hebekî nerm bûye, mîna bêkêr, nebaş û rezîl hatiye xebitandin.

3-Pepûk: Belengazî, bêçarî û poşmaniyê tîne bîra mirov. Bêkesî ye. Nifira ku mirov ji kerba li xwe dike. Çimkî ew jî ji çîroka xweh û birayên ku sêwiyê ber destê ap û amojnê ne derketiye. Xweh û bira diherin kerengan. Xweh kerengan radike û dide birayê xwe. Bira jî kerengan digire û diavêje tûrikê li pişta xwe. Êvarî wextê vegera malê tê, xweh dinihêre ku tûrik vala ye, hêrs dibe û xulç di zikê birayê xwe re dike û wî dukuje. Lê keçikê ne xwestiye birayê xwe bikuje. Dûre dinêre ku tûrik qul e, birayê wê nexwarine û kereng jê weşiyane, nifirê li xwe dike û ji Xwedê dixwaze ku wê bike pepûk û her û her bibêje, "pepûk pepûk pepûk."

4-Kanî û ziha: Ev motîfa çîrokan jî têra xwe tijî wate ye. Wateya av û kaniyê heyat e. Ziha ew kesê ku hatiye di devê ava kanîkê de rûniştîye û nahêle av biherike. Ku av neherike



û bimiçiqe heyatê jî ji tîna û bêaviyê ziwa bibe. Wateya wê ev e ku ziha hatiye dest daniye ser heyata kesên ku hewcedariya wan bi wê kaniyê û wê avê heye. Li gorî ku hatiye di herka avê de sekiniye û nahêle av biherike heyata yên ku ji wê kaniyê avê vedixwin di destê wî de ye. Bi vî awayî jî temsîla serdestiyê, zordestiyê û dagirkeriyê ye.

Ji bona ku avê berde jî berdêlê dixwaze. Xwestina wî jî ne xwestineke biçûk û ji rêzê ye. Canekî nazik û ciwan ku temsîla pak û paqijiyê dike dixwaze. Bi şertê ku carê keçekê ji bo ku ew bixwe bidinê, heftê carekê avê ji şênîyên wî welatî re berdide. Berdêleke pir giran e. Wateya keçê pakî ye, pêşeroj û heyat e. Ji hêla din ve jî di çanda me de tim keç wek ‘ziyaretê’ tê binavkirin. Pîroz û guneh e, xerabî û nebaşî dîrî wê ne. Ji bo ku şênîyên wî welatî nemirin av lazim e û ji bo avê jî divê ji nîrxên xwe bi dûr bikevin. Bêrûmetî, kirasê tevgerike ketî li hêlekê ye û heyat li hêla din e. Yan heyat û ketin, an jî bi berxwedanî serfirazî û heyat e.

Di dawiyê de lehengek derdikeve û wî welatî ji wî zihayî rizgar dike. Wateya şerê wî

lehengî ev e; lephilanîn û berxwedanî fereca xêrê ye. Ji nîrxên xwe dûrketin; bêrûmetî û mirin e.

5-Beranê reş û yê spî: Beranê reş û yê spî di binê bîrê de li hev dixin. Qirpîna qiloçên wan e. Divê Mîr Mihemed xwe çeng bike ser piştaya yekî ji wan. Lê çawa? Di cihê xwe de nasekinin û di şer de ne. Divê şaşıyakê neke. Ji bo ku karibe derkeve jor û bi rûqalê dinyayê bikeve divê xwe çeng bike ser piştaya beranê spî ku bi qiloçan dihere beranê reş. Lê divê li xwe miqate be. Çimkî her du di şer de ne ku bi şaşı xwe çeng bike ser piştaya yê reş ew ê heft tebeqe bi binê erdê de here. Beranê reş û yê spî bi qiloçan li hev dixin û Mîr Mihemed çima bi şaşı xwe çeng nake ser piştaya beranê reş. Tu li ku û heft tebeqe jêrî erdê li ku, dadikeve û tê jêr...

Reş û spî; ronî û tarî, roj û şev; xweşî û nexweşî; rastî û nerastî; hebûn û tunebûn; mirin û jiyan; mêranî û newêrekî; başî û xerabî hîn mirov dikare pir li vana zêde bike. Beranê reş û yê spî rê dide ku hevîrê mirov bi her xisletên ku hene hatiye stran û heyvankirin. Di ruhê mirov de; di fitrata mirov de her xislet heye. Li hember hev in û wek beranê reş û spî di têkoşînekê de ne li ber hev didin, kîjan ji wan bi ser bikeve mirov di wê hêlê de bi ser dikeve. Divê mirov li xwe miqate be çimkî her du hêlên mirov tim bi hev re têkoşîne dikin ku mirov bêhemdî xwe gavekê biavêje dibe ku poşmaniya wê û vegera wê bi berdêlinî pir giran be.

6-Tîremar: Tîremar timî di şerbikekî de ye û bi xayintî tê xwe ji devê şerbik bera qirîk û gewriya keçika reben dide. Keçik di binê barê piştîyê xwe de ji hal de ketî ye. Tî ye û di xwêdanê de maye! Dêmarîya wê tê şerbikê ku tîremar bera hundirê wî daye dirêjî wê rebena Xwedê dike. Û çima ji nezanî, ji tîna û bi dilekî pak ji destê dêmarîya xwe avê venaxwe! Tîremar qirîka wê dişewitîne û xwe bera hundirê wê dide. Dêmarî dibêje, “qey qirşîkek e xeman nexwe!” Lê bi demê re zikê keçikê diwerime û serê bav û birayên xwe di nav xelkê de bera ber wan dide!

Tîremar neyarê biçûk e. Xerabiyên biçûk in

ku bi demê re li hev zêde dibin û dibin sebeba canê şêrîn û bêguneh. Çêlikên maran jî bi jahr in. Xerabiyên biçûk dikin ku bi demê re mirov bibin mirinê. Derew û paşgotiniyên biçûk hergî wext dibihure mirov jî çavên derdorê dixin û di çavên wan de nebaş rê dide. Belehq negotine, “tu sed carî jî yekî re bibêjî dîn ew ê bibêje qey birastî dîn e.” Çawa mar bi mirov vedide û dike ku mirov jî kîsê xwe here derew, fen û fûtên xêrnexwazan jî dikin ku bibin emelê serê mirov loma gereke mirov li xwe miqate be û hay ji xwe hebe. Bav û birayên mirov jî divê haya wan ji tiştên wilo hebin û heta ku rastî li rastiye negere divê biryara dawîn nedin û çavên xwe kor nekin. Berî her tiştî divê lê bipirse, lê guhdar bike û dûre qerarekê bide yan na dibe ku ew jî bibin şîrîkê neheqiyê wek ya dêmariyê.

7-Ferê destarê: Mîr Mihemed li dûrî her du birayên xwe rûdinê û şûrê xwe tûj dike. Xew neketiye çavan. Ji wê de şewqek, roniyek xuyanî dibe. Hergî nêzikiyê li wî dike dibe

wek du tasên vêketî û tîn. Ev çavên hût in. Tûyî devê her du birayên wî yên raketine dike û ber bi wî ve tê. Birayên Mîr Mihemed dîn û har dibin û bi hev dikevin. Hût û Mîr Mihemed xwe li ber hev xweş dikin. Dora ewil a hût e. Mîr Mihemed dora ewil daye wî. Hût ferê destarê di destê xwe de li hewa zîz dike û diavêje Mîr Mihemed. Mîr Mihemed xwe datîne û ferê destarê divirvire dihere li wî aliyê dikeve. Mîr Mihemed bang li hût dike û dibêje, “ya hût îcar dor ne dora min e?” Hût dibêje, “Erê, dor a te ye!” Mîr Mihemed şûrê xwe diavêje stûyê hût û bi yek derbê re serê wî ji laşê wî dike û diavêje dera hanê. Serê hût bang li Mîr Mihemed dike û dibêje, “derbeke dîn jî Mîr Mihemed!” Mîr Mihemed dibêje, “Na! Qewlê mala bavê min derbek e!”

Ferê destarê çek û sîleha hût e. Destar jî nîşaneyê çandiniyê ye. Ê ez ne şaş bim dîsa xwestine bibêjin, ‘hebûn ango çandinî jî di destên xurtan û neheqan de ye.’ Hût ew kes e ku ji nedîtî ve tê neheqiyê û çavsoyîyê dike.



Çimkî sînor ji wan re tune ye. Destar jî ji xwezaya Mezopotamyayê derketiye û ketiye nav çîrokên me.

8-Hejmar pir hatine xebitandin: Wek ku tê zanîn bawerî bi her awayî heyata mirov dixin bin bandorê. Mirov tesîra bawerî û olên ku hene û şopa yên ku berê hebûn bi qasî ku di hemû hêlên mirov û heyata wan de dibînin di ziman û wêjeyê de jî bi awayekî aşkere dibîne. Di folklora her gelî de ev heye û gelek caran tesîr li dora xwe jî kirine. Hin hejmar jî hene ku baweriyên olî bandor li wan kirine reng û kirasê wan guherîne û bi mohra xwe ew kirine malê xwe. Kengî ku ew tîne gotin wek sembol tiştinên din bi guhdaran re ava dîkin. Em werin ser van hejmarên ku di wêjeya me ya devkî de zêde hatine xebitandin. Hejmara yekê, sisê, heft û çilî pir hatiye xebitandin.

Yek: Bi vî awayî hatiye xebitandin: Lawekî wezîr, lawekî mîr, lawekî pîrê, xweheke heft birayan...

Yek, tenêti û delalîbûnê bi xwe re tîne bîra mirov. Ji bo tevna çîrokê û balkişandina guhdaran girîng e. Lê yek, hejmarek Xwedayî ye. Çimkî li gor baweriyên Xwedê yek e. Loma gava ku hejmara yekê tê gotin dibêjin, “yeeek, Xwedê yek.” Ji hêla din ve jî tenê Xwedê dikare tenêtiyê rake û hewcedariya wî ji kesî tune ye. Bi tena serê xwe ye. Yek e.

Sisê: Vê hejmarê jî wilo cih girtiye: Sê bira, sê lawên paşê, sê qîzên paşê, sê qîzên hût, sê qîzên binê bîrê, sê kûrmikên ruh, sê rê...

Sisê jî çêbûna mirov û heta mirina mirov temsîl dike. Zayîn, jiyan û mirin. Zikê dê, ji dayikê veqetîn; çavên xwe li dinyayê vekirin û mirin ango axîretê tîne bîra mirov. Bi awayekî her sê merhaleyên ku hemû mirov tê re dibihurin dibêje.

Heft: Hejmara heftan jî bi vî awayî derbas dibe: Heft bira, heft tebeqe binê erdê û ser erdê, heft sal, heft roj û heft şevan dawet, qewlê heft nan û heft beranan, heft gund, hûtê heft ruh, hûtê heft serî, zihayê heft serî, li mîrata heftan gerîn...

Heft roj in, mirov bi heft bavê xwe tê nasîn,

mîrata mirov heta bavê heftan dihere, heft qat û tebeqeyên dinyê hene, Xwedê di şeş rojan de alem afirandiye û roja heftan bêhna xwe berdaye loma hejmara heftan pîroz e. Wek ku tê dîtin ev hejmar jî ji çand û baweriyên renekî, ruhekî û dirûvekî din girtiye.

Çil: Çil keleş, çil siwarî, çil kanî, çil tas av, çil bar zêr, çil horî, çil qîz, çil ode...

Sala çilî nimûneya kamilbûnê ye. Umrê pêxemberiyê ye. Hz. Muhamed di çilsaliya xwe de bûye pêxember. Hz. Mûsa emirê Xwedê di çil roj û çil şevî de girtiye. Heriya Hz. Adem çil rojî hatiye stran. Tofana nebî Nûh piştî ku çil rojî li ser hev baran dibare, diqewime. Pîrek çil hefteyî bi hemil dimîne, çilê pîrekê, çilê zarok û çilê miriyan heye.

9- Çar nav: Dîsa çar nav hene gava ku tîne hinda hevdu di xeyalên guhdaran de rismek çêdibe. Ew kes ev in: Kose, birakose, qadî û muftî ne. Sembola neheqiyê û mizawiriyê ne. Kengî ev navina bîne cem hev û hevaltiyê bi hev re bikin dibin şîrikê hevdu û xerakirin û xerabiyên. Bi taybetî kose sembola xerabiyê ye. Dike ku mirov tu carî baweriyê xwe bi wan neyne.

10- Çeleka zerî: Çeleka zerî dibêje, “qiloçê min ê rastê babidîn û ji cî derxin.” Badidîn û ji cî derdixin dinêrin ku çi tehmê Xwedê bixwazin li ber wan e. Zarokên ku tapekên kûçikan dixwarin wê xwarina xweş dixwin heta ku çavên wan jê ter dibe. Dûre wek ji wan xwestiye qiloçê wê yê çepê jî radikin tîne avê vedixwin...

Piştî ku amojna wan bi vî sira wan dihesê stûyê çeleka zerî didin ber kêrê. Lê berî wê çeleka zerî piştî gazinan ji Mîr Mihemed û xweha wî re dibêje, “binê ew ê goştê min bi wan tehl be û ew ê bi we şêrîn be. Kengî ku wan nexwar û da we hûn bixwin û hestiyê min ji xwe re bibin veşêrin...”

Wek ku ji ew qasî tê fêmkirin çeleka zerî rehm e, bereket e, berdêl e, hebûn e, hêz e û dewlemendî ye. Berê çelekek an jî gayekî kê hebûya piştî wan zû bi zû nedihat erdê. Li hin welatan hê jî çelek pîroz e.

11- Morîka xewê: Xapandin e. Bextxer-

akirin e. Bi gotineke din çavgirêdan e. Wekî din jî ev sembol li şûna waran û ji mexsedan hiştinê tîne bîra mirov. Kengî ku morîk dikeve guh tamara xewê lê radibe û leheng dikeve xeweke kûr û giran. Leheng ji miradên xwe dimîne. Xew û mirin jî yek e. Tim ev wilo hatiye dîtin û qebûlîkirin. Xew bi mirinê re hatiye şayesandin. Kesên ku dixwazin leheng bi awayekî mirî li heyatê bimîne bi morîka xewê digihîjin armanca xwe. Leheng heye lê tu hebûna wî tune ye. Dijî lê mirî ye. Çimkî morîk di guh de ye û divê ew morîk ji guh were derxistin ku bi ser hişê xwe ve bê û şiyar bibe. Bêbextî lê hatiye kirin û ew him li şûna waran û him jî ji mexsedên xwe hatiye hiştin.

12- Agir: Agir jî tim derdikeve hemberî guhdarên wêjeya devkî. Tim leheng tê temîkirin ku agirê xwe venemirîne û lê miqate be. Agir tim di destê hûtan de ye. Kengî ku leheng li şîretê guhdar neke yan bi şaşî agir vemire mecbûr dimîne ku here ji mala hût bidize û bîne, ev jî dibe sedema bûyerên giran û xetere.

Agir jî pir hatiye xebitandin. Ne tenê di wêjeya me de. Di ya dinyê de cihekî girîng digire. Agir heyat e. Tehm û ekil e. Li hember sermayê li heyatê man e. Dijwar e. Çi bi ber bikeve dişewitîne û dike arî. Û tim di destên hûtan de ye. Lehengên çîrokan divê tim lê miqate bin lê 'mîrata pisîkê' tê pê de dimîze. Hût hêza xurt û neheq e ku heyat di mista wan de ye. Kujekî heyatê jê ji destê wan filitiye û ketiye mista kesên ji derveyî wan. Heger ku wî kujî ji destên xwe bifilitînin ew ê mecbûrî hût bibin û hût wê wan perîşan bike. Baş e ku di dawiyê de hût perîşan dibin lê xwezî di heyata rastîn de jî wilo bûya. Lê ka!?

Wek ên din agir jî ji baweriyên olî para xwe girtiye û kirasên olî li bejna xwe kiriye.

13- Ronî : Tim ji dûr ve xuyanî dibe û leheng xwe lê digire dihere. Dibîne ku ji binê bîrekê tê û xwe bera binê bîrê dide. Piştî ku digihîje jêderka ronahiyê digihîje rêbaza çareserkirina astengiyên ku li hember e.

Ronî dora xwe ji tariyê rizgar dike. Ronî ilm û zanîn e. Rêya leheng ronî dike û berge-

hinî nûtir jê re vedike. Ilm û zanîn jî deriyê dermanê derdan vedike ji leheng re. Leheng bi dijwarî xwe digihîne roniyê kengî ku wê zanînê bi dest dixe pirsgerêkên xwe çareser dike. Zanîn piştî rêyeke dûr û berdêlinê giran dikeve dest. Zanîn kûr û dûr e. Divê mirov bi sebr û cesaret be. Ronî piranî ji binê bîra ku mala hûtan e xuyanî dibe. Ev rê dide ku zanîn jî ketiye destên serdestan û ew ji xwe re dixebitînin. Bi saya çîrokan leheng ji mirovan re dibêje, "dibe ku zanîn di binê bîran de be divê guhdar hay jê hebin ku mirov bixwaze dikare xwe bigihîne ronahiyê û zanînê. Bi vî awayî dikare hefsarê heyatê di mista xwe xe."

Teyrê baz: Hêzê, girêdanê û mêranyê rê dide.

Hesp: Ji xetereyan xelasiyê û rizgariyê, xwedîtiye, esaletê û girêdanê rê dide.

Efrîten cinan: Ew bi xwe di tengasiyê de maye û ji hêla leheng ve hatiye rizgarkirin. Dûre ew tê gaziya lehengê ku di tengasiyê de maye.

Şîrê şêr di eyarê şêr de: Şertekî pir dijwar dide ber leheng.

Kund: Bêyomiyê tîne bîra mirov.

Şêr: Sembola hêzê û serdestiyê ye.

Rêvî: Konetiyê tîne bîra mirov.

Gur: Xetereyê temsîl dike.

Hîrç: Dijwariyê, hêz û girbûnê, girbûneke nelihev û hovîtiyê rê dide.

Her çiqasî min hewl da ku ez bêtir ji zimanê folklorê ku di guhê min de dilorand fêm bikim jî ew qasî xwe bi mista min ve berda. Aniha ew qas e lê hêviya min ew e ku rojekê bêtir be. Bêşik ew ê ne hew ev tenê bin û ew ê ev nivîs jî li ber ên mayî wek ji cêza bênderekê mistek be.

Di nava hemû gel û neteweyên cîhanê de wêje li ser du şaxan ava dibe. Şaxa yekem wêjeya nivîskî ye, ya duyem wêjeya devkî ye. Dîroka wêjeya nivîskî, ji dahênana nivîsê û vir de dest pê dike, lê dîroka wêjeya devkî û dîroka mirovahiyê bi hev re ye. Ji roja ku mirovên ewil

Di wêjeya kurdan a devkî de raz û sembol

Mihemed RONAÎ

Wêjeya nivîskî, tixubên xeyalên civakê, dewlemendiya zimanê wê û bikêrhatina zimanê wê ya di der barê hest û ramanan de nîşan dide.

Adem û Hewa ji bihuştê mişextî dinyayê bûne û vir de wêjeya devkî ji dest pê kiriye. Heta em dikarin bêjin çîroka cîhanê ya ewil çîroka mişextîbûna wan e.

Dîroka wêjeya kurdan a nivîskî bi Baba Tahirê Hemedanî (935-1010) dest pê dike. Birastî beriya wî ji helbestên kurdî hatine nivîsîn, lê bi awayekî wêjeyî, yekem car Baba Tahirê Hemedanî berhem daye. Ango em dikarin bêjin wêjeya kurdan a nivîskî hezar salî ye. Lê mixabin digel ku wêjeya kurdî ya nivîskî ew qas kevnar e jî, ji ber sedemên siyasî û civakî di cîhanê de îro ne xwediyê bandoreke mezin e. Lewra ne îro tenê, duh jî gelek wêjekarên me bi zimanê desthilatdaran nivîsîn. Weka ku îro çawa wêjekarê tirkan ê herî mezin Yaşar Kemalê kurd be, duh jî Fizûliyê kurd, Nîbiyê Rihayî, Nefî yê Erziromî bi zimanê desthilatdaran nivîsîn. Ji ber vê yekê di nava kurdan de wêjeya nivîskî pir bi pêş neket. Lê em dikarin bi hêsanî bêjin wêjeya kurdan a devkî di cîhanê de, di cihekî gelek taybet de ye. Bi arava dengbêjên me, destan û çîrokên me yên geleri hê jî weka xezîneyeke çandî ji demên kevnar heta vê demê hatine parastin.

Wêjeya nivîskî, tixubên xeyalên civakê, dewlemendiya zimanê civakê û bikêrhatina zimanê wê civakê ya di der barê hest û ramanan de nîşan dide. Lê wêjeya devkî, wek nasnameya civakekê ye. Mirov dikare bi hêsanî ji wêjeya devkî, bastûra wê civakê ya sosyolojîk binase.

Lewra di wêjeya devkî ya civakekê de, êşên wê civakê, xemên wê civakê, kenên wê civakê, giriyên wê, xeyalên wê, hêviyên wê, daxwaziyan wê, tirsên wê, kerbên wê cih digirin. Ev êş, xem, ken, girî, xeyal, hêvî, daxwazî,

tirs û kerbên wê civakê, kirasê xwe diguherînin û geh bi navê destanan, geh bi navê çîrokan, geh bi navê stranan, geh bi navê lorîkan derdikevin pêşberî mirov. Wêjeya devkî di nava gelan de bi awayê destan, çîrok, stran, lorîk, zûgotinok, mamîk ango tiştonekan tê bikaranîn. Lê di nava kurdan de him bi vî awayî him jî bi çend rewşên taybet wêjeya devkî hatiye bikaranîn. Wek mînak di dotina çêlekan de, di dema dankutanê de û di paleyiyê de newayên ku hatine vegotin qada wêjeya kurdî berfirehtir kirine. Heta mirov dikare bêje di nav kurdan de nifirlêkirin jî, ji ber ku pir zêde û dirêj e bi awayekî bûye dewlemendiyek û ketiye nava wêjeya me ya devkî.

Hûn gava guhên xwe bidin stranên civakekê yên geleri hûn ê qêrîn û gazincên wî gelî di wan stranan de bibihîzin. Hûn guhên xwe bidin lorîkên civakekê hûn ê êş û hêviyên wê civakê fêr bibin. Hûn guhên xwe bidin destanên civakekê hûn ê tirs û kerbên wê civakê nas bikin. Her wiha di destanên me de jî rewşa me, xemên me, daxwaziyan me veşarî ne. Serqise destana me ya herî navdar Mem û Zîn behsa çî dike ? Di wê destanê de wateya Mem çî ye? Wateya Zînê çî ye? Wateya Beko û mîr çî ye? Wateyê Tajdîn çî ye? Gava em berê xwe bidin destana me ya herî navdar Mem û Zînê em ê bibînin ku birastî di paş çîroka van evîndaran de razên mezin hene û her kesayetiyeke vê destanê tiştêkî sembolîze dike. Serqise di vê destanê de em dikarin bêjin Mem neteweya kurd e. Zînê Kurdistan e. Mîr Rom e. Beko xayînen kurdan e. Tajdîn dilxwazên kurd sembolîze dike. Di vê destanê de Ehmedê me yê Xanî bûyereke dîrokî vedîşêre. Pevgihana Mem û Zînê, wek pevgihana kurdan û Kurdistanê ye.

Dijwariya mîr, dijiwariya Romê sembolîze dike. Ango çîroka Mem û Zînê çîroka neteweya kurd sembolîze dike.

Kî dikare bêje çîrokên dapîrên me yên şevbihêrkan, ên ku di şevên zivistanê yên dirêj de, di bin lihêfên pînekirî de ji me re vedigotin, ne çîrokên evînên wan ên qedexê bûn. Êş û evînên xwe yên ku nikaribûn bi kesî re par bikin û vebêjin kirin çîrok û ji me re gotin. Me jî got qey di dîrokekê de çîrokek wisa hatiye serê du kesan. Lê birastî jî di civaka kurd de gelek çîrok wisa bûn, ne çîrok bûn, lê ji ber ku civaka me di vî warî de hişk bû wek çîrokan ji me re hatin gotin. Ango çîrokên me gelek caran rastiyan me bûn.

Di nava stran û çîrokên me de, di nava destanên me de hinek peyv zêde hatine bikaranîn. Wek mînak gur, hesp, kew, çiya, hejarî..... Sedema zêde bikaranîna wan sembolîkbûna wan e. Serqise di wêjeya me ya devkî de gur, bêbextiyê sembolîze dike. Heta ji bo em bêbextîbûna yekî binin ziman, em dibêjin "hevalê gur e" an "bextê wî bextê gur e". Di wêjeyên din de gur wisa nayê fêhmkirin. Serqise di wêjeya tirkan de gur wek lehengekî tê bikaranîn. Lê di wêjeya kurdî ya devkî de gur wateyeke neyînî dide nîşandan. Taybetiya gur a herî mezin çavbirçîtiya wî ye. Gur dema êrîşî pezekî bike, heke ew pez sed heb be jî, wan her sedan jî dikuje lê ji wan encax yekî dixwe.

Dîsa di wêjeya me ya devkî de hesp wateyeke cuda dide nîşandan. Di wêjeyên cîhanê yên din de, hesp ji bo leheng e. An hesp lehengiya lehengê xwe zêde dike. Serqise hesp beza ye û bi vî aravê lehengê wê çîrok an destanê bi arava bezabûna hespê xwe karên baş dike. An di şer de serkeftinê bi dest dixwe. Lê di wêjeya me de leheng û hesp hempayê hev in. Heta gelek caran lehengiya hesp ji ya lehengê çîrok an destanê bêtir tê nîşandan. Ango hesp ne ji bo leheng e. Lehengekî bi serê xwe ye. Ev jî di nava çanda kurdan de taybetiya hesp nîşan dide.

Di wêjeya kurdî de ciyê herî taybet ciyê kewê ye. Kew ne tenê di wêjeya kurdî ya devkî û nivîskî de, di heman demê de di jiyana rojane de jî xwediyê ciyekî taybet e. Heta wisa taybetiya wê zêde ye ku mirov dikare bêje ku

totema kurdan e kew. Birastî ji bo kurdan kew ajaleke ecêb e. Serqise dema mirov behsa rovî dike, rovî bi fenekiya xwe tê zanîn, gur bi bêbextiya xwe tê zanîn, şêr bi wêrekiya xwe tê zanîn. Lê kew bi du awayî tê nasîn. A yekemîn ajaleke xayîn e, bawerî pê nabe. Ya duyemîn jî ajala herî xweşik, herî kubar û nazdar e. Ango ne dikare dev jê berde ne jî dikare xwe lê bigire. Jixwe kew jî wê xayîniya xwe li piştê xweşikbûna xwe dike. Ji ber ku xweşik û balkêş e hevalên wê xwe lê digirin. Lê ew ji bo cemeke qût hevalên xwe dike xurê nêçîrvan.

Di wêjeya me ya devkî de ji têgehên girîng yek jî çiya ye. Hûn ji çîroka Siyabendê Silîvî bigirin heta Cembeliyê Hekariyan, ji stranên me bigirin heta lorîkan çiya di piraniya wêjeya me de derbas dibe. Kurd ji ber ku neteweyeke çiyayî ne, di her demê de taybetiyeke mezin dane çiyayan û çiya ji xwe re wek spartekekê pejirandine. Di demên xwe yên herî teng de, serqise di serdana cendirmeyan de an di revandina keçikan de an di kuştina mêran de tenê çiya deriyên xwe ji kurdan re vekirîye. Ji ber vî yekê çiya di wêjeya me de wek dayikeke dîlovan tê bikaranîn. Wek sembola serkêşiyê tê bikaranîn.

Wêjeya devkî di her demê de bandor daye ser wêjeya nivîskî. Lê êdî di vî dema ku em tê de dijîn de ango di sedsala bîst û yekan de bandora wêjeya devkî gelek sist bûye. Heta em dikarin bêjin şikîyaye. Êdî wan têgehên ku di wêjeya me ya devkî de cih digirtin niha bi me biyanî tên, an ecêb tên. Serqise niha hûn ji ciwanên me yên nûgihîştî Evdal bipirsîn dê piraniya wan nas neke. Yên ku nas bikin jî dê wî fêhm nekin. Wek mînak Evdal ji kurê xwe Temo re dibêje "Temo lawo mirin çêtir e ji feqîriyê" Ciwanên me yên niha gelo dê çî fêhm bikin ji vî hevokê ?

Folklor a devkî nasnameya gel a xwezayî ye. Hîmên hişmendiya gel; ango çand, bawerî, nêrîna jiyana hwd di vî folklorê de veşartî ne. Di vî folklorê de baweriyên pir ecêb jî hene; baweriyên aqlî jî henê. Ev baweriyên gel, bingeha xwe ji dem û dewranên pir kevn digirin. Lewre em dikarin bibêjin pi-

Di gotinên devkî de hişmendiya gel

Dilxwaz HERDEM

Hîmên hişmendiya gel; angî çand, bawerî, nêrîna jiyane hwd di vê folklorê de veşartî ne, di vê folklorê de baweriyên pir ecêb jî hene; baweriyên aqlî jî henê, ev baweriyên gel, bingeha xwe ji dem û dewranên pir kevn digirin

raniya van baweriyên hemgelî (evrensel) ne. Di van baweriyên de hem taybetmendiyên olên cuda hem jî ên dewrên cuda hene. Lewre kesê ku bixwaze gel û çanda wî binase pêwîst e dewla xwe berde binê vê bîrê û bi kodikê têr avê jê vexwe. Bi vê baweriyê em ê jî hewl bidin ku li ser bi çendîn mînakên rawestînin.

GAMASÎ: Di gotinên devkî de ev ajal(?) an jî tîgîn (mefhûm) wekî remza “hêz, mezinbûn û qudretê” tê hesibandin. Di hişmendiya gel de ev tîgîn hinek tevgerên xwezayî ên gerdûnê şîrove dike. Li gor vê baweriyê dinya li ser qîloçê gamasî disekine. Dema ku gamasî diweste dinyayê jî ser qîloçekî xwe diavêje ser qîloçê xwe yê din. Ji ber vê jî zelzele çêdibin (Li gor min ev tîgîn minakeke pir balkêş e. Ji ber ku tîkiliya kurdan û deryayê nîşan dide. Pêwîst e mirov li ser bisekine). “Ga-masî” tîgîneke jî du peyvan pêk tî. Em piçekî li ser van peyvan bisekinin. “Ga” sembola hêz, ked û hilberîna bejayiyê ye; “masî” jî hêza deryayî ye. Lewre wateyeke derasayî li vê tîgînê hatiye barkirin.

GA: Navê ajalekî ye. Lê ne ajalekî jî rêzê ye. Di heman demê de sembola (remz) hilberîn, bereket û kedê ye. Ji ber ku karê çandiniyê li ser piştê vî ajalî ye. Angî bi formûleke matematîkî: $Ga = ax = cot = \text{çandîn} = \text{hilberîn} = \text{jiyan}$ e. Bi van taybetmendiyên xwe “ga” hem di hiş hem jî di jiyana gelên rojhilat de cihekî girîng girtiye û wekî ajalekî pîroz tê peji-randin. Pîrî caran “ga” weke kesekî/e jî malê

hatiye hesibandin û dema ku ga dimire jî şîn li ser hatiye girtin. Gava ku em li mîtolojiya yewnanan binêrin em peyveke balkêş dibînin: “gaia” (an jî gaea). Wateya vê peyvê “ax” e. Gaia di heman demê de navê xwedawendekê ye ku ev xwedawend “dayika ax” e. Angî her tişt jî wê çêbûye.

PÎRA MIROVXWER: Ev fîgûr, tîpeke sereke ya çîrokên kurdî ye. Ev tîp kesayetên xirab temsîl dike. Cinsiyeta vê qarekterê mî ye. Bi aliyê dîtina xwe (di rastiyê de mirovek wisa nîn e; lewre xeyalî ye) xwînteht e. Porqij e, gemarokî ye, temenê wê pir zêde ye, diranên wê ketine, rûyê wê tev qermîçî ye. Ji bo ku mirovan bixwe di nav daban de xwe pîrî caran reben nîşan dide. Carinan jî bi hin fenên xwe yên din dixwaze encamê bigire. Hin kesên lawaz dikevin van dafikan. Lê yên xwedî hêz, jêhatî qet nakevin van dafikan û tim serdest in. Di dawiyê de jî “pîra mirovxwer” her tim tete kuştin. Kuştina wê jî pir balkêş e û derasayî ye. Ji ber ku lehengê çîrokê, bistê di nav agir de sor dike û li laşê pîrê dixê yan jî ava keliyayî bi serê pîrê de dike. Bi vî awayî pîr dişewite û dibe qijik. Laşê pîrê bi yek carî diçilmisê û dibe rijîyeke piçûk. Ev jî holê rabûna hanê derasayî ye.

GUMGUMAK (Gumgumok, Tîfkêrojê): Ev ajal, di hişmendiya gel de xwediyê wateyeke neyînî ye. Çendîn bawerî li ser vê ajalê jî hene: Ya yekemîn ew e ku ev ajal li devê mirovan dinêrin û dixwazin diranên



wan bijimêrin. Tê bawerkirin ev ajal diranê kîjan mirovî/ê bi tevahî bijmêre ew mirov dimire. Ya duyemîn jî têtê bawerkirin ev ajal tif dikin rojê da ku roj zû biçe ava û tarîbûn serdest (bi rastî min bi xwe jî dîtiye van ajalan tif dikirin rojê) bibe.

KALANÊ MAR: Çendîn bawerî li ser vî tiştî jî hene. Weke têt zanîn mar di salekê de 2, 3 caran çermê xwe nû dikin. Dema ku çermê xwe nû dikin çermê kevn jî diavêjin. Em jî vî çermê kevn re dibêjin “kalan”. Li gor baweriyekê (bi taybetî li herêma Botanê) dema mirov kalanê mar bibîne û bi vî kalanî çavên xwe biferikîne (mist bide), wê çavên wê/î bêtir ronî bibe û çêtir bibîne.

Li gor baweriyêke din jî dema jinên ciwan (qîz) kalanê mar bi porê xwe bidin wê porê wan dirêj bibe. Bawer dikim di vir de xwesteka teşbîha bisk-mar heye. Xwesteka biska (porê) weke mar zirav û dirêj heye.

ŞERBIK ŞIKANDIN: Ev figûreke sereke ya xêlên (dawetên) gelên rojhilat e. Gava bûk were ber sîlanoka (pêça) derî, xesûya bûkê

derdikeve pêşiya bûkê û şerbik dide destê bûkê. Bûk di sîlanoka derî de şerbik dişikîne. Di vir de ya qenc ew e ku bi yek derbê şerbik bête şikandin. Bi vî awayî bûk hem hêza xwe nîşanî zava û malbata wî dide hem jî mesajekê dide malê. Ev mesaj jî xenîtî ye, bereket e. Di vir de pêwîst e ku em hinekî li ser “şerbik” bisekinin. Şerbik ji axê ye; ax jî mak e, ango dayik û bingeha giyaneweran tevan e. Ev jî jiyan e. Di nava şerbik de jî cure cure team; gûz, mewîj, pere, şekir hwd. hene. Di vê derê de em dikarin bibêjin “şerbik” bûkê (ango jinê) temsîl dike. Bingeha jînê ye. Lewre ez bawer dikim ku ev kevneşopiyêke pir kevn e û ji serdema neolîtîkê heta roja me têt.

AVÊTINA DIRAN: Tê bawerkirin dema ku diranê mirov bikeve, eger mirov çavên xwe binoqîne û diranê ketî paş xwe ve biavêjê wê diranê nû rast derkeve. Eger ku çav vekirî bimîne wê diran xwar derbikeve.

MARMARÎŞK: Ajaleke biçûk e. Di hişmendiya gel de xwedî cihekî erênî ye. Di navê “marmarîşk”ê de “mar” (ku wekî ajalekî xirab têt nasin) heye lê di rastiyê de tu têtîlî di navbera wan de tune ye. Kuştina marmarîşkê jî baş nayê dîtin. Di heman demê de têt bawerkirin ku ev ajal wê roja mahşerê di kefa destê xwe de avê ji mirovan re bîne.

GAVDANA DI SER MIROVAN RE: Dema mirovekî xwe li erdê direj kiribe pewîst e ku kes di ser re gavnede. Tê bawerkirin ev gavdan mirinê nîşan dide. Ji aliyê din ve jî ji bo rêzdariyê baş nayê dîtin.

HÊKŞIKANDIN (LÊDAN): Ev libat ji bo çavlêdanê (nezer) têt bikaranîn. Mirov ji bo ku kes çav li mal û milkê wan nede hêkan dişikênin. Weke mînak em dikarin bibêjin gava ku mirovekî ji xwe re xaniyek ava kir, ji bo ku kes çav lê nede hêkekê li derî an jî dîwarê xanî dixê. Wekî têt zanîn hêk ji du beşan pêk têt: Spîk û zerik. Di heman demê de çav jî ji du beşan pêk têt: Spîk û bîbik (reşika çav). Ango têt wê wateyê kesê/a ku çav li mal û milkê min bide, çavê wî/ê jî wekî hêkê birîje.

XWÊ ŞEWITANDIN: Ev libat jî ji bo nez-

erê tê bikaranîn. Bi wateya “çawa ku xwê li ser agir diteqe, kesê/a ku nezer bike çavê wî/ê ji welê biteqe” tê bikaranîn.

MARMASÎ: Ji bo ku mirovên çavker, çav lê nedin bi serdera xanî ve tê daliqandin. Tê bawerkirin ku ev libat pêşiyê li çavlêdanê digire.

KEVIRÊ QUL: Ev ji weke remza çavlêdan û têkbirinê tê bikaranîn.

BERÎDANA (DÛRXISTIN) MIJÊ: Di nav gel de hinek baweriyên pir ecêb jî hene ku mirov nizane ka çawa wan şîrove bike. Yek ji vana jî berîdana mijê ye. Tê bawerkirin ku li dera ku mij lê hebe eger ku mirov qûnê tazî bike û nêzî mijê bibe wê mij bireve.

DÊWÊ HEFTSERÎ: Dêwê heftserî yek ji lehengên sereke yê çîrokên herêma Botanê ye. Ev leheng weke ajalekî têtê dîtîn. Lê taybetmendiyên vî ajalî derasayî ne. Mînak: Agir ji devî dibare, pir bi heybet e, zû tevdigere, gava seriyekî wî were jêkirin serê xwe yên din bi kar tîne. Ev remz ajalekî pir bi hêz û heybet nîşan dide. Di hişê gel de xwediyê wateyeke neyînî ye.

LEYISTIKA KÊL Û BÊL: Weke tê zanîn ev leyîstik di navbera du berekan de tê leyîstin. Her berek sê kêlan (kevirê pehn û dirêj) li hemberî hev dadiçikilîne. Paşê jî her kes bi dorê bi carekî kevir diavêje kêlê bereka li hemberî xwe. Eger ku kesê kevir diavêje kêlê bereka hemberî xwe bixe wê demê mafê wî heye ku careke din jî kevir biavêjê. Kîjan berek pêşiyê kêlên bereka din bixe ew berek bi ser dikeve. Piştî van detayan em werin ser baweriyên bi leyistikê ve têkildar. Tê bawerkirin piştî ev leyîstik tê leyîstin baran dibare. Bi taybetî hinek deverên li herêma Botanê ji bo baran bibare angû şilî bête ne bi tenê zarok lê carina mirovên mezin jî vê leyistikê dileyîzin. Tê bawerkirin teq û reqa kevirên leyîstikê mizgîniya teq û reqa ewrên avis ên şiliyê ne.

SERSENG: Serseng kuçekî (kevirekî) spî ye. Heke mirov du kuçên serseng li hev bixe çîk jî wan diçe. Tê bawerkirin dema ku pir şilî be ji bo ku şilî bisekine kuçê serseng tê lêdan. Gel kuçê serseng datîne nava qadê. Paşê jî ji

aliyê gelek kesan ve bi keviran têtê lêdan.

ÇARŞEMA REŞ: Çarşema reş, çarşema hefteya dawîn a meha sibatê ye. Ango serê zîpan e. Ev çarşem hefteyekê dom dike. Ango ji çarşema dawîya sibatê hetanî çarşema hefteya yekemîn a meha adarê dom dike. Di hefteyê de adû tev derdikevin ser axê. Çarşema pêşîn “Çarşema Reş” e; çarşema paşîn jî “Çarşema Sor” e. Li gor baweriyên gel bûka şeytan “DÛRDAN TELAN” roja çarşema dawîn a meha sibatê diçe mala bavê xwe. Heftayekê li vir dimîne. Piştî heftayekê vedigere mala xwe. Heke ku çarşema ku vedigere mala xwe (Çarşema Sor) şilî be wê salê mişk û mar (adû=börtüböcek) pir zêde dibin. Heke şilî nebe mişk û mar (adû) zêde nîn in. Lewre di vê hefteyê de şilî û şilbûn nayê xwestin.

Dîsa li hin deveran di vê hefteyê de ji bo ku nexweş nekevin xwe naşon. Ji ber ku şuştin mekruh tê dîtîn.

Li aliyê din li hinek herêman di roja Çarşema Reş de striyan dixin kulek û pacyan.

ÇILIK (ÇILE): Ev têtî jî bo demeke ji çil rojan pêk tê, tê bikaranîn. Li gor baweriyên gel jina ku nû zarokbûyî pêwîst e hetanî 40 rojan ji sîlanoka deriyê malê derbasî derve nebe. Sedema vê yekê jî eve e: Heke jina nûzarokbûyî derbikeve wê demê wê bi xwe re bedyomiyê bîne.

Bi taybetî li herêma Botanê ev bawerî hê jî pir zindî ye, hema bibêje weke şertekî olî têtê hewandin. Bi hinek taybetmendiyên xwe ev bawerî, ji herêmên din cudatir e. Li gor vê baweriyê du jinên ku çilê wan li hev ketibin (ango di nava 40 rojan de) pêwîst e hev û din nebînin. Tenê bi şertekî dikarin hev bibînin. Ew jî ev e: Divê her du jin jî derziyên xwe bi hev û din biguherin û destûrê bidin hev. Mafê destûrê di serî de yê jina ku pêşiyê zarokbûyî ye. Destûr jî bi gotina “**Tu girtiya min bûyî, min tu azad kirî; xwedê jî te azad bike.**” têtê dayîn. Heke ku ev jin ne musaît bin dikarin di şûna xwe de wekîl nîşan bidin. Heke berî vê merasîmê jin rastî hev bînin wê demê tê baw-

erkin ku wê şîrê wan kem bibe û zarok lingê xwe nede ber xwe. Ango wê zarok nikaribe li ser piyan bisekine. Ji bo ev neyînî rabe gel fomûla xwe jî amade kiriye. Li gor vê formûla çareseriyê divêt jina pêşiyê zarokbûyî here ba jina din û dawa xwe sê caran bi ser stûyê wê de berde. Paşê jî şîrê xwe bidoşe binê lingê zarok. Bi vî awayî tê bawerkirin ku wê zarok rabe ser lingên xwe.

BIHEVKETINA STÊRKÊN LEYLA û MECNÛN: Li gor vê baweriyê jî dema stêrkên Leyla û Mecnûn li hev bikevin kî çi daxwaziyê bike ev xwesteka wê/î dê qebûl bibe. Ev bawerî piranî di nav eşîrên koçer de heye.

HÊSINAVÊTÎN: Tê bawerkirin dema ku teyrok (zîpik) pir bibare ji bo zirarê nede tiştan û raweste hesin diavêjin ber teyrokê.

HEYVA NÛ: Li gor vê baweriyê heçî kesê/a ku heyva çardeşevî (heyva nû) di dema ku rûniştî be de bibîne wê bextê wî/ê vebe.

LI NÊRÎ SIWARBÛN: Ev jî, yek ji baweriyên sosret e. Li gor vê baweriyê kesê ku bixwaze karikên wî nêr bin bila zarokekî kurîn li nêrî siwar bike; an jî heke bixwaze karikên wî mê bin bila zarokeke keç li nêrî siwar bike.

TEDAWIYA LÊVKULBÛNÊ: Li gor baweriyê gel kesê/a ku lêva wî/ê kul bûbe pêwîst e ji tifikên heft malên ku navên xwediyên wan eynî ye xweliyê bînin û di nava hev de bistêrin. Paşê jî vê heriya ji ariyê li serdera mizgeftê bixin. Kengê ev herî ziwa bibe û bikeve wê demê wê lêv baş bibe.

Ji derveyî van mînakên li jor hatin rêzkirin em dikarin hin mînakên din jî bi kurtasî wisa

bidin:

■ Dema ku mirîşk (tûtî) derkevin ser darê, tê bawerkirin wê zivistan pir dijwar derbas bibe.

■ Di demsala zivistanê de heke çûk bi refê xwe re xwe berdin, ser erdê û biçêrin tê bawerkirin wê berf bibare.

■ Tê bawerkirin zexîreyên nû hatin stendin

pêwîst e roja çarşemê neyên vekirin. Heke were vekirin zû diqede. Ji ber ku cin jî wê zexîreyê bi xwediyê malê re dixwin.

■ Dema gayê malê an jî hespê malê tê firotin an jî bimire pirça (mûyên) dûvê wî tê qusandin û di serdera deriye malê re dikin. Ji bona bereketa wî ji malê neç.

■ Keça malê çaxê ku bidin mêr, pêwîst e dema ji deriyê malê derbikeve serê xwe nizm bike. Ji bona ku malê bavê xwe bi xwe re nebe.

■ Dema zarokbûna jinekê de ji bo ku jin zû û rihet zarok bîne bangeranê mizgeftê tê rakirin.

■ Tê bawerkirin kesê ku dara gûzê biçîne, dema dara gûzê bi qasî stûyê wî mezin dibe ew dimire.

■ Li gor baweriyekê zarokê/a diranên wê/î dereng derkevin serê wê/î qaîm dibe.

■ Dema tû (sîxîl) di destê mirovekî/ê re derbikeve divê here çeqilê dara tûşimkê (navê cureyeke tûyê ye ku tama wê tirş e.) babide.

A- DESTPÊK

Çîrokên nava gel ên ku bi “Hebû tune bû...” dest pê dikin di nava xwe de gelek raz û nîşaneyan disêwirînin. Ev sêwirîn destpêka avabûna derûniya civakî, hişmendiya gelêrî



Di çîrokên gelêrî de raz û nîşanên berbiçav

Azad ZAL

Wekî raz û nîşan têgihiştina mar ji du çavkaniyên dîroka
hişmendiya civakê tê der, yek jê serdema serweriya maderşahî ye;
ya din jî ya serdema serweriya pederşahî ye.

bîreweriya neteweyî ye. Wêjeya devkî bi tenê
vê sêwirînê vedibêje û wek rûbarekî têr û tije
di nava qonaxên dîrokê de digêrîne. Ango wê-
jeya devkî wekî ava çemekî ku nîrx û bûyerên
gelêrî û civakî ji serdemên berê ber bi yên nû
ve diherikîne.

Di wêjeya devkî de çî fîgur, bûyer, leheng,
amûr û nîrxên ku derbas dibin tev xwedî raz
in û nîşaneyên hebûnên dîroka gel in. Hinek ji
vana di dinyayê de di nava piraniya gelan de
hevpar in, hinek jê di nava gelên herêm an jî
parzemînekê de hevpar in û hinek jê jî di nava
gelekî bi tenê de hene û ya wî gelî ne.

Di wêjeya devkî ya tevahiya cîhanê de
nîşaneyên hevpar hene ku ev jî ji bingehekê
tên. Hinek caran bûyereke mezin ku li ser
tevahiya civakan bandor kiriye û di derûniya
girseyî ya civakî de bandoreke hevpar hiştiye
û bûye mijara destan, efsane û çîrokên gelêrî,
dem bi dem guheriye û di hiş û mêjiyê civakê
de cih girtiye, her civakê li ser wê bûyerê li
gorî nêrîn û dîtîn û derûniya civakî bertek
nîşan daye û di nava civakê de wekî
destaneke civakî maye.

Wekî nimûne “tofan” bûyereke giştî ye.
“Newroz” parzemînî ye. “Ga” nîşaneyêke
giştî ye, lê “hesp”, “çêlek”, “gur”, “rovî” yan
jî “mar” parzemînî ye. “Roj” semboleke giştî
ye lê “çem” yan jî “çiya” parzemînî yan jî
gelêrî ye. Ji ber vê raz û nîşaneyên civakî û
gelêrî ji her awayî ve girîng in û hêja ye ku bîr

destnîşankirin û nîrxandin. Bi taybetî jî divê
ku ji aliyê wêjeyî ve bîr nîrxandin.

B- TASNÎFA RAZ Û NÎŞANAN

1- Nîşanên xwezayî

✓ Bûyerên xwezayî yên domdar û
dorveger: Roj û heyv, şev û roj, erd û ezman,
havîn û zivistan, payîz û bihar, berf û baran,
teyrik û tofan, mij û dûman, deşt û çiya, çol û
çolistan, dar û daristan, çem û kanî, mêrg û
çîmen, gul û kulîlk û hwd.

✓ Bûyerên xwezayî yên yekcar û ban-
dorker: Tofan, Newroz, erdhej, çiyayên agirîn,
meteor û hwd.

✓ Bûyerên xwezayî yên jiyana zîndewer:
Gur û rovî, şêr û şepal, xezal, kosî û kîroşk,
ker, kevok, kewa gozel, kêzhatûn (xalxalok),
mar, masî, dîk û mirîşk û hwd.

2- Nîşanên civakî

✓ Bûyerên civakî yên şîn û şahiyê: Mîhrî-
can, dawet, şahî, bûyîn/zayîn, sersal, şîn,
mîrin û hwd.

✓ Bûyerên civakî yên şergeriyê: Serhildana
Kawayê Hesinkar û raperîna Newrozê, Rap-
erîna Spartakus, berxwedana Wilhelm Wals û
raperîna gelê skoçî, Ristemê Zal, Mîrza, Mîrze
Miheme, berxwedana Kela Dimdimê, ser-
hildana Şêx Seîd û hwd.

Çîroka Mihemedê Sêrtî¹

"Hebû tune bû carek ji caran, rihme li dê û bavê hazir û guhdaran, xwelî li serê yê ber dîwaran..."

Go hebû paşayek. Ew paşa rojekê nexweş dikeve. Ji bo nexweşîna wî ji gelek bajaran hekîm û doxtoran tînin ser, lê ew baş nabe... Kes ji bo nexweşîna wî çareyê nabîne. Digerin, digerin li Tir Elo³ salixê dixtorekî digirin. (.....)

Divê xwe bera binê bîrê bidin ka av heye yan na? Ben bi xulam ve girêdidin, xwe ber dide, diçe nîvî dibêje:

"Ax ez şewitîm, min bikişîne..."

Dixtor wî dikişîne jorê. Îcar dora dixtor e. Werîs li nava dixtor girêdidin û dixtor dikeve hundirê bîrê. Xulam hinekî wî berdide û di nîvî de ben diqetîne û diçe. Dixtor dikeve bîrê û dimîne. (.....)

Mêze dike ku wa ye marekî wekî ziya hat ketê hundirê bîrê. Tê ber bi binê bîrê ve çawa çav bi dixtor dikeve şaş dibe û dibêje:

"Tu kî yî, tu ins î, tu cins î? Tu li vir çî dikî?"

(.....)

"Tu kî yî, tu li vir çî dikî?"

Mar dibêje:

"Ez jî evdê Xwedê me."

Paşê bi hev re xeber didin û dixtor meseleya xwe û xulam ji ziya re dibêje. Ziya dibêje:

"Ku ez derketim tu jî bi teriya min bigire, ez ê te derînim."

Ku ziya dertê, teriya xwe lê dilefîne û dixtor jî xwe bi teriya wî digire û dertê. Piştî ku dertê mêze dike ciyekî xweş û hemû dar û ber e. Ziya ciyekî nîşanî wî dide û jê re dibêje:

"Haaa tu wî kevirê spî dibînî? Ew kevir ziyareta maran e. Çiqas mar li dinyayê hebin tînin wê derê ziyaretê dikin. Sibê roja tewafî maran e. Tu jî here li ser wî kevirê rûnê, ew ê mar tev werin wî kevirê ziyaretê bikin. Tu ji maran netirsî, ew ê tu tiştêkî bi te nekin. Bi tenê karê wan ziyaretê e, wekî din eleqeya xwe bi tiştêkî din nakin. Di dawiyê de marekî qertîlok û cîrnexweş ew ê were. Nigê xwe bide ser kevirê ziyaretê û jê re bibêje tu heta ji min re "Xebroşka Mihemedê Sêrtî" nebêjî ez nahêlim tu ziyaretê bikî... Piştî ku got û ziyaretê kir tu wî marî bigire çar tilî ji serî çar tilî ji teriyê jêke û bibe bikelîne. Carekê bikelîne bide civata dora paşayê nexweş, carekê bide xulamê paşa û merivên wî, cara dawîn jî bide paşa..."

Piştî ku marê wekî ziya jê re wisa dibêje û diçe, dixtor radibe diçe ziyareta maran û li ser kevirê rûdinê.

(.....)

"Ya benî adem ka nigê xwe rake ez ziyareta xwe bikim û herim."

"Ez nigê xwe ranakim, şertekî min heye, ku tu wî şertê min bînî cî ez ê nigê xwe rakim"

"Şertê te çî ye, çî şertê we însanan bi me maran

heye? Ka ji kerema xwe re bihêle ez ziyareta xwe bikim û herim."

"Şertê min ew e ku tu ji min re 'Xebroşka Mihemedê Sêrtî' bibêjî yan jî ez nigê xwe ranakim."

(.....)

"Ez ê ji bo xatirê te bibêjim."

Mar xwe li hev ba dide û dike kuloreke mezin û serê xwe dide ser kulora xwe û dest bi xebroşak Mihemedê Sêrtî dike: Hebû tune bû, Mihemedê Sêrtî hebû mezinê êlekî bû. Rojekê Mihemedê Sêrtî xulamên xwe li hev kom dike û dibêje:

"Em îro herin seyd û nêçîrê."

Diçin seydê. Mihemedê Sêrtî li hespê xwe siwar e û her du tajiyeş xwe dane pêşiya xwe li mêrga Kanîmasya⁴ halan e û seyrana dike. Di wê navberê de çima xezalekê ranakin.

(.....)

Xezal vir de bazdide, wê de bazdide û diçe di ber Mihemedê Sêrtî de difilite û diçe.

(.....)

Mihemedê min û te bi dû dikeve, tajiyeş wî dibehce lê dîsa xezalê nagire û wê winda dike. Dibe roja din dîsa xezalê radibe, ew bi dû dikeve, tajiyeş wî yê din jî dibehce dîsa xezalê nagire. (.....)

Êdî taqetê de nemaye, westiya ye, birçî û tî ye. Wan deran jî nas nake. Berê xwe dide aliyê nenasîyê diçe û diçe. Rastî konreşan tê. (.....) Wexta diçe hinda wan, bêdeng in, silavê li wan dike, silava wî hilnaynin, ne hum e, ne jî gum e. (.....) Dibe şev mêze dike derê konê wî vebû û keçeke weke horî ket hundir. Tepsiyek di destê wê de ye xwarin û vexwarin li ser in û datîne berê. Jê re dibêje: (.....) "Ez xezala te me, ya ku heft şev û heft roj in tu li dû yî. Ez ê ji te re tiştêkî bibêjim. Ji êvarê de tu dengê şeqîna sûr û xanceran dibihîzî. Ew birayê min in, sûran di hev didin, ji bo ku te bikujin. Gere tu ranekevî. Tu çawa rakevî ew ê te bikujin. (.....) Mihemedê Sêrtî Xezalê li xwe mar dike, çil şev û çil roj dawetêkê li dar dixê. Li wê derê Mihemedê min û te û Xezala wek horiyeke cinetê bi hev şa dibin. (.....)

Mihemedê Sêrtî diçe nava baxçeyekî ku hewzek û qesrekê de ye. Dibe lawê kaloyê xwediyê qesrê. Ew jê re dibe law, ew jî dibe bav. Pê dihesse ku kalo "heft sal" in bi dû "kevoka gerdên binexş" ketiye. Du kevok her roj tînin ser hewzê, yek kevoka şîn e, ya din jî kevoka gerdên binexş e. Perî ne û dema ku postê xwe ji xwe dikin dibin wekî qîzên çardehsalî. "Textê kevoka gerdên binexş textê zêrîn e, xwarina wê tev goşt û birinc e". Mihemedê Sêrtî ji bona bavê xwe kevoka gerdên binexş digire û tîne. Ji ber ku kevoka gerdên binexş tê girtin, êdî ew vegere mala bavê xwe jî, ew ê "textê wê textê darîn be, xwarina wê tasek av û nanê garis be". Kalo xwe layiqî kevokê nabîne

û kevokê dide lawê xwe Mihemedê Sêrtî. Mihemedê min û te kevokê tîne û tê malê.

Rojekê li beravê, kevok postê xwe di berîka Mihemedê Sêrtî de dibîne difire û diçe. Mihemedê Sêrtî bi dû dikeve. Lê nizane bi ku ve çûye. Bi tenê kevokê ji xezalê re gotiye:

“Bajarê mala bavê min gelek dûr e. Mihemedê Sêrtî soleke ji hesin têxe nigê xwe, gopalekî ji pola têxe destê xwe û bi rê bikeve; sola wî û gopale wî bimehin û biqedin jî ew ê negihîje bajarê mala bavê min. Bajarê mala bavê min “bajarê Şahê Bilûrovan” e. (.....)

Qertel dibêje:

“Ev heft sal in ku ev mar miseletî têtîkên min bûbû û te hat ew xilas kirin, xwazika heft salên din jî wisa bixwara ne ku te daxwazeke wisa ji min bikira.”

Qertelê bajarê Şahê Bilûrovan nebihîstîye û nizane. Diçe cem diya xwe ya ku emrê wê dused sal in. Ew jî nizane, dibêje ka bila her du lawên min werin belkî ew bizanibin. Dibe êvar ku her du bira tîn, ji wan dipirsin. Ew jî dibêjin:

“Em nizanin.” Lê birayê biçûk dibêje: “Tiştêk hêna kete bîra min. Em di ber bajarekî re dihatin dengê hat guhê min. Digot; ‘Lo heyran jixwe adetê bajarê Şahê Bilûrovan ev e.’ Ez dibêjim qey ew bajar bajarê Şahê Bilûrovan e.”

Her du bira diçin bajarê Şahê Bilûrovan. Heft sal in ku xwişka kevokê neçûye mala birayê xwe, ji bo kevokê diçe ba birayê xwe da ku destûrê bistîne. Bi wî awayî Mihemedê Sêrtî kevokê û zarokên xwe tîne û tê.

Bi wî awayî mar xebroşka xwe diqedîne.

Dixtor nigê xwe radike da ku mar ziyaret bike. Çawa ku mar kevir maç dike, dixtor nige xwe dide ser serê wî û çar tiliyan ji aliyê serê wî çar tiliyan ji aliyê teriya wî jê dike, dibe dikelîne. Ava goştê mar cara ewil dide xulamê paşa, cara diduyan dide mêvanên dora paşa, cara dawîn dide paşa. Xulamê paşa pê dimire, civata dora paşa ji xwe ve diçe, paşa jî pê baş dibe...

Xebroşka min li diyaran, rihme li dê û bavê guhdaran...

Têbînî:

¹ Ev çîrok ji devê Hesîba qîza Sofî Letîfê lawê Qasimê Mala Qolê hatiye girtin. Ew jî dibêje ku di biçûkiya xwe de ji devê xalê bavê xwe Hesên bihîstîye û hil kiriye. Xalê Hesên wiha gotiye: “Ez hê biçûk bûm mevanekî xerib hat mala me, di civata bavê min de “Xebroşka Mihemedê Sêrtî” got û min jî ji devê wî hil kir.” Çîroka Mihemedê Sêrtî gelek dirêj e, me bi kurtasî da. (A.Z.)

² Tir Elo: Gundekî nêzî Amedê ye, dibe ku navê wî gundî Til Elo be; ev çîrok li her herêmê ku bê gotin, her herêm li gorî xwe navê gund an jî ciyan diguhere.

³ Kanîmasya: Ev nav jî li her herêmê li gorî xwe bi nav dikin. Herêma Kanîmasya navê herêmeke li deşta Amedê, nêzî Farqînê ye.

✓ Bûyerên civakî yên olî: Îbrahîm Pêxember û Nemrûd, Mûsa Pêxember û Firewn, Hz. Suleyman û Sara, Yûsûf û Zuleyxa, Hesên Sabah û Melîkşah û hwd.

✓ Bûyerên civakî yên hişmendiyê: Heft şev û heft roj, sê şev û sê roj, çil şev û çil roj, cin û perî, daweta gur û roviyan, perî, pîrebok, ziya/ejderha, teyrê sîmurg û hwd.

C- RAZ Î NÎŞANÊN ÇÎROKAN Î ŞÎROVEYA WAN

Li her derên Kurdistanê ev çîrok û yên wekî vana tîn gotin. Ji aliyê vegotin û hûnandinê ve hinek cudahiyên hûrik hebin jî di bingehe de wekî hev in. Di binavkirin û bilêvkirinê de cudahî hebin jî rayeka wan yek e û dêrûnî û hîmê civakê didin der. Çend nîşanên ku di van çîrokan de hene ev in:

1- Hebû tune bû: Peyveke kevnare ye û bingeha vê peyvê di binhişê civakê de jiyaye û wekî raz, wekî nîşane ji serdema avabûna civakê tê. Ji aliyê hişmendiya civakê ve bingeha vê peyvê ji felsefeya anîmîzmê tê der ku beriya baweriya zervanîzm û zerdeştîyê ye tê. Di binhişîya gelên aryanî ya tevan de heye. Wekî têgeheke felsefî tê wateya “navbera hebûn û tunebûnê”. Îro di zimanê îngilîzî de “zero” heye. Zero wekî peyv ji aliyê etîmolojîk ve ji “zervan” tê. Navbera hebûn û tunebûnê ku sifir e dibe bingehe. Wekî têgeh û têgehîştin ji peyvê “zervan” sifir/zero tê der.

Di baweriya Zervanîzmê de navê Xweda Zervan e. Têgehîştina li ser Xwedayê bi navê Zervan ew e ku gerdûnê û bi taybetî jî demê disêwirîne. Di bingeha xwe de jî ji tunebûnê ango ji zervan/zero/sifirê tê. Zervan bê zayend e. Her du zayendan jî di xwe de di-hewîne û di binhişê civakê de wekî pro-cêwî tê zanîn. Ango bêzayendîyeke ku wekî cêwî her du zayend jî tê de hene. Ev bi xwe dubendî yan jî nakokiya xwezayî ye.

Li gorî baweriya Zervanîzmê beriya her tiştî roj hebûye. Tîrêjên rojê aliyê baş û roniyê diderbirînin; aliyê made, reşayî jî (reşayî ew e ku erd e) nebaşiyê diderbirîne. Heman bawerî û binhişî ji zervanîzmê derbasî zerdeştîyê



bûye îro di bawerîya êzîdîtî, mûsevîtî, filetî, îslamîyetê de jî heye. Milyaket ji agir çêbûne û paqij in, bi tu awayî nebaşî ji wan çênabe. Li gorî vê baweriyê cin û perî jî ji agir in. Lê mirov/însan ji axê çêbûye. Loma ku di mirov de xirabî heye.

Du alem hene, yek jê îns in, a din jî cin in. Dubendî, cêwîbûn, nakokîya xwezayî di vir de xwe derdixe der. Di zervanîzmê de ev dubendî wekî destpêk e. Zervan destpêka dem û gerdûnê ye. Bingeha hişmendiya civakî ji vir tê.

Di çîrok û destanên gelêrî de qalib û peyvên cuda cuda hene ji heman bingehê tîn. Wekî:

Ristemê Zal dema ku dixwaze hêz bigire û bi neyaran re şer bike dibêje:

"Ez bi Xwedanê şev û rojan bikim ku ez rabim..."

Di hinek çîrokan de lehengê/a çîrokê "berê xwe dide oxirê û piştê xwe dide felekê..." Her wiha carinan jî di çîrokan de tê gotin:

*"Çol û çolistan,
ber û beristan,
havîn çû ma zivistan
hê ji nû da serê Mîrze Mihemedê (navê leheng çî be ew tê gotin) me kete xaxên giran"*

Destpêka çîrokan jî bi "hebû tune bû..." dest pê dike û bingeha xwe ji aliyê hişmendiye ve ji vir digire. Di çîrokên gel ên din de jî wekî "Xwedanê şev û rojan", "oxir û felek", "dem û dewran" derbas dibin. Wekî binhiş ji vê têgehîştinê tê.

2- Mar/ziya/marê reş: Di gelek çîrokan de mar derbas dibe. Carinan pîroz e, baş e, alîkar e û her di xizmeta başiyê de ye. Carinan jî nebaş e, ava kaniyan diçikîne, riyên bajaran digire, mirovan dixwe û ji bo ku ava kaniyê berde, riya bajaran veke û zirarê nede mirovan divê keçên xweşik û rind wekî qurban bên dayîn.

Wekî raz û nîşan têgihiştina mar ji du çavkaniyên dîroka hişmendiya civakê tê der. Yek jê serdema serweriya maderşahî ye; ya din jî ya serdema serweriya pedersahî ye. Çîrok û destanên ku ji serdema maderşahî werin wekî raz û nîşaneyêke pîroz û baş û hevalmîrov tîn sêwirandin. Çîrok û destanên ku ji serdema pedersahî bîn mar wekî neyar tê dîtin û sembola nebaşî û nexweşiyê ne.

Di çîroka me de mar/ziya/marê reş wekî nîşane û razeke baş û pîroz tê dîtin. Ziya lehengê çîrokê xilas dike û dide nîşandan ku wekî civaka mirovan civaka maran jî heye, ew jî xwedî bawerî ne û tu nebaşî û nexweşiyekê nakin. Her wiha ji bo ku nexweş baş bibe marê herî emrdirêj û extiyar dibe derman. Niha sembola dermanfiroşî û bijîjkiyê du marên reş yên li hev lefandî ne. Ev jî ji heman bingehê tê.

Raza dermanbûna mar ew e ku ew bi xwe çîrokeke serdemên berê dibêje. Li gorî çîrokê ku mar çîroka Mihemedê Sêrtî nebêje ew ê

nebe derman, yan jî ku bibe derman jî divê çîroka Mihemedê Sêrtî bi wî re neçe, bi çi awayî be divê pîr û kal bûyer û hebûnên berê ji nîfşên şûnde re bibêjin. Marê "qertîlok û cîrnexweş" marekî temendirêj e û hindiktirîn sêsed sal jiya ye.

Li her heremên Kurdistanê di her malbatê de marekî reş heye. Ev mar wekî dewleta malê tê dîtin. Ku zarok mezin dibin û ji hev diqetin, marê reş li mala kîjan lawî bê dîtin dewleta malê li wê ye. Ew mal wek malmezin tê dîtin. Marê reş nîşana dewleta malê ye û wekî tiştêkî pîroz tê dîtin. Kes dengê xwe jê re nake. Ew jî eleqeya xwe bi kesê/î nake.

Mar tiştêkî wisa ye ku mirov wî li ku bibîne berdidê yan jî ku wî biqefêlê dikuje. Lê ev marê reş yê ku di malan de ye, ne neyar e, ne xeter e. Berevajî vê tiştêkî pîroz e.

Ev têgihîştin ji serdema maderşahî tê. Di dema neolîtîkê û beriya wê de sembola serweriya maderşahî mar e. Marê reş dibe evîndarê jinan. Hê jî gelek bûyerên wisa hene ku mar bi dû jineke dikeve û jê naqete. Di çîroka

Helmo de ev heye û li gorî çîrokbêja me û gelek kesên ku li herêma Farqînê dijîn ev bûyer bûyereke rast e. Ango bûyer di rastiye de pêk hatiye.

Li serê çiyayên Kurdistanê gelek çîrokên rastîn hene ku di navbera şervanên jin û maran de bûyerên bi vî rengî pêk tên.

Neyartiya li hember mar di baweriyayekxwedayî de dertê meydanê. Dema ku Xwedê Adem û Hewa dixwe ceneta xwe ji wan re dibêje divê hûn ji dara sêvê/genim nexwin. Wê demê mar dergevanê cenetê bûye. Navê wî Ridwan e. Îblîs tê dixwaze bikeve cenetê. Mar wî dixwe binê zimanê xwe û bi dizî dixwe cenetê. Îblîs jî diçe Hewayê dixapîne û ew jî Adem dixapîne diçin ji dara sêvê/genim dixwin. Ji ber ku mar îblîs xistiye cenetê û ji ber ku Hewa xapiyaye û Adem xapandiye Xwedê ji wan her duyan re dibêje:

"Ez ê nîfşên we her duyan ji hev re bikim neyar heta li ser rûyê erdê bin ew ê neyarê hev bin. Li ku derê rastî hev werin ew ê hev biku-jin."

Çîroka pîrebokê*

Rojekê kalê Miheme bi şev tê ku were malê. Bi rê de rastî dawetêkê tê. Ku tê nêzî dawetê, dawetvan gazi dîkinê dibêjin "Xoce, ya devê xwe nebêje were!"

Kalê Miheme diçe nava dawetê, doşekêkê tînin jê re datînin. (...) Di xew re diçe, ji xew şiyar dibe, mêze dike li çolekê ye û hefsarê hespê wî bi qevda destê wî ve hatiye girêdan û di nava destmala wî de jî çend kesme hene. Ne dawet û ne jî berbûrî û dawetvanî hene. Wê çaxê fêr dike ku ew dawet daweta cin û periyar bûye. (...) Kalê Miheme tê malê, di ser de dem derbas dibe. Mêze dike dem bi dem hespê wî zêf dibe. Gavên wan hebûye, diçe cem gavên dibêje:

"Çima hespê min roj bi roj zêf dibe, qey tu baş lê xwedîtî nakî?" (....)

"Wele ez nizamim, lê dema ku ez garanê dikim mexel, hespê te qet

nasekine, wekî ku yek lê siwar be heta êvarê li dora garanê diçe û tê. Qet nasekine."

Kalê Miheme ji çend rûspî û mezinan dipirse, dibêje ev çi mesele ye. Meseleya şeva xwe û daweta cin û periyar jî dibêje. Paşê tê gotin ku "pîrebok" e ku li hespê siwar dibe û wî digerrîne. (...) Ku wisa dîkin dotira rojê mêze dîkin ku wa ye jineke ji periyar li hespê siwar e û wê digirin. Şûjinekê di pêşîra wê re dîkin û dibe navmalya mala Kalê Miheme. Êdî kar û barê malê tev dike. (...) Rojekê pîrebok ji wan re dibêje:

"Min bêriya malbata xwe kiriye. Yê min jî dê û bavê min, xwişk û birayê min hene. Ez dixwazim herim ba wan." Dibêjin:

"Tu serbest î, tu bixwazî tu dikarî herî."

Pîrebok dibêje:

"Ez ê herim, min bibin bavêjin Gola Cinan (Li her herêmê goleke

wisa heye û navekî wê golê heye.) Gava ku ez di nava avê de noq bûm, ku xwîn bi ser avê ket hûn bizanibin ku wan ez qebûl nekirime û ez kuştîme, gava ku xwîn bi ser avê neket wê çaxê ez qebûl kirime."

Piştî ku wê dibin davêjin avê demek şûn de xwîn bi ser avê dikeve. Wê çaxê fêr dîkin ku ew kuştîme.

Piştî vê çîrokê me pîrsî û got: "Çima wê dikujin?"

Ji aliyê ya ku dibêje de hat gotin ku "Dema ku diçe cem malbata xwe, malbata wê jê re dibêje; 'bêhna mirovan ji te tê' û loma wê dikujin.

Dîsa me pîrsî û got:

"Çima niha tune ne, berê hebûne û di vê dema hanê de çima tune ne?"

"Ew jî wekî giya şîn dibin. Ji ber ku mêşin wan dixwe namûnin."

* Ev mesele ji devê Mensûreyê hevsêra Zekiyê lawê Sîracê mala Qolê hatiye girtin. Wê jî ji pîra Eysê bîhistiye. Pîra Eysê jî ji diya xwe bîhistiye û diya wê jî ji bavê xwe bîhistiye. Çîrok çar nîfş derbas kiriye. (Navê wê li her herêmên Kurdistanê cur be cur heye. Pîrebok, pîrebok, pîresêrk, pîra sêrê, pîrhevîrk, pîrhelk. A.Z)

Ji wê şûnde mar û mirov bûne neyar.

Ev wekî tēgihîştin di nava civakê de bi cî bûye. “Têjikên maran bê jarî nabin” ji vê tēgihîştinê tê.

Ji ber ku pîroziya mar ji aliyê tēgihîştin û binhişiya civakî ve kevtir e, di nava civakê de bi taybetî ya kurdan de hê jî heye û tē parastin. Marê reş wekî raz û nîşan di binhişê gelê kurd e pîroz e.

3- Pîrebok: Di sêwirîna gelên aryanî de wekî nîşane Pîrebok heye. Di nava kurdan de jî cin û periyan e. Gelek navê wê hene. Li nava kurdan wekî binavkirin û bilêvkirin curbecur e. Heta nozdeh navên wê yên cuda hene. Lê bilêvkirina navê wê her çiqas cuda bin jî di sêwirînê de heman tişt e.

Di zimanê îrlandî de wekî “Bean Sidhe”; di zimanê skoçî-keltî de “Ban Sith” (dayika periyan); di zimanê galî de “Gwrachy Rhibyn” (pîresêra Rhibynê); di îngilîzî de wekî “Banshee” tē binavkirin. Ji aliyê sêwirînê ve dişibin hev. Wekî nîşane carina li malbatekê berî ku yek bimire bi dengê xwe hay pê dixê (li Kurdistanê pepûk ya jî kund bêyomiya xwe ji vê sêwirînê digire); carinan jî bo ku jinên ducan bitirsîne dikeve şeklê pîrejînekê û zarokan direvîne; carinan wekî xeyaletê di malan de xwe nîşan dide; carinan bi hêşîrgirtina mirovan dibe nav-maliya malbatên malmezin. Ev sêwirîn ji Îzlandayê heta Kurdistanê jî wê hat Hindistanê di nava hemû gelên aryanî de heye. Taybetmendiyeke hevpar heye ku di malbatên tovrind/esilzade de tē dîtin. Taybetmendiyeke din ew e ku jin e.

Bingeha vê sêwirînê wekî tēgihê ji Lîlîthê tê. Lîlîth jîneke serhildêr e. Li gorî mîtolojiya serdemên berê û baweriya olî; Xwedê Adem diafirîne, demek şûnde bi navê Lîlîth jînekê jî

diafirîne. Adem û Lîlîth wekhev in. Adem dixwaze serdestiyê bike. Ji ber vê yekê Adem û Lîlîth li hev nakin. Adem bera Lîlîth dide, ya jî Lîlîth direve diçe ser hîvê. Adem jî giliyê wê li ba Xwedê dike û dibêje ku Lîlîth serbest digere û xirabiyê dike.

Ji bo ku Lîlîth heyfa xwe ji Adem bigire ji ser hîvê tē dinyayê zarok û jinan ditirsîne, wan direvîne. Hê jî di nava kurdan de baweriyek heye ku zarok “bi hîvê dikevin”.

Gava ku bi şev zarok li hîva çardeşevî binêrin dê û bavê wan ji wan re dibêjin: “Lawo/keçê li hîvê mêze neke, tu yê bi hîvê bikevî!” Dema ku zarok bi hîvê dikevin eniya wan tenî dikin, ji risasê hîvikê çêdikin û bi wan ve dikin da ku baş bibin. Bingeha baweriyên bi vî rengî tev ji vê sêwirînê tê der.

4- Şev û roj, sê şev û sê roj, heft şev û heft roj, çil şev û çil roj: Di sêwirîna gel de ciyê hejmaran gelek girîng e. Hejmarên wekî yek, sisê, heft, çil cihêreng in.

Wekî nîşane di sêwirîna civakî de “yek” di cîhana mîkro û ya makro de nîşaneya yekheviyê ye. Kes û gerdûn, perçe û tevahî bi sêwirîna “yek”ê tē bîra mirov. Xwe û xwedî û Xweda; xwebûn û xwedîbûn û xwedabûn di bingehê de “yek” in. Di xwe de “yek”îti, di gerdûnê de “yek”îti; mîkrobûna “yek”ê û makrobûna “yek”ê ye. Di binhiş û sêwirîna civakî de bi çî rengî dibe bila bibe ev heye. “Yek”îtiya nakokiyan; “yek”îtiya Xwedê; “yek”îtiya serokan; “yek”îtiya lehengên dîrokî, “yek”îtiya qehremanê/a çîrokan di bingehê de ji tenêtiya kes tē. Kes di derûniya xwe de yek e. Mirov dema ku bi xwe dihesê pêşî tenêtiya xwe ango “yek”îtiya xwe dibîne. Ev jî bo dîroka mirovahiyê jî wisa ye, ji bo dîroka mirovekî/ê jî wisa. Zarok bi “yek”îtiya xwe dihesin hêna dibin “yek” ji civakê. Di binhişê mirov de ev “yek”bûn wekî sêwirîna bingehîn mora xwe



li bîr û baweriya mirov dixê.

Wekî nîşane di sêwirîna civakê de “sisê” jî ji “ez-tu-ew” tê der. Di xwezaya berbiçav de “erd û ezman û di navbera wan de mirov” e. Sêgoniya jiyane “dê-bav-zarok” heman sêwirîn e. “Zayîn-jîyan-mirin” heman sêgoniyê tîne hişê mirov. “Destpêk-pêvajo-encam” heman têgihîştin e. Ji ber vî awayî di sêwirîna civakî de “sisê” di kombînezona hûnandina ramanê de girîng e û bûyer bi sê awayan pêk tên.

Wek nîşane hejmara “heft” jî dîsa di sêwirîna civakî de girîng e. Di “heft” rojan de dinya ava bûye, “heft” tebeq ezman, “heft” tebeq binê erdê, “heft” roj wekî razeke binge-hîn ji serdema destpêka mirovahiyê tê der. Babîliyan hejmara “heft” ji kewkeban derxistine û “heft” rojên hefteyê jî ji wê tê der. Rahibên babîlî Jupiter, Venus, Saturn, Merîx, Merkür, Roj û Heyvê wekî bingeha hejmara “heft” diyar kirine. Navê rojên hefteyê pîrî jê ji vê yekê tên. Wekî nîşane hejmara “heft” jî ji vê yekê tên. Pîroziya hejmara “heft” di nava sumerîyan, babîliyan, hîtîti, grekî û gelek gelên aryanî de heye. Em dibînin ku feylesofên grekî “heft” xarîqayên dinyayê diyar kirine, ev heman sêwirîn e. Vê têgihîştina binhişî di olan û terîqetan de jî cî girtiye.

Sêwirîna çil jî ji demên demsalî yên xwezayî tê der. “Çil roj çileyê zivistanê”, “çilê payîzê”, “çilê germa havînê” li gorî serma û germê, li gorî zirêbûna erd û avhewayê pergala tevgerîna civakê hatiye diyarkirin. Biwêja “Çil roj çile, hespê qule û mîrê ... pê nebe ewle” jî vê bingehe tê der.

Dema mirî dimire “sê” roj hewarî tê danîn; di “çil”ê wî/ê de helawa mirî tê dayîn.

5- Xezal, kevok: Xezal sewaleke kûvî ye. Her çiqas ajal û sewalên din ji aliyê mirov ve hatibin kedîkirin jî tu caran xezal nehatiye kedîkirin. Ya mirov nikaribûye wê kedî bike, yan jî xwezaya vê sewalê dest nedaye ku bê kedîkirin. Her tim jî bo mirov bûye raz û nîşaneke pîroz. Çawa ku perî nayên dîtin, çawa ku evîn nayê girtin, çawa ku utopyayên binhişê mirovahiyê (wekî bihuşt, azadî, jiyana

li stêrkên dûr û hwd.) ne gengaz be ku bîdêstxistin, xezal jî sewaleke wisa ye. Ji bo seydvana û nêçîrvana xezal sewaleke xwedî raz e. Tê dîtin û wenda dibe. Xezal sewaleke azad û serbest e li serê çiyayan.

Di sêwirînê de xezal jin e. Di binhişê civakê de zayenda mêza disêwirîne. Çawa “ga” nîşana hêz û desthilatdariyê be; xezal jî nîşana xweşikî, zerafet û azadiyê ye. Bê îstîsna di hemû çîrokên gelêrî de vê sêwirînê diderbirîne.

Di çîroka me ya nimûne de jî heman sêwirîn heye. Heta ku xezal e azad e; yan jî heta ku azad e ango qîz e dikeve şiklê xezalê û li nava zevîyan, li serê çiyayan serbest digere û tu nêçîrvan nikarin wê bigirin. Piştî ku dibe jin êdî wê raza wê betal dibe.

Kevok jî di sêwirîna civakê de wekî jin tê derbirandin. Ew jî bi per û baskên xwe li ezmanan azad e û li ku derê bax û baxçeyên xweş, gul û gulistanên rengîn hebin li wan deran li ser avên zelal digerin. Perî bi rengê kevokê tên sêwirandin. Ku postê xwe ji xwe dîkin dibin keçên xweşik û delal. Dema ku postên wan ji wan tê dizîn êdî dibin hêsr û raza wan betal dibe. Di çîroka me de jî ev diyalektîk heye. Kevoka me ji aliyê lehengê çîrokê ve tê girtin êdî raza wê betal dibe. Heta ku “kevok” e xwediyê “textê zêrîn” e, lê ku carekê tê girtin êdî para wê “textê darîn” e.

D- ENCAM

Di çîrokên gelêrî de bingeha sêwirînê xweza ye. Gelên ku bi xwezayî dijîn, jiyana wan li ser alav û amûrên xwezayî ye sêwirîna çîrokên wan yek in. Ango mirov dikare bibêje ku xwezaya sêwirîna civakê ji xwezaya rastîn, gerdûnê xwedî dibe.

Helmo ji derî de derket gava mêze kir li pêşîya wê mar sekinandî ye. Helmo lê xist û çû ser devê bîrê. Gava Helmo li pişt xwe zivîrî marê reş kişîya ser devê bîrê. Helmo pir tirsîya û got ez keça mîr im. Marê reş bi ser Helmo de ba ket û got:

“Keça mîr Helmo Helimê cahilê ciwanê, Helmo tu metirse ez evîndarê te me”

Helmo lê xist hat malê. Tirsî Helmo ji marê reş kişîya. Gava Helmo çû malê marê reş kişîya

Marê reş û Helmo*

kaşa, Helmo keça paşa... Helmo Helmo Helîmê, Helmo te kir te kir, marê reş te kir... Helmo qîza Bekir... Helmo Helmo Helîmê cahilê ciwanê. Helmo gava çû malê mêze kir xwazgîniyên wê rûniştî ne. Helmo wê çaxê li çokên xwe dixe. Dayika wê dibêje:

"Tu çima li çokên xwe dixî?"

Helmo dibêje:

"Dayê tu nizanî çî bi min bûye!"

Wê çaxê tirsarê marê reş ji min re bûye. Helmo ji derdan ji malê reviya û çûye li binê darekê rûniştiye. Ji xwe re difikirî, di dilê xwe de digot: 'Ji tirsarê marê reş ez newêrim ji diya xwe re bibêjim.'

Helmo Helmo Helîmê cahilê ciwanê. Helmo te kir te kir, marê reş te kir... Helmo li binê darê. Marê reş kişiya binê darê. Mar deng li Helmo kir:

"Helmo tu çima difikirî?"

Helmo bi ser mar da li ba ket. Helmo ji marê reş re got:

"Wextê ji ser devê bîrê ji te qetiyam ez çûm malê min mêze kir xwazgîniyên min li hundir in. Wê çaxê min li çokên xwe xist û dayika min got; 'Tu çima li çokên xwe dixî?' Min ji tirsarê te ji diya xwe re negot; 'Marê reş aşiqî min bûye'.

Bi ser marê reş de li ba ket, ji marê reş re got:

"Tiştêkî bide destê min, derdê te çî ye?"

Marê reş bi ser de li ba ket, got:

"Helmo Helmo Helîmê, wextê ku tu ji derî de derketî çûyî ser devê bîrê, wê çaxê ez aşiqî te bûm. Tu însan î ez heywan im.

Helmo Helmo Helîmê, viya heskirina Rebê jorîn e. Helmo Helmo Helîmê cahilê ciwanê."

Mar bi ser Helmo de li ba ket û got:

"Ez zirarê nadim te, tim were binê darê. Ez ê mêze bikim li bejn û bala te. Wextê tu zirarê bidî min ez ê jî bidim te." û marê reş kişiya devê bîrê.

Helmo Helmo Helmo qîza mîr e. Helmo cahilê ciwanê. Helmo bi dilê kul rabû çû malê. Gava çû malê mêze kir ku dawetvaniyên wê di mal de ne. Helmo zivirî dîsa hat binê darê. Marê reş hilkişiya

balê. Mar bi ser Helmo de li ba ket:

"Helmo Helmo cahilê ciwanê. Helmo tu çûyî malê,

tu çima zivirî hatî binê darê?"

Helmo bi ser mar de li ba ket:

"Dev ji min ber de here, ez wextê çûm malê, min dawetvaniyên xwe dîtin. Dîsa ez hatim binê darê. Ez xeberê bidim te, wa ye min dîkin bûk dibin."

Marê reş xwe li nigê wê dilefine. Marê reş jê re dibêje:

"Wextê te heta vê derê. Min ji

te re negot ez aşiqî te me."

Helmo bi ser mar de li ba ket û got:

"Ez ê herim ji malê re bibêjim."

Mar ew berneda û pê veda. Helmo Helmo Helîmê. Marê reş te kir cahilê ciwanê. Mar xwe jê neda alî. Xeber diçe ji diya Helmo re. Gava diya Helmo tê binê darê. Dibê:

"Helmo dawetvaniyên te li ber derî li benda te ne."

Gava destê xwe davêjê wê radike, marê reş dikişiya kaşa. Wê çaxê diya Helmo li çokên xwe dixe û dibêje: "Helmo Helmo Helîmê cahilê ciwanê"

Wê çaxê dawetvaniyên wê dizivirin diçin malê...

Têbinî:

* *Ev çîrok li herêma Farqînê li civatanê gotin, wekî stranê li ser bûkan jî tê gotin. Bi kurtasî bûyer û çîroka vê bûyerê wiha ye: Bi navê Helmo (Helîmê) keçek heye ku dilê mar dikeve wê û her tim diçe binê dara tûyê ya ber derê mala xwe. Helmo keça mîr e, bê dilê wê wê didin lawê mîrekî din. Ew jî her tim li binê wê darê ji xwe re derd û kulên xwe distrê. Marê reş pê dihesa ku wê didin, xwe lê dilefine û pê vedide. Ev çîrok hê jî tê gotin û wekî stran jî tê strîn.*

Ji devê Remziya qîza Zekiye lawê Sîracê mala Qolê hatiye girtin. Remziya jî bavê xwe Zekî hil kiriye (A.Z)

Wêjeya devkî ya kurdan bêhtir dengbêjî ye. Hilbet çîrokbêjî, destanbêjî, metelokgotin, helbestxwendin û awazên zêmari û hwd. jî hene. Û rastiyeke dinê jî heye ku bingeha gişkan çîrok e. Çîroka her tiştî heye û çîrok dibe bingeha helbest, destan û hwd. mirov dikare bibêje çîrok dayika wêjeyê ye. Di



Hîmên wêjeyê

Aydin ALOKMEN

Piraniya wêjeya devkî ya kurdî ji devê jinê ye, wateyeke vê ya kûr heye, ji ber ku zimanê kurdî mê û afirînkare wî jî jin e; stran û kilam bêhtir berhemên wan in

civaka kurdan de jî wisa ye. Her bûyer bûye çîrok û çîroka her bûyereke biwate heye. Li ser çîrokê helbest, stran û her wiha afirîne. Vê jî hişmendiyeke di civakê de afirandiye û her civakê li gorî vê jî teşe girtiye. Hişmendiya civakê jî ketine wêjeyê û bêhtir jî ketine wêjeya devkî. Mirov dikare bibêje di hişmendiya civakê de bandora mîtolojî, ol û giredayî vê jî bandora wêjeyî û ilim jî ya wêjeya devkî zêdetir e. Hût, pîrebok, lehengên çîrokan (wek Kawa, Ristemê Zal...), xweşmêrên stranan û hişmendiya wan heval û hogirên me yên jiyanê ne. Duristî, xwedîsoz û evînadari û sekna me ya jiyanê bêtir me şewqdana wan e. Liv û libatên me bi vê teşe digirin.

Bi qasî ku dizanim û têdigihîjim, dixwazim bêhtir rewşa hin stran û kilaman raxim ber çavan.

Piraniya wêjeya devkî ya kurdî ji devê jinê ye. Wateyeke vê ya kûr heye. Ji ber ku zimanê Kurdî mê û afirînkare wî jî jin e; stran û kilam bêhtir berhemên wan in. Yeke din jî bi ya min ji serdema bavkanî û vir ve, di civaka me de ya ku zêde tehde lê hatiye, pêşiya wê hatiye girtin û xwederbirina wê, xweîfadekirina wê hatiye astengkirin jî jin e û wêjeya devkî jê re bûye qada xwepêkanîna jiyanê; ev der jê re bûye qada ku raz û xwestek, xeyal û hestên xwe bide der, bîne ziman, bûye qada ku lê rihet, xweş û serbest bipeyve. Dîsa; jin dil-birehm e, zû kezeba wê diêşê, dilşewat e, li hember bûyeran zêdetir hestiyar e; lewra dê ye, xwişk e û ya herî girîng jî evindar û dil-bikul e. Ya ku qedrê evînê zêde dizane ew e. Mêyîtî bingeha hestiyarî, dilşewatî û dil-birehmiyê ye, ji hovîtiyê dûrketin e. Ji ber ku

dil di aliyê çepê de ye, havênê çepgiriya di dil de dimeyê û dil mê û her dil dilê jinê ye, dil jinî ye, dil mêyî ye. Ev jî pêrîçûyina mirovbûnê ye.

Di rewşa serhildêrî û têkçûnên serhildanên Kurdistanê de gelek raz û sembol afirîne ku bûne bingeha derûniya civaka kurdan. Wek di strana **“Bavê Lalo”** de awaza, *“Ez nakevîm ber kuştina Bavê Lalo, kuştin karê mêra ye. Lê destên çolix û çoxixên Bavê Lalo xistine kelemça lingê wan dane qeydan, berê wan dane hepîsxana Qerepêtê (Xerpê) û qûnbicilikên cendirma bi qûndaxan li wan dixin, dibên ‘de haydê kurdo yûrî’, mala min...”* Di vir de welatparêziyeke xurt ku mirov dikare bibêje dendika welat-perwerî û niştimaniyê ye heye. Heskirina axê û welêt bingeha vê ye û ji dil difûre bi zar û dilê jinê. Hêjayî gelek lêkolîn û şiroveyan e. *“Haydê kurdo yûrî”* û *“Qûnbicilikên cendirma”* ne hestên ji rêzê, eşîrî û malbatî ne. Nirxandina vê fireh û mijara nivîseke din e û hêjayî lêkolînên civaknasî ye.

Dîsa di strana **“Seyitxanê Kerr”** de awaza, *“Berê tivingê xwe nedin eskeran ew guneh in, lawên xelkê ne, çavê dê w bavên wan li riya wan e, berê tivingên balçîqan bidin yûzbaşî û bînbaşîyan û ritbeliyan, şewqeyên wan bigindirînen binê di bestan e...”* Di vir de bîrûbawerî û hestên gelerî yên kûr hene. Ji gel, xizan û feqîran heskirin, ku di şer de, di heyamên mirin û jiyanê de tê der, wiha tê ziman, mirov diheyirîne. Ka xwedêgiravî kurd **“hov”** bûn! Ji aliyê çî-nayetiye bigirin heta mirovhezî, yanî hû-manîstiyê gelek tîrêjên derûnî, zanistî yên mirovahiyê hene di vir de. Wek ku Xaniyê pîroz tovê mirovahiyê di dil û mêjiyê civaka

xwe de di kûr de û xweş çandibe, beriya Şoreşa Frensî ya bi nav û deng ku rojavayî pê difirin! Îro jî lehengên Zagrosan bi bingeha mirovheziyê têdikoşin û weke bav û kalên xwe heta ku ji wan tê ji kuştina lawên gel û gelan direvin. Bi bîr û baweriya rojê û civak-parêziyê, bi sebr û qinyata axê, ew axa bingeha mirovahiyê ya Heyvika Bibereket jiyanê dirêsin li ser asasê Komageneyî. Li ser van mijaran lêkolîn karê beşên zanîngehan ên civaknasiyê ne. Em bêheq nafikirin û nabêjin ku ev civak havên û hevîrê mirovahiyê ye.

Wexta mirov li strana **“Gulê Mahrûmê”** guhdar dike; hîs dike ku hesreta welêt jê difûre. *“Lê lê Gulê mahrûmê welat welatê me dûr e, bêtî te li xerîbiyê ez ê sebra dilê xwe b’ kê bînim”*. Êşa xerîbî, xizanî, bindestî û koçberiyê, deranîna rewşa xweza û çiyê di vê stranê û yên mîna wê de mirov mat dike. Tu destanbêj nikarin avê li destê vê hunerê û huner-mendê/a wê bikin. Vê nîgar û nexşê hestê mirovan kelandine û heyranî di dilan de kûr kirine. Bêheq em ne evîndarê çiyê, mêrg, deşt, berî û zozanan in. Tew wersiyona Leyla û Mecnûn **“Leyl û Mecrûn”** şahê berheman e, çi fêde bişaftinê wek ku em ji gelek gencîneyan mehrûm kirine, ji vê jî bêpar kirine. Bi qasî ku çend xetên wê tîna bîra min, ew bixwe çirûskên feyzê ne; *“Mecrûn xulamê mala Leylê ye, kar û barê wan dike, xizmeta mêvanan jî lê ye. Rojekê mêvan gelek tîna Mecrûn ji hal de dikeve. Meseleye ya, li ciyekî dalde serê xwe datîne ser çoka Leylê û di xew de dere, ji evîn û hesreta kûr encex piştî heft salan şiyar dibe û li mêvanan dipirse. Bersiv ji Leylê ye;*

*Lolo Mecrûno, Mecrûnê rîkurisî
Cedas di qula guh de reqîsî
Pezê me çûye zozana
Bexê me bûne berana
Keçê me bûne keybanûyên dîwana
Tu hê dipirsî li halê mêvana...”*

Yan jî dewlemendiya vegotina **“Bajarê Mixurbê”** ya di destana *“Memê Alan û her wekî dinê de...”*

*“Dilê min liyan e
Bajarê Mixurbê bajarekî pir giran e*

*Li ser heft çiyên e
Li ser sêsed û şêst û şeş deriyan e
Her derî li ser sêsed û şêst û şeş mihelan e
Temam di destê Elî Begê, Emer Begê, Elmaz Begê de ye sê bira ne
.....”*

Ev wersiyona devkî ya herêma me bû, dîrêjiya wê hêjayî lêkolînê ye, dewlemendiya vegotinê mirov li erd û ezman digerin, jiyanê nû û bêhempa dide sêwirandin û sînoran ji xeyala mirov radike, nêrîn û ramana mirov, bêhna mirov fireh dike. Hebûnê pîroz û fireh dike. Yê ku ji bîra me hatine şûştin jî tiştêkî dinê...

Ka em ê awaz û bingeha felsefeya Feqiyê Teyran a di **“Şêxê Senan”** de çawa şirove bikin! Di wê demê de dibe ku bûyereke wiha çêbûbe û bûbe kilam an jî helbest, lewra Melayê Cizîrî jî behsa wê dike; di helbesteke wî de weke îmge û bibîrxistin derbas dibe. Di wê demê de şewreke wiha, hest û ramaneke wiha ji aliyê hestên mirovahiyê ve hêjayî pesinandin û teqdîrê ye. Ev kamîlbûna hestên mirovahiyê ne ku îro em li wan digerin û ku îro şerên olî mirovahî dabin bin lingan, qedrê vê şewrê hîn bêhtir giranbuha ye! Ev jî mijara lêkolîn, lêgerîn û nixandîna ye. Erê, **şêxê misliman** dibe evîndarê **keça fileh**, evîndarê rehîbîka fileh û her tiştî dide ber lingan lê bi mirovahî difire qata heftan a ezmanan di wî qirnî, di qirnê 17’an de û li vê xakê û li vê civaka ku îro mirovahî qedir nadê û têkoşîna wê ya ji bo nixên însanî weke terorî dibîne!

Ev bûyer, ev vegotîna vê evînê mînaka bînfirêhî, xweşbînî û qedirdayîna civaka kurdan a evîn, heskirin û hestên însanî ye ku îro pere û berjewendiyan ew ji wîjdanê mirovan paqij kiriye, Xwedêgiravî mirovên modern, ên kamîl, ên hemdem û humanîst!

Ev demokratî, humanîstî û hêjadîtîna mirovê/î ye. Vêya jî derûnî û bextê mîrovê kurd kemilandiye, nexişandiye. Zordestî û mêtîngeriye ev herimandibe, ev tiştêkî din e. Lê her dem vê şewra li vê xakê cî û warê şên-hatinê dîtiye. Ji ber vê em dibêjin hest û derûniya mirovahiyê, mirovahî li ser vê xakê veşartî maye, divê em derînin ku tîrêjên rojê

maçeke pîrozî bide wan. Û divê em têkoşîna mirovahiyê ya Zagrosan hê jî xurt û fêhm bikin. Em qedrê wan milyaketan baş bizanibin, milyaketên hemdemî û yên herdemî...

Di stran û kilamên evînî de **dil, sing û ber, memik, cotên zermemikan, kilên siphani** û hwd. **serbest û bêsansûr** derbas dibin. Ev jî asta xweşbînî, xwezayî, mirovahî û humanîstiyê ye, ya dîlfirehiyê ye. Ji aliyekî ve jî îşareta nejiyandina van hestan e. Her çi be serbestî hestên wan terbiye û perwerde kiriye.

Ji aliyekî din ve jî evîna bédîl wek di strana **Xalê Cemîl** de jî tê dîtin nayê qebûlîkirin û tê şermezarkirin. Ev jî gihîştina hestên mirovahî û rewşa xweşgotin û rastgotina di civakê de ye.

Dîsa têgihên mîna **çarika wê bi ser çavê wê re şer dikir, çarika wê bi xavika wê re şer dikir** (ji bo xweşîkî û lihevhatin û bedewiya jinê), **kezîkurê, porkurê, porkurê por nemayê, desmalsorê gewrê, kirasmelesê, bejindarê, bejin ji taka rihanê** û hwd. geşiya wêjeyê ye. Cîdayina têgih û îmgeyên razberî yên li gorî rewşa jiyanê, radêya mantik û felsefeya civakê ya şiroveya jiyanê û asta berziya hest û ramanên civakî û bilindiya asta wêjeyê ye. Em dikarin bibêjin ehlaq, bastan û têkiliyên jiyanî wiha afirîne.

Di stranên evînî de têgiha, **"Evîna te ji dil dernayê û ez te ji bir nakim ger ku xwê şîn bibe û qantir bizê"**, hêjayî nirxandinê ye. Li vir nemimkuniya devjêberdana evînê tê bilêvîkirin. Girêdaneke bêhempa bi zarê evînî û bi şibandîna xwezayî tê ser zimên. Ji felsefeyeke kûr jî ne bêxeber e, ji wir xwedî dibe. Hilbet xwê şîn nayê û qantir nazê, lê ku wisa bibe jî, soz tê dayin ku wê dev ji evînê û dildarê/î neyê berdan. Ev bûye hişmendiyeke di civakê de xwedîsozbûn, duristî û bi bîrûbaweriyên ve girêdan. Ligel hemû dejenereyan, ligel hemû jirêderketinan ku bi zordariyeke erjengî bîra me ya civakî hatibe şûştin, paqijkirin jî, tîrêjen van helwestên xweşmîrovî di civaka me de diçirsin. Ev tovên hêja îşaretên hişmendiyeke hevpar ên civaka me ne û li hêviya meyardineke fîlozofî ne û îşaretên

vê jî hene. Bi ya min ev hîmên baweriya Zardeştî ne ku rehên wê hê jî di kûr de ne.

Dema ku hewî tê ser yekê, yan ji malê hinekan ji wan bi fen û fûtan tê stendin û keda wan bi avê de dihere, tew ku welatên wan têkeve bin serdestiya biyaniyan û ew ji bihuşta xwe bêpar bin; ev dibe awaza, **"Min li binya mala baxçe danî, gul û rihan tê de danî, bi dest û milan av jê re anî, bi hisret û evîn ew kir banî û guriyek ji wê de hat ez dehf dam û tew got de here ez xwedî me wele tu cenan î..."** şirove û dîtina derûniya vê ya li ser civakê qet ne zor e.

Yekî ku bikêrhatî be, jîr be di civakê de ku karên qenc kiribe û keda xwe tev dabe biyaniyan, serdestan û pariyek nan nedabe gelê xwe, civaka xwe, (mînakên dîrokî jî hene; Silhedînê Eyûbî û hwd...) ew dehf dabe, dibe awaza kesereke kûr di kilaman de û bang dike, **"Dehwedaro di ber xelkê de."** Dilêş û kezebraşiya ku reşika çavên me hûr kiriye û cawê me bêqîmet kiriye ev e. Ev bûye sedem ku li newala bêbaweriya bihevre me daye peykeriyê xelkê û barê me tim li erdê ye. Ji lewre gazin û minet her taştê û firavîna me ye. Bi pi-



ranî hê jî em **"Dehwedar in di ber xelkê de!"**

Newroz; mijareke kûr e. Girêdayî mîtoljiya rojê û agir ev bûye hîmê me yê esasî. Him di destan, stran û kilaman de û him di çîrokan de û him jî di hişmendiya civakî de ciyekî Newrozê yê cuda û girîng heye. Em dikarin bibêjin ku hevîrê civaka kurd bi Nerwozê hatiye strîn. Hevîrtirşê hevîrê me ev e. Strangotin, stranbêjî û hevîrstrandin bêheq ne cîran û cewiyê hev in.

Ji ber ku ziman û peyv şîroveya hebûn û jiyane ne û hebûn jî ji tarî û ronahiyê pêk tê, roj û agir, tîrêj û tav bûne ziman, peyv û asasê hişmendiya civaka me. Rewşa Newrozê, mijara lêkolînên fireh û mijara nivîsên awarte ye. Li hember zordarî û neheqîyan serhildan û têkoşîn, lixwexwedîderketin "rojêk nû-nû roj-New roz" Newroz e. Destpêka jiyane Newroz e, ji ber vê sersal e. Giyanîbûna xwezayê ye di serê demsalan, di demsala canlîdar biharê de, Newroz e. Çar hîmên hebûnê hene; ax, av, hewa û agir, ji ber vê çar demsal hene û ev bi biharê û di biharê de jî bi adarê (av diçe darê yan jî agir-adir-adar...) dest pê dike û dibe hêvî, ruh û jiyana lehengên Newrozê û ev ji kurdan, ji bindestan re despêka jiyane, deriyê hebûn û jiyane ye, rojeke nû ya azadî û serbixwebûnê ye, Newroz e. Mizgîna Kawa ye û lewra êlekê wî al e; kesk û sor û zer e û nîşana serfirazî, rûmet û hêjayiyê ye bi hezaran salan ji kurdan û cîranê wan re, Newroz e. Û dibe awaz;

*"Bihar xweş e çaxê gulan
Çaxê kulîlk û simbilan
Newroz û sersala dîlan
Kengî bi xêr wê (tu) bê bihar..."*

Û rengê folklora me ye Newroz; ya derûnî, ruh û jiyane. Jiyana me...

Aliyekî neyînî yê wêjeya devkî jî bi ya min, stran û kilamên şer ên dijminantiya azbet, eşîr û kesane. Ev bûye sedema parçebûna civakê û pêşiya yekîtiyê girtiye. Şerê kozikan ên li hemberî yê jî civaka xwe re bûye kurme darê, bûye bêtifaqî û bûye kurme hestên netewî ku îro em pir êşê jî ber dikişînin û her tim hev dikojin. Deriyê edoqewmîyê bi vana û

wiha vebûye. Rantxurî, li pey geza nan koletî û hêşîrî, xweparastin û tenê li mala xwe, az-beta xwe, eşîra xwe fikirîn ku zêde zêde xisar daye me û hê jî dide û di civaka me de ev pir li pêş e jî...

Dawiyê ez dixwazim balê bikişînim ser du stranan û rexneyekê bi lêv bikim. Dengbêj carinan resenî û xweseriya stranê diguherînin, ev jî wêjeyê bêitibar dike û dixwe rewşa ketberiyê. Strana **"Hesenê Mala Mûsa"** ji aliyê hinek dengbêjan ve wek **"Ehmedê Mala Mûsa"** tê strîn. A rast **"Hesenê Mala Mûsa"** ye. Bûyer li gundekî (ku ez ne şaş bim, Biloka ye) li herêma Dêrika Çiyayê Mazî ya Mêrdînê pêk hatiye û di hişê mirovan de zindî ye. Mamoste **Adar Jiyan** vê meseleyê qenc dizane û di pirtûka xwe ya bi navê **Seyrê** de ev li ser navê **"Hesenê Mûsa û Hedoka Qaso"** nivîsiye jî. Dîsa strana **"Bavê Fexriya"** wek **"Bavê Fexrî"** tê strîn. Kalê min dengbêj bû û min ji gelek dengbêjen kevn jî (emrê min **şêst** e) guhdar kiriye, Bavê Fexriya paşê bû Bavê Fexrî. Ji bo rêzdayinê ez dibêjim baldarî pir girîng e ku reseniya hunera me xera nebe. Yeke dinê jî; stran û destana **"Siyabend û Xecê"** li herêma me bi awayê **"Siyabendê Silivî û Xeca Birîvî"** tê/dihat strîn. Silivîa tê zanîn, Birîva jî li herêma Stewrê herêmeke ku dikeve navbera Stewrê û Hebizbiniyaya herêma Torê ku gundek jî bi vî navî li heman herêmê heye. Ji heman herêmê re Dêlevera jî tê gotin. Divê ev rewş û zanîn bê vekolandin. Belkî her destan li gorî herêman teşe digire û ev nîşana afirîneriyê ye, bikêrhatina wejeyî ye. Her destan û strana wê, nîşana gelemperî û parvekirina hişmendiya gelî, gelitî û tovên hestên netewîtiyê ye, nîşana hemramaniyê jî... Ev mijar li benda lêkolînên civaknasiyê ye.

Wêjê û ilim jî wêjeya devkî, mirov dikare bibêje havênê hişmendiya civakî ye. Hebûna civakê ya civakî distrê.

Mirov dikare wêjeya kurdî ya devkî ji gelek hêlan ve vekole û şîrove bike. Lê mijara vê nivîsê perwerdehî û perwerdekirin e. Kîjan raz û sembol ji bo perwerdehiyê hatine bikaranîn, bandora wan a li ser kes û civakê çawan e, em ê li ser vê yekê bisekinin û bi riya

Ji aliyê perwerdehiyê ve wêjeya devkî

Serwet DENÎZ

Di çîrokên kurdî de birayê biçûk her tim serkeftî ye, piştî gelek zorî û zehmetiyan digihîje armanca xwe, yên mezin ne serkeftî ne yan çavê wan li dek û dolaban e yan jî xayîn û zilimkar in

çend mînakên mijarê zelal bikin. Berî ku ez derbasî mijarê bibim ez ê der heqê perwerdehiyê de hinek bîr û ramanên xwe vebêjim.

Perwerdekirin taybetiya mirov e. Mirov xwe û yên derdora xwe perwerde dike. Ji bo jiyana komî û pêşveçûnê û têkoşîna li hember xwezayê perwerdehiyê pêdiviyek e. Ku jiyanekê komî hebe, pêdivî bi pîvan û rêgezan jî heye. Danûstendinên nav komê li gor hin pîvanan pêk tên. Jiyana komî hin berpirsiyariyan dide ser milên kes. Ji bo ku kes bi rê û rêçikên jiyana komî bizanibe û ji berpirsiyariyên xwe haydar be divê bê perwerdekirin. Ango pîvan û rêgez jê re bîr ragihandin jê re bîr gotin. Ev yek bi xwe jî perwerdekirin e. Gelek rê û rêçikên perwerdekirinê hene. Her civak li gorî pêdiviyên xwe û çanda xwe endamên xwe perwerde dike. Ev perwerdekirin dibe ku di nav jiyana de bixweber pêk bê û dibe ku pergaleke xweser hatibe avakirin.

Armanca perwerdekirinê çî dibe bila bibe, ew rasterast mudaxelekirina kesayetiye ye. Teşedayîn e, beralîkirin e. Bêguman ev jî li gor hin berjewendiyan e. Ev berjewendî dibe ku yên civakê bin û dibe ku yên komeke ji civakê bin an yên komeke pir teng a desthilatdar bin. Ev kom dibe ku avaniyeke civakî (hoz, bavik, malbat) be, dibe ku komeke siyasî be û dibe ku komeke berjewendiyên aborî an jî wekî din be.

Her perwerdekirinek bi xwe re

desthilatdariyekê derdixe holê an jî desthilatdariya heyî xurt dike. Ku li derekê hinek-komek wek zana û hinek nezan hatibin binavkirin, ne pêkan e ku di navbera wan kes û koman de wekhevî hebe. Wê mêzîn her tim li aliyê zana xwar bibe. Yê stendox her tim muhtacî yê dayox e. Mecbûr e ku ji wî/ê bixwaze. Xwestina zanîne di heman demê de pejirandina serdestiyê ye. Di hiş de avabûna vê hevsengê avabûna desthilatdariyê ye jî. Mezin zarokan perwerde dikan, zana nezanan perwerde dikan. Mezin û zana girêdidin, zarok û nezan tên girêdan.

Dibe ku bê gotin nêrînên te yên derbarê perwerdehiyê de wiha bin tu çima der barê perwerdehiyê de dinivîsî. An jî gelo aliyên perwerdehiyê yên erênî tune ne? Rast e wek nakokî xuya dike. Lê ev nakokiya jiyana ye. Tevî ku rastiya perwerdehiyê wiha ye jî rewşa heyî perwerdehiyê ferz dike. Yên serdest bi vê rêyê desthilatdariya xwe xurt dikan. Em kurd jî mecbûr in ku pergaleke perwerdehiyê ava bikin. Heta niha pergaleke me tune bûye. Bi rêya wêjeya ya devkî ragihandina navbera nivşan pêk hatiye. Peyam bi piranî bi vê rêyê hatine hinartin. Lê îro em mecbûrin pergaleke ji ya serdestan xurtir ava bikim. Ku ne wisa be dagirkeriya wan a hişmendiye ji holê ranabe ku dagirkeriya hişmendiye ji holê ranebe, dagirkeriya giştî qet ji holê ranabe.

Me got gelek rê û rêçikên perwerdekirinê hene. Yek ji van rêyan jî wêje ye. Çî wêjeya devkî çî jî ya nivîskî. Peyamên ku bi rîya

wêjeyê tîn dayîn carinan ji yên perwerdeya rasterast bi bandortir in. Berhemên ku ji bo perwerdehiyê bi awayekî nivîskî (pendname û hwd.) hatine amadekirin jî gelek in. Ji ber ku ne mijara me ye em ê li ser wan nesequin. Lewre mijara me wêjeya devkî ye. Di berhemên wêjeya devkî de jî armanca perwerdekirinê heye. Ev perwerdekirin bi riya peyama û raz û sembolan pêk tê.

Lê li vir jî ez ê mijara xwe bi sînora bikim û di ser hinek tiştan re gavbidim. Lewre di vê mijarê de gelek nîqaş hene. Ber û berhemên wêjeya devkî çîrokê destan û hwd. jî bo perwerdehiyê baş in an na? Di perwerdehiya nûjen de çiyê wan çi ye? Bandora erênî û ya neyînî ya li ser derûniya kes û bi taybetî jî ya zarokan? Cihê pend û şîretan di perwerdehiyê de? Gelek pirs û nîqaşên bi vî rengî hene. Lê ez ê di vê nivîsê de li ser van mijaran jî neseqim. Ez ê aliyên erênî yên ku hêviyê xurt dikin, hêzê didin kes û zarokan bigirim dest.

Di çîrokên kurdî de birayê biçûk her tim serkeftî ye. Piştî gelek zorî û zehmetiyan digihîje armanca xwe. Yên mezin ne serkeftî ne yan çavê wan li dek û dolaban e yan jî xayîn û zilimkar in. Bi awayekî mal û milkê yê biçûk jê distînin, wî jî ser av û axa wî dikin der, berê wî didin riya çûnehatê. Dêmarî her tim zilmê li zarokan dike. Lê zarok rêyekê dibînin, derfetina bi dest dixin û tolê jê distînin. Keçika ku bêbextî pê re hatiye kirin di dawiyê de rastiya bûyerê dide fêmkirin. Keçelokê pîrê dibe wezîr an jî padîşah. Noko çiqas biçûk be jî bi dengê xwe yê berz xwe diparêze û kesên niyetxerab

ditirsîne. Mînakên bi vî rengî gelek in. Em ê vana jî aliyê perwerdehiyê ve çawa şîrove bikin.

Zarok bi xwe biçûk in. Bêhêz in, ji aliyê fizîkî ve lewaz im. Bi tena serê xwe nikarin xwe biparêzin. Gelek xetere li pêşiya wan in. Bi piranî pêkutî li ser wan heye. Kes gotina wan guhdar nake. Civak zêde wan bi tiştêkî hesab nake. Dixwaze li gor pergala û bîr û baweriyên heyî wan bixe nav qaliban,

kirasekî bi dilê xwe li wan bike. Di rewşeke wiha de wê zarok çawa bi xwe bawer be? Hestên ewlehiyê wê çawa pê re çêbibin? Ji bo pêşerojê wê çawa hêviyan mezin bike? Mînakên ku me li jor dan ji van pirsan re dibin bersiv. Wek; birayê biçûk her tim serkeftî ye. Ew û zarokê/a ku li çîrokê guhdar dike an jî dixwîne di heman rewşê de ne. Zarok rewşa xwe dişibîne rewşa wî. Di navbera lehengê çîrokê û guhdêr/xwîner de têkiliyeke hestî dest pê dike. Serkeftina birayê biçûk serkeftina zarokê/a guhdêr/xwîner e. Di dawiyê de ev raman di hişê zarok de pêk tînin; ku birayê biçûk bi ser ketibe ez jî dikarim bi ser bikevim. Lewre ew jî wek min biçûk e û bi ser ketiye, biçûkbûn li pêşiya serkeftinê ne asteng e. Piştî ku zarok vê peyamê digire, di hişê xwe de dinirxîne, erê dike, jê hez dike û ji xwe re dike bawerî. Piştî vê pêvajoyê jî bo xweparastinê dibe xwediyê hinek amûrên hizrî. Zarokî/ê encamek bi dest xistiye. Ev bi vî rengî jî bo derûniya zarokî/ê pir girîng e. Baweriya zarokî/ê ya bi wî/ê xurtir dibe. Bi çavên hêvîdar li dahatûya xwe dinihêre.



Kêfxweş dibe. Bi riya raz û sembolên bi vî awayî ji aliyê hizrî û hestî ve zarok tê xwedîkirin.

Çîroka Noko bi xwe jî ji bo rewşa zarokan mînakeke baş e. Dibêje; *dibe ku tu biçûk û bêhêz bî lê bi xwe bawer be serî li ber astengiyan netewîne, tu yê bi ser bikevî.*

Tenê zarok bi van raz û sembolan nayên perwerdekirin. Kesên mezin û gihîştî jî tîn perwerdekirin. Keçelokê pîrê kesekî jar û xizan e. Di nava civakê de ne xwediyê tu rûmetê ye. Kes zêde ji rewşa wî ne haydar e. Lê roj tê felek jê re dibe yar û di pêlikên jiyane de hildikişê herî jor. Awayên wî yên biserketinê û dewlemendbûnê derasayî ne. Û dibe ku berê mirovan bide hinek xeyalên eletewş lê di vir de peyama bingeîn ev e; *hêviya xwe xurt bike, dev ji têkoşînê bernede, tu yê ji vê rewşê xilas bibî, tu ne mehkûmê vê qederê yî.* Di civakê de gelek mirovên bindest jar û perîşan hene. Bi gelek astengî û pêkûtiyan re rû bi rû ne. Ev mirov dixwazin ku jiyana xwe bidomînin û ew jî bibin xwediyê hinek derfetan. Lê şert û mercên wan rê nadin an jî kes û komên serdest vê derfetê nadin wan. Di rewşên wiha de pêdivî bi hêviyê heye ku ne hêvî be ew mirov nikarin li ber xwe bidin û di wan şert û mercan de bijîn. Gava ku hêvî bimire an mirov jî bi hêviyên xwe re dimire an jî dibe koleyekî/e ji rêzê. Çîrokên ku qala serkeftin an jî dewlemendbûna jar û xizanan dikin hêviyên mirovan zindî dikin. Roniyekê nîşanî wan didin. Ev roleke girîng e.

Peyameke din jî girêdana bi armancê ve ye. Di çîroka bi navê teştro de keçik ji bo ku bigihîje armanca xwe pêşiyê dibe kevok, dûre tê serjêkirin û xwîna wê diniquite erdê dibe dar, darê dibirin dibe dergûş, dergûşê dişewitînin lê dîsa jî ew di darê nîvşewitî de xwe diparêze û dawîya dawîn dîsa dibe keçik û digihîje armanca xwe. Û di vê pêvajoyê de her tim tîrsa wê di dilê ya dijberî wê de ye û wê aciz dike.

Ji bo vê mijarê gelek mînak hene. Lehengê çîrokê ji bo ku bigihîje armanca xwe, heft qatan dadikeve binê erdê, bi qasî ku dinya wek qula derziyê xuya bike bilind dibe, diçe ji

reşik û tarî derbas dibe, heft deryayan derbas dike, diçe pişt heft çiyayan, bi dêw û heyberên dirinde û xeternak re şer dike, di pişt heft deriyên hesinî de tî û birçî dimîne, berê aş ê ku ne pêkan e bi hêza mirovekî ji ciyê xwe bileqe didin ser an jî ber devê şkeftê, di karên herî zor de dixebite û dawîya dawîn digihîje armanca xwe. Ev tev peyama û sembolên têkoşînê û girêdana bi armancê ve ne. Bêguman mînakên ji bo vê mijarê heta bê xwestin zêde ne.

Me ji fablan mînak nedan lewre armanca fablan rasterast perwerdekirin e û di dawîya çîrokê de teqez pendek, balkişandinek, şiyarkirinek heye.

Wek encam ku mirov bibêje; raz û sembolên ku di berhemên wêjeya me ya devkî de hene ji bo perwerdekirina civakê xwedîrist in. Ên ku ew peyama honandine û di bin hişê me de bi cih kirine xwestine tiştêkî ji civakê re bibêjin. Xwestine ji nîfşên dû xwe re bibêjin ev bûyer hatin serê me hişyar bin bila neyên serê we jî. Hinek tişt hene ku bi hêsanî bi dest nakevin ji bo wan divê hûn kedê bidin, xwêdanê birêjin. Li hember zorî û zehmetiyan li ber xwe bidin. Nirxên civakî wisa bi rihetî dernakevin holê. Me ev nirx afirandin hûn jî biparêzin. Bizanibin ku çi hatiye serê pêşiyên we. Gelek peyamên bi vî rengî hene. Armanca ragihandina van peyaman jî perwerdekirin e.

Ji bo ku perwerdehiyeke nûjen pêk bê û wek civak em ji bin nîrê hişmendiya serdestan derkevin divê em li rabirdûya xwe vegerin û tiştên kêrhatî bixin xizmeta avakirina hişmendiya nûjen û azad a civaka xwe. Bi gotin û bîr û baweriyên hinekî din em nikarin birîna xwe derman bikin.

Min dixwest

Menaf OSMAN

Min dixwest,
Ji berbangê şêrîna şewqê.
Ji pozbilindiya çîyan jî pêlên raperînê
Bigihînim çavên te.
Min dixwest,
Ji biharê. rengê gulan
Ji çiçekan jî bêhn û rûdan
Bigihînim ser dêma te.
Min xwest,
Ji rokê. agirê pîroz
Ji demborîna me jî
Bîranînên meyandî bi ava evînê
Bigihînim dil û hinavên te.
Min dixwest, ez
rûmetê.
Evînê.
Eşqê bigihînim ser lêvên te.
Min dixwest ku
Bi tazîbûna xwezayê
Te hîndarî kufrê.
Hovîtiyê.
Û Azadiyê bikim.
Lê mixabin
Ez bi ser neketim
Ji ber ku -xatûna min-
Tenê raperîner
Raperînê dinasin.
Tenê kafir,
Kufrê dinasin.
Azadî jî şûreke
Tenê di destê azadîxwazan de
Dibire...

Bihar-2002 / Dîlok

RAST E! — BIHÊRS — gelek, gelek zêde bihêrs bûm û bihêrs im; lê, çima hûn dibêjin ku ez dîn im? Nexweşiyê hişê min tûj kiribû — ne herifandibû — kor nekiribû. Ya jî hemûyan muhîmtir, hişê bihîstina tûj (tûjbihîstinê) bû. Min hemû tiştên li erd û esmanan bihîstin. Gelek tiştên li cehenemê bihîstin. Çawa, vêca, gelo ez dîn im? Guhê xwe bidê! Û bibîne ka ez çendî bi maqûlî — çendî bi rihetî çîrokê jî serî heta dawiyê kat dikim ji te re.

Dilê çîrok-bêj

Edgar Allan POE

Niha wext e; hûn hizir dîkin ku ez dîn im, dîn çu tiştî nizanin, lê diviya ku we ez bidîtima, diviya we bidîta ka ez çendî bi hostatî pêş ve diçûm –çendî bi hişyarî û deqîqî- û çawa bi dizî çûm ser kar!

Ez jî hîç nizamim ka cara pêşîn ew fikir çawa hat bîra min; lê piştî ku ket serê min, êdî şev û roj li serê min dida û hîç ji bîra min dernediket. Ne ji bo mal û pere bû. Waz û hewes jî nebû. Min hez ji pîremêrî dikir. Qet bédiliya min nekiribû. Çu caran xerabiya wî negihîştibû min. Çavê min hîç ne li zêrên wî bû. Ez dibêim qey çavê wî bû! Belê, çavê wî bû! Çavekî wî mîna çavê bazekî hov-- çavekî şînsivîk û perdeyeke zirav û xul li serê. Çi gava ku ew çav diket ser min, xwîna min dicemidî û lewma roj bi roj –pê de pê de- ez gihîştîm wê biryarê ku ruh ji pîremêrî biçikînim û bi vî awayî heta hetayê xwe ji wî çavî xelas bikim.

Niha wext e. Hûn hizir dîkin ku ez dîn im. Dîn çu tiştî nizanin. Lê diviya ku we ez bidîtima. Diviya we bidîta ka ez çendî bi hostatî pêşve diçûm –çendî bi hişyarî û deqîqî- û çawa bi dizî çûm ser kar! Ez çu caran li hemberî pîremêrî, qasî wê hefteya berî ku wî bikujim baş û nazik nebûbûm. Û her şev, dora nîvê şevê, min fêrîşa deriyê wî badida û vedikir –erêê, hêdîka! Û paşê, gava ku min navbereke têra serê xwe çêdikir, min fenereke tarî bi cih dikir, giş vemirî, vemirî, ku piça ronahiyê jê nediweşiya û paşiyê min serê xwe pal dida (didehfand). Wehh, keniya we dê bihata heke we bidîta ka min bi çi fêlbaziyê serê xwe paldida! Min serê xwe hêdî hêdî dilivand- hêdî, pir hêdî, wisa hêdî ku xewa pîremêrî têknedim. Saetek wextê min pêve çû heta ku min tevahiya serê xwe li navberê bi cih kir da ku wî di nav nivînan de dirêjkirî bibînim. Haa! – tu bêjî ku dînek dê ew qas zana bibe? Û paşiyê, gava ku serê min bi temamî di nav odeyê de bû min bi hişyarî

fenêr pêkir,-hêdîka – pir bi hişyarî (ku qirçîn ji menteşeyan hat) – min fenêr bi tenê ew qas vekir ku hebek tîrêja zirav kete ser çavê bazî. Û heft heşt şevên dirêj min ev karê hesas dubare kir – her şev dora nîvê şevê – lê min her gav çavekî girtî didît; lewma ne mimkun bû bigihîjim armanca di dilê xwe de; çînkû ne pîrêmer bû tiştê ku ez şerpeze dikirim, ÇAVê wî yê Şeytanî bû. Û her sibeh, dema ku roj hildihat, ez bêxem û bêtirs diçûm odeya wî û bi rihetî pê re diaxivîm; min bi dengê jidil û bi navê wî xîtabî wî dikir û dipirsî ka şeva xwe çawa bihurandibû. Wa ye hûn dibînin, bi rastî diviya ku ew pîremêrekî pir serûhiş bûya da guman bikira ku her şev, durist di dozdehan de, dema ku ew dinivist min çavên xwe li wî dikutan.

Di şeva heştê de, dema ku min derî vedikir, ji rojên berê hişyartir bûm. Reng e destê min ji tîrika saetê ya deqîqeyê jî hêdîtir hereket dikir. Heta wê şevê ez qet bi gewretiya qudreta xwe nehesiyabûm –pê nehesiyabûm bê ez çendî jîr bûm. Min pir kêman caran hay ji hestên xwe yê serkeftinê dibûm. Fikra ku ez li wê derê, derî vedikim, misqal bi misqal; û ew, kirin an fikrên min ên nediyar di xewnê de jî nebîne. Li pêş vê fikrê ve qît qît girnîjim û belkî wî ez bihîstîm ji ber ku wek ku bizdiyabe, ji nişkê ve di nav nivînan de liviya. Niha hûn ê bêjin ku ez vekîşiyam – lê na. Odeya wî, bi tariya kesîf reş bû mîna qîrê (çînkû ji ber tîrsa dizan, der û pacyên wî gelek qahîm girtî bûn); lewma min dizanibû ku wî nedikarî vebûna derî bibîne û min hêdî hêdî derî palda.

Serê min di hundir de bû û tam min dê fenêr pêkira ku paniya min li ser zemîna teneke xuşiya û pîremêr ji nav nivînan

pengizî; bi qîrîn — “Ew kî ye li wê derê?”

Ez bêliv mam û min tişteke negot. Saeteke tewaw min masuleyek jî nelivand û di heman demê de min nebihîst ku ew xwe dirêj dike. Hêj di nav nivînan de rûniştî bû û guhê xwe bel dikirin; — tam wek ku min kiribû, şev ser şevê, guhdarîkirina saetên mirinê yên li dîwêr.

Paşiyê nalîneke sivik hat û min zanibû ku ew nalîna sawa mirinê bû. Ew ne nalîneke êşê yan a kulê bû — ne, ne! — ew dengê nizm ê xeniqî bû ku dema mirov ji tirsan dibizde ji binê rih tê. Min deng pir baş dinasî. Gelek şevan, tam nîvşevan, dema hemû dinya di xew re diçû, eynî ew deng ji kûrika sîngê min radibû û bi olana xwe ya tirsna her kûrtir dibû. Min got ku min deng baş dizanibû. Min dizanibû ka pîremêrî çi hest dikir; û her çend qît qît pê dikeniyam jî dilê min pê disot. Gava ku xwe di nav nivînan de bada min zanibû ku ji dengedengê sivik ê ewil ve ye hişyar bû. Tirs a wî ji hingî ve ye her mezintir dibû. Wî hewl dabû ku tirs a xwe belasebeb bibîne, lê nikaribû. Wî ji xwe re gotibû — “Çu nîn e, tenê ba ye li baceyê — tenê mişk e ku li ser zemînê direve” an “tenê sisirkeke ku bes carekê cîriya.” Erê, ew pêve bûye ku dilê xwe bi wan ferzîkirinan rihet bike; lê wî dîtibû ku hemû bêçîne bûn. *Hemû bêçîne*; çinku Mirinê, ku nêzîkî wî dibû, bi siya xwe ya reştarî xwe li ber wî çeqandibû û dora qurbanê xwe pêçabû. Û, tesîra tirsna a siya muema bû ku bi wî dida hestîkirin — her çend ne dîtibe û ne bihîstibe jî — ku serê min di odeyê de ye.

Piştî ku ez demeke dirêj bi bêhnfirehî sekinîm, bêyî ku vezelîna wî bibihîzim, min qîrar da ku li fenerê şequeke biçûk — pir pir biçûk vekim. Lewma min ew vekir — hûn nikarin hizir bikin bê çi bi dizî ve, bi dizî ve — heta ku ji dûr ve, tîrêjeke şêlû, wek tevnê dapîroşkê ji şeque derçû û rast kete ser çavê bazî.

Vê carê vekirî bû — beş! — û her ku min lê nêrî hêrsa min bêtir azirî. Min ew bi rêkûpêkî didît — tev şînatîyeke şêlû, bi perdeyeke xul li ser, ku mêjiyê hestiyên min dicemidand; lê min nikaribû çu tişteki din li rû yan bedena

pîremêrî bibînim ji ber ku min tîrêja ronahiyê, wek ku bi pêjneke, durist xistibû ser xala lenetî.

Belê, qey min ji we re negot ku hûn di meseleya dînîtiyê de şaş in? Bi tenê zêdetîjiya hişan e. Ha ji we re, dengê hate guhê min ji wê derê, dengêkî nizm, şêlû, kurt, mîna dengê ku

saeteke bi pembû pêçayî derdixê. Min ew deng jî baş dinasî. Ew lêdana dilê pîremêrî bû. Wek ku lêdana daholekê cesareta leşkerekî zêdetir bike, wî dengî jî ez hartir kirim.

Lê hêj jî min xwe jê dûr diêxist û bêliv disekinîm. Min kêman caran bêhn vedida û fener bêbizav digirt. Niyeta min ew bû ku tîrêjê dirêjtir bi dizî li ser çavî bigirim. Di heman demê de lêdana cehenemî ya dilî zêde bû. Her kêliyê bileztir û bileztir, bidengtir û bidengtir bû. Tirs a pîremêrî divê ku qerase be! Bidengtir bû, dibêjim, bidengtir her kêliyê! — Hûn baş li ber dikevin bê ez çi dibêjim? Min ji we re got ku ez bihêrs im; û wisa me. Û niha, di vê gava şevê ya mirî de, li nîveka bêdengiya tirsna a vî xaniyê kevn, dengedengeke ewqas seyr ez xistim nav tîrêjê ku neyê zeftîkirin. Dîsa jî, min du sê deqîqeyên din jî xwe girt û bêliv sekinîm. Lê, lêdan bidengtir û bidengtir bû! Min got dil dê bipeqe. Û niha tîrêjê din ket dilê min — cîranekê dê deng bibihîsta! Qewlê pîremêrî tewaw bûbû! Ligel qîjeke xurt min fener avêt û min bazda nav odeyê. Tenê carekê qîriya — carekê bi tenê. Di dest xwe de min ew rakêşa ser zemînê û doşeka giran palda ser wî. Paşiyê, ji ber karê ku min heta hingî tewaw kirî, bi dilşadî bişirîm. Lê, heta çend deqîqeyên din, dilî, bi dengêkî kêmtir her lêdida. Lê vê ez neditirsandim; dê di dîwarî re nehata bihîstin. Heta bîstekê lêdan qut bûn. Mirovê pîr êdî mirî bû. Min doşek rakir û berê xwe da cendekî. Erê, mîna berê req û teq bû. Min destê xwe danî ser dilê wî û çend deqîqeyan li wê derê girt. Hîç lînedida. Rih lê biriyabû. Êdî çavê wî dê nerihetî nedabûya ber min.

Heke hûn hêj jî difikirin ku ez dîn im, hûn ê nema wisa bifikirin piştî ku ez ji we re tedbîrên ku min ji bo veşartina cendekî girtî

dibêjim. Şev çikiya û ez bilez dixebitîm, lê kerr û bêdeng. Berî her tiştî, min organên bedenê jê kirin. Min ser û mil û ling birîn.

Paşiyê min sê texte ji zemîna odeyê derêxistin û hemû xistin navbera kêranên zemînê. Paşiyê min texte ew qas baqilî, ew qas bi fêlbazî bi cih kirin ku çu çavekî mirovan — xwe yê wî jî — nikaribûn bi xeletiyekê bihesin. Li wê derê çu tişt nebû bête şûstin — ne deqek ne dilopeke xwînê an jî her çi tişteke. Ji bo wê hindê gelek hişyar bûm ez. Teşteke avê, ji hemû tiştên pîs der heq hatibû — *he! he!*

Wextê min ew kar bi dawî kirin, saet bûbû çar — hê jî tarî mîna nîvşevê. Dema zenga serê saetê lêda, teqteqa deriyê kolanê hat bihîstin. Ez bi dilekî sivik çûm jêr da ku derî vekim — ma çi hebû ku ez jê bitirsim? Sê mirov ketin hundir ku xwe gelek bi nazikî, wek polîs dan nasandin. Dora nîvşevê cîranekê qîrînek bihîstibû; û gumana cîneyetê lê kiribû; agahî gihîstibû ofîsa polîsan û ew ji bo sehkirina xaniyan hatibûn rêkirin.

Ez bişirîm, — ma min çi hebû ku jê bitirsim? Min xêrhatek li camêran kir. Qîrînek e, min gotê, ez bi xwe bûm, di xewê de. Pîremêrek e, min gotê, li gund nebû. Min hemû rexên malê bi mêvanên xwe dan gerandin. Min hêla ku ew seh bikin — *baş* seh bikin. Min ew birin odeya wî, dût û dirêj. Xizîneyên wî nîşanî wan dan, ewle, tînexebitî. Rabûm min ji peroşiya jixwebaweriyê kursî anîn hundir û pêşniyar kir ku li wir westa xwe bigirin. Û min bi xwe jî, ji bawerîya serkeftina xwe ya teqez, xwe li wî cihî danî ku di bin de cendekê qurbanî dirêj kirî bû.

Fermanber qayîl bûbûn. *Helwesta* min ew qayîl kiribûn. Ez bêhed rihet bûm. Rûniştin û ligel bersivên min ên şad wan behsa tiştên rojane kir. Lê hêj bêhnek tê ve neçûbû ku min wisa hest kir ku ez her mandîtir dibûm û min di dilê xwe de xwest ku ew rabin herin. Serê min êşiya û zirînek ket guhên min; lê ew her rûniştin û her axivîn. Zirîn xurtir bû; —dewam kir û aşkeratir bû. Ez hêj rihetir diaxivîm da ku xwe ji wê hestê xelas bikim; lê qut nebû û bihêztir bû — heta, piştî bîstekê, ez pê hesiyam ku dengedeng li guhên min nebû.

Bêşik ez *gelek* westiyam; —lê ez rewantir diaxivîm û bi dengêkî bilindtir. Lê zirîn xurtir bû — û min dikaribû çi bikim? Dengêkî *nîzm*, *şêlû*, *bilez* bû — *gelek bi rengê dengê saeteke bi pembûyê pêçayî*. Bêhna min çik bû — lê fermanberan hay ji min nebû. Ez bileztir diaxivîm — bi diwartir; lê dengedeng her xurtir lêhat. Ez rabûm û min behsa tiştên pûç kir; bi dengêkî xurt û hereketên tund, lê dengedeng her xurtir bû. Ew çima nediçûn? Ez bi hêstikgiranî li ser zemînê çûm û hatim, wek ku ji temaşekirina wan şet û har bibim — lê dengedeng her xurtir lê hat. Xweda ya! Min ê çi bikira? Ez hêrs bûm — Ez qîriyam — Min dijûn kirin! Min kursiya di bin xwe de weşand û xurt li ser texteyan kuta; lê dengedeng ji her tiştî bidengtir bû û her xurtir lê hat. Bidengtir bû — bidengtir — *bidengtir!* Û mêmîkan hê jî bi kêfxweşî sohbet dikir û dibişirîn. Gelo ma mimkun bû ku ew nebihîzin? Qudreta îlahî! — Na, na! Wan dibihîst — wan şik lê bir — wan *zanibû!* Wan tinazên xwe bi tîrsa min dikir! — Ez wisa fikirîm û wisa difikirim. Lê her tişt ji wê îşkenceyê baştir bû! Her tişt, ji wê qeşmeriyê aramtir bû! Êdî min nema dikaribû li pêş wan kenên derew bihewim! Min got an ez dê biqîrim an jî dê bimirim! — Û niha — Dîsa! — Bibihîze! Bidengtir! Bidengtir! Bidengtir! *Bidengtir!* —

“Bedbextino!” min kir qîrîn, “veneşêrin niyeta xwe êdî! Ez kiryarê qebûl dikim! — texteyan biqelêşin! Vira, vira! — ew lêdana dilê wî yê nîcs e!”

Her yek yekî derîne

Alice WALKER

(Dema li Lorraine Hansberry
difikirîm)

Divê em her tiştî bibêjin,
 bi kitekit,
 zelal û vekirî,
 bi hemû hêza xwe.
 Dixwazin me binax bikin
 Beriya ku em miribin.
 Gelo em reş bûn? Gelo em jin bûn? Gelo em qûnek bûn?
 Gelo em reşekî çewt bûn? Gelo em zer bûn?
 Xwedêyo! Tu bistrînî!
 Gelo me ji mirovekî nebaş hez kir? An ji welatekî?
 An jî polîtîkayekê?
 Gelo em Agnes Smedley an jî John Brown bûn?

Lê belê, piraniya me tiştên ku dîtin yekser nivîsîn?
 Gelo têra xwe zelal bû? Gelo ji bo girî û qêrînê
 Me têra xwe tişt nedîtibûn?
 De baş e, dû re,
 Wê çavên me tijî bikin,
 Guhên me, pozên me û devên me
 bi heriya (xwe)jibîrkinê.
 Wê tiliyên me bipelêxin
 Di nîvê şevê de.
 Wê pêûsên me ji xwe re bikin dirankolk.
 Wê zarok û hunerên me sabote bikin.
 Çimkî tiştê ku em dibînin em nîşan bidin,
 Dê vê jênerêvînê ferq bikin:
 Em wan nahebînin
 Em berhemên wan nahebînin.
 Em ji wan bawer nakin.
 Em ji tiştên ku ew dibêjin bawer nakin.
 Em ne evîndarên desthilatiya wan in.
 An jî hêzdariya wan.
 Em ne evîndarên fabrîqeyên wan in.
 An jî qirêjahiya wan.
 Em ne evîndarên bernameyên televîzyonên wan in.
 An jî çizirînên wan ên radyoaktîf.
 Em ji rojnameyên wan aciz dibin
 Em naperisin trêmbêlên wan.
 Em naperisin kezîzerên wan.
 Em naperisin xirên wan.
 Em zêde nafikirin
 Bi ya me ronesansên wan ne şayanî behsê ne
 Îngilîstan zêde me eleqedar nake.
 Gumanên me yên girîng hene der barê mêjiyê wan de.
 Bi kurtî, em, yên ku dinivîsin, direngînin, dikolin, dileyîzin
 An jî distrên
 Zîrekiyê parve dikin û ji ber vê yekê
 Qedera hemû mirovên xwe yên vê axê.
 Em ji wan cudatir nîn in,
 Hêjatir an xirabtir,
 Ne li hundir ne li derve
 Em wek hev in.
 Ê em nahebînin wan.
 Em naperisin filmên wan.

Em naperisin stranên wan.

Em pê bawer nîn in ku nûçegihanên wan
Nûçeyan radigihînin.
Em ne rêzdarên serokê wan in.

Em dizanin ku çima Qesra wan a Spî spî ye.
Em pê bawer nîn in ku zarokên wan zêde serkeftî ne;
Em dizanin ku dinya ne mîrat e ji wan re.
Lê vê paşê, we dest bi alîkariya wan kir
Me binax kir. Hûn, yên ku dibêjin: King tolazek bû;
Malcom qisasek bû; Sojourner baş bû; Hansberry
Xayîn bû (an jî qaltax, car caran); Fannie Lou Hamer
Tenê mêrxas bû; Zora Hurston, Nella Larsen, Toomer:
Paşvemayî, bêhiş, spiyan wan xapandibûn, bêqîmet;
Agnes Smedley sîxur bû.
Ez li çavên we dinihêrim;
Hûn di nav qirêjê de ne (Hûn axê davêjin ser me)
Hûn, yên digel min di gorê de ne
Mekin, dev jê berdin!

Divê her yek yekî derîne.
Binihêrin, ez, niha, li kêleka
Gorê me,
Min bi destê dayika xwe girtiye,
Bi lingê bavê xwe.
Va ye destê Robeson
Hêta Langston
Por û milê Zora
Çeneya kalikê te
Û enîşka jinika ku hatibû ricimandin
Awirên tûj ên pîrika te
Ku te dixwest ji bîr bikî.

Her yek, yekî derînin berojkê
Em yên ku
Gelek gor dîtine
Dizanin ku ew çi jî bikin
Divê ku em bijîn
Divê ku em tev bijîn
An jî kes (ji me) neji.

(Wergera ji îngilîzî: Omer Fîdan)

HAÎKÛ

Berken BEREH

Bêguman her netew xwedî resenî û taybetiyên otantîk e. Lê di nav gelên cîhanê de yê herî berbiçav gelê japon e. Lew, ew di giraveke dorhêla wê bi oqyanûsê rapêçayî de dijiyan û derfeta wan tune bû ku xwe bigihînin erdnîgariyên din. Van şert û mercan kir ku ew bi xwezayê re bi dostanî bijîn û dostê hev bin. Haiku an hayko yek ji taybetmendiyeke wan a hêja ye.

Di nav japonan de nivîsandina haikuyên serkeftî yek ji nîşaneyên maqûliyê bû. Ji ber vê çendê di pergala gerdayî ku sêsed sal domand û her şerê derebegitiyê bû, li japonyayê her şervanê bi navûdeng diviyabû nivîskarekî baş ê haykoyê jî bûya. Kesên ku bi roj tim di qada şer de mêr dikuştin bi êvarê re hildikişîyan qesrên xwe û li wir li baxçe temaşe dikirin û guh didan şîreşîra avê, dengê ba, berf û baranê, temaşeyî heyv û esmên û stêrkan dikirin û diketin medîtasyonê. Roja din ew sê ristên ji ber kiribûn dixwendin. Bi salan re ev jiyana bi sirûştê re lihevhatî û aram kir ku helbesta haykoyî bibe gencîneyeke balkêş a japonan.

Peyva haikoyê ji kêteya “haî” ku tê wateya sirûştê û ji kêteya “ku” tê wateya “valayî” an “esmên” pêk hatiye. Budîstekî hîndû van her du têgihan bi vê gotinê li hev tîne; “bibîne yek wek lihevhatina esmên û valahiyê.” Ji vê jî ev derdikeve ku însan wek esmên, aram û zelal be fêrî jîyanê û sira wê dibe.

Haîkû navê helbesteke japonan a kin e ku ji sê ristan *Go-Shîchî-Go* (*pênc-heft-pênc*) û hefdeh kêteyan pêk tê. Helbesta japonî li ser vê helbestê ava bûye. Îro jî her sal li Japonyayê mîhrîcana haîkûyan tê lidarxistin û helbestvanên haîkûyan ên welatên din diçin vê mîhrîcanê. Mîna figûrên çanda japonan ên mîna *xwarîna xav, geisha, kîmono, harakîrî, gulaşa somo, dêlîndêzên çayê, yakûza* û hwd. Haîkû jî piştî ronesansa japonan li gelek deverên dinyayê belav bû û bi dilşadî hat pêşvazîkirin û bandoreke ecêb li ser helbestvan û helbesthezan kir. Îro ro hema tu welatek nemaye ku helbestvanên wê ev cure helbest neceribandine û nenivîsandine. Dîsa gelek haîkûyên japonî hatine wergerandin li zimanên din.

*simbil û simbêl
şev jî vehesiyaye
li bîbûkên min*
*

*li vir jî bîr kiriye
hehecika beleban
mala xwe*
*

Guldesteyek haîkû

Berken BEREH

her ku diponijim
stêrkek dimire
ji zaroktiya min
*

Tê bi lez
bi baran û berf û bahoz
-ma mastê kê tirs e
*

çûkên teqlavêj
îro jî nefirîn
doza esmên dîkin
*

spîndara pêxas
nextweş nebe gelo
di bin berfê de?
*

ewr çiqas veşêre jî
di ro de tê dîtin
rûyê heyvê
*

niha nayê dîtin
wek barê sala
li ser milê min e
*

li kolanê
bareş û kaxez û poşet
piyasê dîkin
*

ho qercdaxo!
xwedê kê aciz nabî
tena serê xwe
*

ji vir jî dixuyê
hêlîna leglegê
virtîvala ye
*

nîska dikele
li benda şevê ye
nanê sor dibe
*

esmanê sor
û rûyê te yê aram
li ser pencerê...
*

li nav behrê jî
li ser çiyê jî aş nebû
-şev e derman
*

va bi lez e roj
bayê ji deştê ve tê
emrê işqê jî
*

li esmanê peng
ba heyvê dibe gomê
-li Erziromê
*

çiya spî deşt spî
berçavka min reş î spî
û trêna bi lez...
*

li ber tîfikê
radestî xewê dibin
ne bi dilê xwe
*

Kokteyl

Welat DILKEN

Çar in hêmayên werzê
Spî diwelidin, zertîngerm e dawiya wan
Çilmisîne qedera her destpêkekê û dawiyê di hembêza bê de can dide
Lê ez li ser rûyê te, herî pir ji ya ajdar hez dikim

Dudu ew dudu em
Yek periya şevê ya din a ronahiyê
Di çaran de min derîne
Ji ber ku di sisêyan de ji te hez dikim
Dîl im di bin siya wan de

Çiyayên sar in bakurê min
Başûrê te deşteke dûz û rast
Bizanibe, tu yê me di rojava de nîn e
Aliyê berbangê hêviyeke derewîn
Ji ber ku wekî qiblegeh tîm secdeya te
Ta dawiyê ji min re vekirî ne, deriyên dojhên wan

Ji ber ku li danê evîna te birçî me
Li sifreya min heram in
Sê danên xwarinê

Neçar û xîzan e ferhenga min
Ew in peyvên xwe
1-ez 2-te 3-hez 4-dikim
Lewma ye ku
Zimanê min nehatiye nasîn

Arjen Arî

bixwin..!
bixwin û vexwin
ta ku qirika we hilê, têêêr têr!
ta ku tel bide zikên telêr
bixwin... bixwin
weyyyyy noşîcan be her parî!

ev qetenerme
-weke yê karxezalan-
bo keybanûya te, rêzdar
bi şerabê re xweş diçe xwar
sor sor, goştêkî tik î teze:

ji termekî rexdik e her çênî
her çênî danhevî ji binê şikêran, genî
ji şkeftan, ji berqefan, ji binê dolan:
her çênî: xwîn
her çênî bi barûd
her çênî... minik minik bi menî!

bifermin ezbenî
çar term in, çar cendek...
pariyek aşî, biratî pariyek...
xayînek bû yek ji duwazdehan:
bi zadê li ber we, bi sed Mishef û Quran
Îsa jî hate firotin li ser mezeya b' şerab û nan!

Ferhenga çarpeyvî

Wê şevê...

ŞÊRKO

Wê şevê,
Wê şeva wek helbestan
Wê şewra wek îbadetan
Li wê xana wek ziyaretan
Wenda bûm
Li nav pêlên deryayên çavên te
Tu bû
Bêhna kulîlkên bihara bihuşta emrê min
Rengê keskesora asîmanê dilê min
Wê şevê
Bêhna berfê dihat ji porê te
Tehma biharê di her peyvek te
Germa havînê li ser lêvên te
Û
Ew pelê weşiyayî
Ji nav payîza guliyên te
Her çar demsalan
Bi veşartokê dilîst
Li ser zimanê te
Wê şevê
Diricifî dilê min
Li ber bişirînên her du çavên te...

rojeke sar bû
wext êvar bû
tarî peya
ba siwar bû

Amed devekî vekirî
û bê ziman û zar bû
didan, kevîrê bazalt

Mirin te dît ez kî me

Îlhamî OZER

dil tije ar bû

wateya lemelema Dîcleyê
hawar hawar bû
min bi tebat jimart
çi neh çi deh, sed hezar bû

li hemberî Derê Mêrdînê
li qeraxa Çemê Dîcleyê
min gorek aşopî vedida
û xwêdanek xweş dida

di heman demê de wek sûcdarekî
di mahkemê de

di nava kesirîn û xemê de
li ber dadger rabibe

rabûm çûm ber bi delavên Îtalyayê
û ber pêlên Zeryaya Spî
ku av an ba
min bibe ba wan

min dît ku hilm û henasên kuştîyên
mîna tamikên masiyan
di bin zikên keştîyên
wek darbestan de

bi tirs û xezeba nijadperestan
xeniqîne

piştî hêsirên zarokên bê bav û dê
mîna berf û cemedê
bariya ser ax û heriya
sebr û tebatîya Amedê

û hemû
xîç û xizên Dîcleyê
kevir û latên bedena amedê
li gel zar û zêçên bê bav û dê

helînên şewitî
teyr û tevalên birçî û tî
û bûkek bi kul û kovan
ji min re bûn mêvan

hêrama bûkê
dirêjiya Dîcleyê bû
kofiya wê
bedena ameda her du cihanê

min got: "xwişkê, anê
navê te bixêr
bişirî û got,"ez ji çiyê nû daketim
ku li gel te û mêvanên te bixebitim"

min li ser wê peyvê
bêhna xwe ya dawîn
da wê bûka wek heyvê
û heyfa xwe ji mirinê girt

ADEMÊ HERBECÛNÎ - 1944

Di sala 1944'an de li gundê Herbecûna
Amedê hatiye dinê. Kurmanc e. Pêşiyên wî ji
navçeya Gimgimê ji gundê Pîranê ne. Ji gundê
Pêrtûka Pîranê hatine Herbecûnê. Sê bavên wî

Dengbêjek û stranek

Amadekar: Hîlmî AKYOL

li Herbecûnê ne. Dibistan nexwendîye. Bi malbatî ji gund derneketîye. Cotkariyê dike, heywanan xwedî dike. Di gund de wek çîrokbêj tên nasîn. Di sala 1958'an de li gundê Herbecûnê zewiciye. Piştî du carên din jî dizewice. Rewşa wî ya aborî nebaş e. 5 keç û 10 kurên wî hene.

Herbecûn

Herbecûn li bajarê Amedê gundekî navçeya Bajarê Nû ye. Van salan bûye taxa navçeya Bajarê Nû. Di taxê de 115 malbat dijîn. Tev kurmanc in. Erdê taxê 6 hezar elb e. Erdê herî pir di destê malbatan de 2000 elb e. Erdê herî hindik di destê malbatan de 10 elb e. Nîvê malbatên taxê Bêerd in. 17 km dûrî bajarê Amedê ye. Dan û stendina taxiyan bi Amedê re ye. Sibehê diçin Amedê êvarê dizivirin. Di taxê de traqtor û otomobîl hene. Gundî û şênîyên taxê cotkariyê dikin. Heywanan xwedî dikin. Cenaniyê dikin. Pemû dajon. Baxçeyên çend malan hene. Ava taxê ava bîrên sondajê ye. Riya taxê Sêlak û xîçik e. Dibistan û mizgeft û elektrîk û tîlefona taxê heye. Keyatiya taxê li taxê ye.

Li rojhilatê Herbecûnê gundê Baqewsê heye.

Li rojavayê taxê Basîl heye.

Li başûrê taxê Derintê, Eser û Farê hene.

Li bakurê taxê Cumek heye.

Têbînî: Ev hevdîtin rû bi rû bi dengbêj re hatiye kirin. Ev agahî ji devê dengbêj hatine nivîsandin.

GURÎ

Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar

gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Ay gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî pîso,
 Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Gurî dîno wele wez ê şî xwira vê êvarê diçûm mala gurîkê xunê manê di şûjinê
 Wele mala mi xulama rehma Xwedê, wî serê gurîkê min ê mayê way li ser çoka
 Loy loy loy dêla jinê,
 Ay gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî pîso,

Gurî digo keçê dînê wele wez gurî me, lêlê gurîkî pîs im.
 Ê saya bi saya Xwedê Teala Rebê Alemê wele wez ê herim Diyarbekira xopan o ji wê da veg-
 erim bêm cem tew hevala o lêlêlê ramîsim,
 Ay gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî pîso,

Keçik dibê gurî dîno Xwedê hebîna devê te yê ne devê loy loy loy vê hermiyê
 O Qesem bi navê xwedê wezê ji te ra deynim qeymaxê loy loy loy piştê kerê,
 Ay gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî pîso,

Gurî digo keçê wele wez gurî me, lêlê gurîkî pîs im.
 Ê saya bi saya Xwedê Teala Rebê Alemê wele wez ê herim Diyarbekira xopan o ji wê da veg-
 erim bêm cem tew hevala o lêlêlê ramîsim,
 Ay gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî pîso,

Keçik dibê gurî lo wele mi go devê te yê ne devê loy loy loy vê kilamokê,
 O qesem bi navê Xwedê eşîra mala bavê min, ê eşîra mala bavê te rake lo tev û kokê,
 Ay gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî dîno
 Gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar gurî yar yar
 gurî yar yar gurî yar yar loy loy lo gurî pîso,

ÇIL ÇARÎN

Li vê dinyaya gewrik ku her çiqas nûjenî û hevçaxî asoya edebiyata me ye jî, nabe ku em danegere ser mêrg û dîwana pêşiyên xwe yên ku gotinên "tirtire" ji me re hiştine. Di nezera felsefe, têgêh û afirandin û "qayîlnebûnê"

Pirtûkxaneya W



de folklor dijî helbestê ye, lê ku em kurd, berî ku nan bicûn em nan daqurtînin an jî em nizanibin serê me li ser kîjan balîfê yî, em ê çawa qala têgehên xwe bikin. Cûtin û balîf. Cûtin û balîfa ku di Çil Çarîna Arjen Arî de dike ku em bêtir li çar parçebûna xwe ve-hewin, me bi zimanê me yê ku bi hewa Xwedê bi hev maye bikelijîne. Biwêj, serpêhatî û gotinên pêşiyên di Çil Çarînê de bûye katalîzora ku T. S. Eliot behs dike. Gotinên pêşiyên di vê pirtûkê de jêderk in lê helbestkar edilandîye, xemilandîye û kemilandîye.

Çil Çarîn, Arjen Arî, Helbest Enstîtuya Kurdî ya Amedê, 2008 / Bi Tîpên Latînî û Aramî


SÊV JÎ ME DIKUJIN

“Evîndara reqsa pêtên helbestê” “emrê xwe yê xapînok” li Licêyeke ku li cihê xwe li digere de winda dike. Di nexşeya bîra xwe de me li ber bi bêhna sêvên ku Xwedê ew li bi-hûstê qedexê kiribû lê “Generalekî tirsonek” ew li ser Helebçeyê de barandibû re, li “em”ên ku dirbê me divê ne wisa bûya de dixê.

Mizgîn Ronak hefsarê revoyên ku wê bi destê xwe kedî kirine, bi dest me ve berdide. Dahola çewt lê dide. Bo em şîna gulan negerînin û bo dahola dil çewt lê nede, dîwana Mizgîn Ronak birûskek e da ku em pêşiya xwe bibînin

Sêv jî Me Dikujin, Mizgîn Ronak, Helbest

Weşanên Lîs, 2008



MÎRNAME

Dîroka me ya ku her tim li ber hêt û dîwaran mayî, tenê bi dîsîplînên hunerî nemaze jî bi sînema û edebiyatê dikare di hişê me de mahne bibe. Ji ber ku dîrok tenê bi demografi, profil û bi hemû pêl û meylên civakî tê xwendin, romanên me yên ku dîrok an jî kesên ku di dîwanxaneyê dîrokê de çok vedane dikare piştî me rasttir bike. Mîrnameya Jan Dost kesayetiya Ehmedê Xanî ji xwe re dike mijar û ji devê darbesthilgirên Ehmedê Xanî, çîroka wî ya ku em hê nû fahm dikin, bi zimanekî herikbar û zelal vedibêje

Mîrname, Jan Dost, Roman

Weşanên Avesta, 2008



HÊVÎ HER DEM HEYE

“Yên ne di şeran de bin, dibin şêr”. Hêvî her dem heye ji me re qala ew têkoşerên azadiyê yên ku tî, birçî, sar û sermayê de her di dilê wan de hêviyê dinimînin dike. Romana ku birîndariya têkoşer dest pê dike û heta dawiyê jî têkoşerê ku li ber xwe dide, geh bi demên bihurî, geh bi xeyalkirinan û geh jî bi mitalan behsa hêviya û kevçiyê xwe yê ku carê ji birçînan pê berfê dixu dike. Bendemayîn di romanê de elementa herî esas e û ev element di gêjgerînkê de me digerrîne

Hêvî her dem heye, Hesen Huseyin Denîz, Roman

Weşanên Do, 2008



ROJNIVISKA SPINOZA

Heyamek an jî çaxeke ku em wê bi wextekî ve sînorkirin, gelo hewce dike ku em cih û waran jî sînorkirin bikin? Rojnivîska Spinoza em bi çar warên şerpeze, belengaz û ber teqînê ye dihesîne ku ev çar war û çalakgerên jiyanê rojane bi derbekê re li ber me radixe. Em




dikarin bibêjin ku Rojnivîska Spinoza di warê leheng, vegotin, tevî, derûnî, atmosfer û beloqiyên ku nîşanên pêlên postmodernîzmê ne di wêjeya kurdî de bêhnvedanek e
Rojnivîska Spinoza, Şener Özmen, Roman
Weşanên Lîs, 2008

SATURN

Wêje carnan îspatkirin e. Ev îspatkirin dibêje “serê min naêşe lê ez dikarim eniya xwe bisincirînim”. An jî tenê li ser kirû yan jî bûyînekê hûr dibe, deqa xwe tîr û vegotina xwe jî tîr dike. Saturna Remezan tenê qala çûyînekê dike. Ev çûyîn û atmosfera çûyîna çîrokê ji ser gelek merhaleyan wêjeya kurmançî gav kiriye û yekser ketiye dirûvê destanekê. Roman bi kurdiya xwe ya resen, dem û warê xwe ya fantastîk fenanî Çîrokên Hezar û Şevêkê xwendevên bi dû xwe dixê.

Saturn, Remezan Alan, Roman
Weşanên Avesta, 2002



JI ŞEVÊ RE ÇEND TÊGEHÊN DERA HANÊ

Ferhenga bîr û mêjiyê civak û civatan an jî em bibêjin ku ardû û benderên civak û civatan bi komkirin û dêrandinê dikare wan bi hebûn û hêza wan bihesîne. Ev pirtûk benderên kaya kevn û nû dide ber bê, ji me re dibe rêzan da ku me bibe ser kanên ardûyên ku ji bo me hem sermiyan e, hem qût e, hêm hêza berxwedanê ye.

Pirtûk di her sê beşên xwe de bîyî ku di rîtma metronoma gotaran de bikule; li ser civakê analîzan dike, li ser hunerê beşên hunerê yên kurdî şênbertir dike û li ser têgehê kozîk û sengerên nû ava dike

Ji Şevê re Çend Têgehên Dera Hanê, Rênas Jîyan, Cerrîbîn-Rexne
Weşanên Belkî, Tebax 2008




GAVA HEYATÊ

Çawa ku dema mirov kamil dibe hin guhertinên bîyolojîk û fîzyolojîk di laş û lebatên mirovan de pêk tên, romana Gava Heyatê jî ji mere tenê qala “pizîk” eke kamîlbûnê dike. Karakterê sereke yê romanê enfeksiyona sêwîbûnê lê der dibe û ev enfeksiyon dibe pizîkek, dû re dibe şerroanek û vê pizîkê dîteqîne. Piştî ku vê pizîkê dîteqîne nêr û edaba pizîkê wî dike îtîrafkar. Piştî pizîka îtîrafkariyê bi karmendiya dewletê vê pizîka xwe normalîze û xwe bi evînê jî estetîze dike. Di vê romanê de sêwî, şerrovan, îtîrafkar, karmend û evîndar heman kes in. Dema vedigere warê zaroktî û xortaniya xwe ta bi derziyê ve dike

Gava Heyatê, Lokman Ayebe, Roman
Weşanên Belkî, Îlon 2007

Ez rabûme li seherê
Min vexwar bada evînê
Evîndar mam li cîhanê



Payebilind û giran e

Sîpan XIZAN

Ji bona dîlbera Amed

Evîndariya bi keser e
Vedixwim her li hember e
Bi mitmanî şev û rojê
Ji bona dîlbera Amed

Mitmaniya min didome
Reng yexsîrê derbendê me
Jêbir nabe evîndarî
Ji bona dîlbera Amed

Amed ji bona dîlberê
Paytexta dilên keserê
Şev û roj li xeyala xwe
Dibînim dîlbera Amed

Dîlbera Amed şêrîn e
Lew evîndar dilbirîn e
Bi keser nalîn dikşîne
Ji bona dîlbera Amed

Dîlber bi zilf û guharan
Kulîlka bo pesindaran
Evîna bo evîndaran
Lewra ew dîlbera Amed

Her hêvîdar bo azadî
Lewra talî ew e xwedî
Li cîhan payebilindî

Navdar e dîlbera Amed

Amed bi dîlber şanaz e
Lew bo azadî dilxwaz e
Talî dibit serfiraz e
Navdarî dîlbera Amed

Dîlber herî bi navdar e
Herdem ew bi kar û bar e
Serbestir e her hişyar e
Lewra ew dîlbera Amed

Dîlber li Amed şepal e
Sipehî û çav xezal e
Xebatkarî her xwemal e
Lewra ew dîlbera Amed

Herî bibêjim ji bo wî
Pênivîs lênivîs bo wî
Têr nake şêrîn rewşa wî
Fedakar dîlbera Amed

Payebilind û giran e
Armanc; kurd û Kurdistan e
Li Amed, Dêrsim, Sîpan e
Navdarî dîlbera Amed

25/11/2008